



K.T.
ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê EDEBIYATA KURDÎ

ÇANDA KURDÎ DI BERHEMÊN SEÎDÊ NÛRSÎ DE

Aydın ÜNEŞİ

TEZA DOKTORAYÊ

Şêwirmendê Tezê
Prof. Dr. M. Zahir ERTEKÎN

Bîngol – 2025

T.C.
BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI

SAİD-İ NURSİ’NİN ESERLERİNDE KÜRT KÜLTÜRÜ

Aydın ÜNEŞİ

DOKTORA TEZİ

Tez Danışmanı
Prof. Dr. M. Zahir ERTEKİN

Bingöl – 2025

NAVEROK

NAVEROK	IV
TEZ ONAY SAYFASI.....	VII
PÊŞGOTIN	VIII
KURTE	IX
ÖZET.....	X
ABSTRACT	XI
KURTEBÊJE	XII
DESTPÊK.....	1
A. Mijar û Çarçoveya Xebatê	4
B. Armanc û Giringîya Xebatê	4
C. Rêbaza Xebatê	4
D. Xwendina Lîteratûrê	5
E. Tezên li Ser Bedîuzzeman Seîdê Nûrsî Hatine Çêkirin	8
BEŞA YEKEM	11
1. JÎYAN Ê BERHEMÊN BEDÎUZZEMAN SEÎDÊ NÛRSÎ.....	11
1.1. Bîyografîyên Bedîuzzeman Seîdê Nûrsî yê Heta Niha Hatine Nivîsîn	11
1.2. Jîyana Bedîuzzeman Seîdê Nûrsî	14
1.2.1. Malbata Wî	15
1.2.2. Tehsîla Wî.....	16
1.2.3. Jîyana Dewra Seîdê Nû	17
1.2.3.1. Jîyana li Barlayê	18
1.2.3.2. Girtîgeha Eskişehirê	19
1.2.3.3. Sirgûnîya Kastamonuyê	20
1.2.3.4. Girtîgeha Denizliyê	20
1.2.3.5. Jiyana Sirgûnî ya li Emirdağê û Zindana Afyonê	21
1.2.3.6. Salên Dawî yê Nûrsî û Wefata Wî	22
1.3. Berhemên Wî.....	24
1.3.1. Li Gorî Nûrsî Rîsaleyên Nûr û Mîsyona Wê	26
1.3.2. Berhemên Seîdê Berê	27
1.3.3. Berhemên Seîdê Nû	30
BEŞA DUYEM	33
2. NAVDEQÎTÎ DI NAVBERA BERHEMÊN EDEBIYATA KURDÎ YÊN KLASÎK Ê BERHEMÊN SEÎDÊ NÛRSÎ DE	33
2.1. Navdeqîtî	33
2.1.1. Rêbazên Navdeqîtîyê	34
2.2. Navdeqîtî di Navbera Dîwana Mela Ehmedê Cizîrî û Berhemên Nûrsî de.....	35
2.3. Navdeqîtî di Navbera Kullîyata Ehmedê Xanî û Berhemên Nûrsî de.....	43

2.3.1. <i>Mem û Zîna</i> Ehmedê Xanî	44
2.3.2. <i>‘Eqîdeya Îmanê</i> ya Ehmedê Xanî	49
2.3.3. <i>Dîwana</i> Ehmedê Xanî	51
2.4. Navdeqîtî di Navbera <i>Nehcu’l-Enama</i> Mele Xelîlê Sêrtî û Berhemên Nûrsî de	53
BEŞA SÊYEM	58
3. RENGVEDANA ÇANDA KURDÎ YA FOLKLORÎK DI BERHEMÊN SEÎDÊ NÛRSÎ DE	58
3.1. Foklor	58
3.2. Çanda Kurdî	59
3.3. Nimûneyên Çanda Kurdî ya Folklorîk di Berhemên Nûrsî de	60
3.3.1. Vegêranên Edebîyata Gel	61
3.3.1.1. Kawayê Hesinkar	62
3.3.1.2. Kela Dimdimê	65
3.3.2. Pêkenî	70
3.3.3. Nifir	70
3.3.4. Gotinên Pêşîyan	71
3.3.4.1. Kurê Pîrê û Navdarî	71
3.3.4.2. Dema Mûsîbetê Dirêj e	71
3.3.4.3. Destê Zehmet li ser Dilê Rehet	71
3.3.4.4. Navê Gur Bîne Palandar Lê Werîne	72
3.3.4.5. Xwedê Meriv Şaş Neke	72
3.3.5. Îdyomên Kurdî	72
3.4. Derbûmeselên Gel ên Folklorîk	73
3.4.1. Vizviz ji Te Hingiv ji Min	73
3.4.2. Îşê Herî Zehmet	74
3.4.3. Padîşah Çi Dike Axayê Me Dizane?	74
3.4.4. Xwedê Mezin e	75
3.4.5. Merdîtiya Dayîkê	75
3.4.6. Kerpîçê Qesra Cennetê	75
3.4.7. Hejmara Murîdên Şêxekî	76
3.5. Vegêranên Dînî yên Lehengî	77
3.5.1. Qewlê Newala Sîsebanê	77
3.6. Cejnên Gel ên Folklorîk	79
3.6.1. Newroz	79
3.7. Bawerîyên Gel ên Folklorîk	81
3.7.1. Xêzika Fila	81
3.7.2. Hîvgirtin	82
3.8. Edetên Eşîrtîyê	83
3.9. Çanda Folklorîk a Medreseyan Kurdan	84
3.9.1. Miftuhane	84
3.9.2. Tayîna Feqîyan û Bêminetî	85

3.10. Wergirtina Nûrsî ya Cil û Bergên Kurdî yê Folkorîk.....	85
BEŞA ÇAREM	89
4. ZIMANÊ KURDÎ DI BERHEMÊN BEDÎUZZEMAN SEÎDÊ NÛRSÎ DE ...	89
4.1. Ziman û Zimanê Zikmakî.....	89
4.2. Seîdê Nûrsî û Zimanê kurdî.....	90
4.3. Projeya Wî ya Medresetu'z-Zehrayê.....	92
4.4. Mantelîteya Kurdî di Rîsaleyên Nûr de.....	96
4.5. Peyvên Kurdî yê di Berhemên Nûrsî de	100
4.5.1. Peyvên Kurdî yê Xwerû.....	101
4.5.2. Peyvên Kurdî yê Nexwerû.....	101
4.5.2.1. Peyvên Pêkhatî	102
4.5.2.2. Peyvên Dariştî	102
ENCAM.....	104
ÇAVKANÎ.....	106
PÊVEK.....	114
Pêvek 1: Telgirafa Ahmed Husrev Altınbaşak.....	114
Pêvek 2: Gotara Bedîuzzeman Mela Seîdê Kurdî	115
Pêvek 3: Encamname	117

TEZ ONAY SAYFASI
BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Aydın ÜNEŞİ tarafından hazırlanan *Çanda Kurdî di Berhemên Bedîuzzeman Seîdê Nûrsî de* başlıklı bu çalışma, 05/03/2025 tarihinde yapılan tez savunma sınavı sonucunda [oybirliği ile] başarılı bulunarak jürimiz tarafından Kürt Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı'nda Doktora tezi olarak kabul edilmiştir.

TEZ JÜRİSİ ÜYELERİ (Unvanı, Adı ve Soyadı)

Başkan, Danışman :	Prof. Dr. M. Zahir ERTEKİN	İmza:
Üye :	Doç. Dr. Bedrettin BASUĞUY	İmza:
Üye :	Dr. Öğr. Üyesi Şeyhmus ORKİN	İmza:
Üye :	Prof. Dr. Hayreddin KIZIL	İmza:
Üye :	Prof. Dr. Hayrullah ACAR	İmza:

ONAY

Bu Tez, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yönetim Kurulunun/...../2025 tarih ve sayılı oturumunda belirlenen jüri tarafından kabul edilmiştir.

Dr. Öğr. Üyesi Abdullah BEDEVA

Enstitü Müdürü

PÊŞGOTIN

Ev xebat, ji bo tesbîtkirina çanda kurdî ya di berhemên Bedîuzzeman Seîdê Nûrsî de hat kirin. Di pêvajoya vê xebatê de alav û amûrên eleqedarê çanda kurdî yên di berhemên Nûrsî de hatin bidestxistin, piştî dahurîneke birêkûpêk digel encamên wan di vê nameyê de hatin cîdan.

Di serî de şêwirmendê min Prof. Dr. M. Zahir ERTEKÎN spasîya hemû mamosteyên lijneyên TÎKan, Doç. Dr. Bedrettin BASUĞUY, Prof. Dr. Hayrettin Kızıl, Prof. Dr. Hayrullah ACAR, Dr. Şeyhmus ORKÎN û ya hemû mamosteyên ku dersa dane min û hemû hevaldersên xwe dikim. Qencîya Dr. Ayhan YILDIZ, Ramazan ÇETÎN û Dr. Ahmed SEYARÎ nayê jibîrkin.

Ihmalkirina malbatê li hêlekê du mexdûrên ciddî yên vê xebatê hene, yek jê ez im ê din jî nevîyê min Mîrza ye. Di maweyê vê xebatê de ez ji têrhezkirina wî mehrûm mam, ew ji têr eleqe û hezkirina min bêpar. Hêvî dikim ev xebat hêjayî keda mamoste, dost û hevalan be û fêydeyê bide kesên bi vê mijarê re eleqedar in.

05/03/2025

Aydın Üneşi

Batman

KURTE

Çanda Kurdî di Berhemên Seîdê Nûrsî de

Aydın Üneşi

Ziman û Edebiyata Kurdî, Teza Doktorayê, 2025

Şêwirmendê Tezê: Prof. Dr. M. Zahir Ertekin

Bedîuzzeman Seîdê Nûrsî alim û zanayekî kurd e. Bi navê Rîsaleyên Nûr kulîyateke wî ya li dora şeş hezar rûpelî heye. Di berhemên xwe de cî daye mijarên derbarê olî, civak û kurdan. Fikir û ramanên wî bi rêya wergerên berhemên wî li cîhanê belav bûne. Heta niha gelek xebatên akedemîk li ser berhemên wî çêbûne, lêbelê hêla wan a çand û zimanê kurdî bi pirani hatiye îhmalkirin. Armanca vê xebatê destnîşankirina çanda kurdî ya di berhemên Nûrsî de ye. Li gorî etîka lêkolînê û rêbazên zanistî yên wekî navdeqîtî û pelandina lîteraturê berhemên wî hatin analîzkirin. Bi mînakên wekî adet, derbûmesele, îdyom, gotinên pêşîyan, destan, nîfrîn, henek, têgihên kurdî, mantelîteya kurdî, û hwd. hêma û unsurên çanda kurdî û zimanê kurdî hatin tesbîtkirin û çavkanîyên wan ji berhemên ku têkildarî çanda kurdî ne hatin nîşandan. Bi vî awayî hîpoteza vê xebatê ya ku Nûrsî di nivîsîna berhemên xwe de bi berfirehî ji çanda kurdî îstîfade kiriye hat selmandin. Herwiha bi bîdestxistina nûveyên vê tezê ev qenaet çêbû ku ev xebat dê pêşî veke ji bo çareserkirina problema mijarê.

Peyvên Sereke: Çanda Kurdî, Navdeqîtî, Berhemên Nûrsî, Zimanê Kurdî, Bedîuzzeman Seîdê Nûrsî.

ÖZET

Said-i Nursi'nin Eserlerinde Kürt Kültürü

Aydın Üneşi

Kürt Dili ve Edebiyatı, Doktora Tezi, 2025

Tez Danışmanı: Prof. Dr. M. Zahir Ertekin

Bediüzzaman Said-i Nursi Kürt alim ve bilge bir şahsiyettir. Takriben altı bin sahifeden oluşan Risale-i Nur adlı bir külliyatı vardır. Eserlerinde dini, sosyal ve Kürtlerle alakalı konulara yer vermiştir. Görüş ve düşünceleri kitap çevirileri yoluyla dünyaya yayılmıştır. Şu ana kadar kitaplarını konu alan pek çok akademik çalışma yapılmıştır, ancak Kürt kültürü ve dili yönleri genellikle ihmal edilmiştir.

Bu çalışmanın amacı Nursi'nin eserlerinde Kürt kültürünü tespit etmek ve yorumlamaktır. Araştırma etiğine uygun metinlerarası ilişkiler ile literatur taraması gibi bilimsel yöntemler kullanılarak eserleri analiz edildi. Kürt adet ve görenekleri, darb-i mesel, deyim, atasözleri, destan, beddua, şaka ve Kürtçe kavramlar, Kürtçe mantelitesi gibi örneklerle Kürt dili ve kültürü ile ilgili imge ve unsurlar tespit edildi. Bu şekilde, bu çalışmanın hipotezi olan, Nursi eserlerini telif ederken büyük ölçüde Kürt kültüründen istifade etmiştir tezi ispatlanmış oldu. Böylece bu çalışma sonucu elde edilen nüvelerin konu problematiğini çözme yönünde katkı sunacağı kanaati oluştu.

Anahtar Kelimeler: Kürt Kültürü, Metinlerarasılık, Nursi'nin Eserleri, Kürt Dili, Bediüzzaman Said-i Nursi.

ABSTRACT

Kurdish Culture in the Works of Said-i Nursi

Aydın Üneşi

Kurdish Language and Literature, P.h. D. Thesis, 2025

Supervisor: Prof. Dr. M. Zahir Ertekin

Bediuzzaman Said-i Nursi is a scholar and wise man of the Kurds. He has a collection called Risale-i Nur consisting of approximately six thousand pages. He has included religious, social and Kurdish issues in his works. His views and thoughts have spread to the world through book translations. Many academic studies have been conducted on his books so far, but the aspects of Kurdish culture and language have generally been neglected.

The aim of this study was to indicate Kurdish culture in Nursi's works. His works were analyzed using scientific methods such as intertextual relations and literature review in accordance with research ethics. With examples such as Kurdish customs, proverbs, idioms, epics, curses, jokes and Kurdish concepts, and Kurdish mentality, images and elements related to the Kurdish language and culture were determined. In this way, the hypothesis of this study, that one of the fundamental foundations of Nursi's works is Kurdish culture, was proven. Thus, it was concluded that the cores obtained as a result of this study would contribute to solving the problematic of the subject.

Keywords: Kurdish Culture, Intertextuality, Works of Nursi, Kurdish Language, Bediuzzaman Said-i Nursi.

KURTEBÊJE

bnr. : binêre

d.n. : dêrok nîne

e.s. : eleyhî selam (silav lê be)

e.s.s. : eleyhî selat û selam (selat û selam lê bin)

êd. : ên din

hwd. : her wekî din

r. : rûpel

rr. : di navbera ... rûpelan de

wer. : wergêr

yd. : yên din

DESTPÊK

Însan fêkîyê dara heyatê yê herî bimarîfet e. Bi fikir, raman, kirin û çalakîyên xwe dikare derkeve qada ser melayketan û bi heman marîfetê dikare dakeve asta bin şeytanê jî. Însan giyanewerekî sosyal e. Reng û rûyê civata xwe werdigire. Mirovên alim û zana bi vê yekê nasekinin, ji bo civaka xwe bi alîyê başîyê ve biguherînin, lazim be dijberîya civatê jî dikin. Gava pêwîst be berdêlên herî giran jî didin ber çavên xwe. Gelek ji wan di dema heyata xwe de qedr û qîmeta ku heq kirine nabînin, piştî mirina xwe tîr fêmkirin. Bedîuzzaman Seîdê Nûrsî jî yek ji wan mirovan bû ku bi hunerwerî, qabîliyet û feraseta xwe li pêşîya dema xwe bû. Dixwest civaka ku di nav de dijî bi bal başîyê ve biguherîne.

Nûrsî xwedî fitreteke newaze bû. Hê di zarokatiya xwe de bala seyda û hevaldersên xwe dikêşa. Teqdîr û teltîfa seydayan carina dibû sedema hesûdî û çavnebarîya feqîyên din ên ku bi ilim û zanîne nikaribûn pê, îcarê bi şer û şiddetê diçûnê, lê Seîdê nûciwan bi feraseta xwe hem izzet û rûmeta xwe hem ya hevalên xwe diparast. Wextê xelkê dixwest lê xwedî derkeve, ji wan re digot ev meseleyeke navxweyî ye hûn mudaxele nekin. Lewre ew bi xwe jî hay ji taybetmendîyên xwe yê nejrêzê hebû. Ji xwe li medreseyan debar nedikir. Her pêleyekê diçû yeke din. Ev hal û rewşa wî kir ku di nav gel de şohreta wî belav bibe, ji xwe zehf tê de neçû navê Mele Seîdê Meşhûr lê kirin. Vê yekê bala walîyên Bedlîs û Wanê jî kêşa, ew anîn koşkên xwe ji pirtûkxaneyên mîrî dan îstîfadekirin. Di wê serdema tînehîya weşan û pirtûkan de ev pirtûkxaneyên fermî derîyê xizîneyên ilmê bûn, nexasim ji bo kesekî wekî Nûrsî.

Alim û zanayên bîrewer balê dikişînin kêmasî û arîşeyên civata xwe û li çareserîya wan digerin, mesela Ehmedê Xanî (1650-1707) bal kişandîye ser arîşeyên kurdan ên wekî yekîtiya wan û qedrê zimanê wan (Xanî, 2013, r. 23). Bedîuzzaman Seîdê Nûrsî jî wekî alîm û zanayekî kurdan bal kişandiye ser problemên wan ên civakî yê wekî perwerdehî, yekîti, fikra neteweyî, sextekarîya hin şêxên sexte, zilma gelek axayan û hwd. (Bedîüzzaman Said Nursî, 2004a, r. 89). Ji bo çareserkirina van probleman li nav eşîrên kurdan gerîyaye. Çûye zîyareta alim û navdarên kurdan. Da ku bi navê Medresetu'z-Zehrayê zanîngehekê bide vekirin di dewra Osmanî de murecaetê padîşahan kirîye. Di destpêka avakirina Komara Cumhûrîyetê de serî li Meclîsa Turkîyeyê ya Yekem daye. Ji bo hêşyarkirina kurdan û çareserkirina

problemên wan pirtûkeke bi navê Recetetu'l-Ekrad (Reçeteya Kurdan) nivîsiye. Di gelek rojname û kovarên wê demê de li ser vê yekê gotar nivîsîne.

Baş e, Bedûzzeman Seîdê Nûrsî çiqasî ber û berhema civak û neteweya xwe ye? Berhemên wî di çi sewîyeyê de nîşane û dirûvên çand û nêrîta kurdan dihewînin? Xebata vê tezê dê bi giştî bersivên van pirsan bide lê dîsa li vir dikare bê gotin, Bedûzzeman di hemû jiyana xwe de çi bi sûret çi bi sîret be li nasnameya xwe ya kurdî xwedî derketîye; dev ji mezhebê xwe yê şafî'îtiyê ku mezhebê piranîya kurdan e bernedaye. Xwe wekî çiyayî bi nav kirîye, berhemên xwe jî wekî ber û fêkîyên çiyayê welatê xwe hesibandine (2004a, rr. 79-80). Ji bo her du berhemên xwe *Muhakemat* û *Munazeratê* wiha dibêje: “Ji van berheman her yek jê, çawan ku kurd e, wisan jî tirk, di heman wextê de jî ereb e. Tu dibêjî qey ev berhem kurdekî bikumik ê ku ebayê erebî li xwe kirîye û pantolonê tirkî wergirtîye” (Nursî, 2003c, r. 78). Ji vê pênasîyê wisa tê fêmkirin ku Nûrsî berhemên xwe kurd dihesibîne, herçiqas, dirûvê ereb û tirkî bidin jî ji ber ku bi tirkî û erebî hatine nivîsîn lê ew bi xwe kurd in.

Nûrsî di pêşbergê *Munazeratê* de bi angaşteke wiha radibe: “Reçeteya parzemîneke biezemet [Parzemîna Asyayê] a bextreş û dewleteke bi nav û deng [Dewleta Osmanî] a bêsiûd û qewmekî hêja [Neteweya Kurd] yê bêxwedî yan jî Munazerata Bedûzzeman” (2004a, r. 76). Dibe ku Nûrsî vê iddiaya xwe li ser navê hemû berhemên xwe yê ku dê binivîsanda kiribe, qesta wî her çi be, ev sed sal zêde ye di ser vê gotina wî re derbas bûye lê rewşa parzemîna Asyayê ji berê ne çêtir e, Dewleta Osmanî hilweşîya û halê kurdan jî ne tu hal e, ji niha û pêde wê çi bibe Xwedê dizane.

Ev xebat dixwaze ast û qewareya vê rengvedana berhemên kurdî yê klasîk û çanda kurdî bi awayekî delîldêrî destnîşan bike. Ji boyê vê jî pirsê lêkolînê bi vî awayî hat pêşberî me: Çi heye ku xebatên berbiçav ên akademîk ên di vê biwarê de hatine kirin ne bes in. Lewra vê xebatê berê xwe da vê qadê. Di vê çarçoveyê de xebat li ser vê hîpotezê hate kirin: *Çanda kurdî di berhemên Seîdê Nûrsî de.*

Di vê rewşê de li gorî pîvanên vê problema lêkolînê, hat dîtin ku tecrûbeyê me a qadê, çavdêriya li mijarê û tesbîtkirina problema lêkolînê ji min re hêsan hat. Lewra têra çareserkirina problemê materyal li ber destan gihîştibûn hev û bi vî awayî diyar bû ku dê ev problem bikaribe bê çareserkirin. Ji ber ku ji hêla geşedana dîrokî ya zanîstê ve dê cîyekî vala dagirta, xuya bû ku ev problema lêkolînê ji bo xebateke zanistî

xwe dida der: *“Rengvedana berhemên edebiyata klasik a kurdîya kurmancî, tesîra zimanê kurdî û cîgirtina çanda kurdî di berhemên Bedîuzzeman Seîdê Nûrsî de di çi astê de ye gelo?”*

Li pey diyarkirina pirsê lêkolînê ev pirsên talî derketin pêşîya me: “Gelo bi taybetî tesîra kîjan berhemên edebî yên klasîk ên kurdîya kurmancî li ser berhemên Seîdê Nûrsî çêbûne. Pêwendîya navdeqîtiyê ya navbera berhemên Nûrsî û berhemên klasîk ên kurdî di çi astê de ye. Gelo çanda kurdî ya folklorîk bi çi awayî teyîsiye ser berhemên wî? An jiyana kurdan a civakî heta çi raddeyê bandor daye ser Seîdê Nûrsî heta ku biteyîse nav berhemên wî? Zimanê kurdî bi çi awayî tesir li zimanê berhemên wî kiriye?”

Di hîlbijartina vê problema lêkolînê de wekî pîvanên taybet; têrdariya di warê mijarê de, cîyê teşwîqê ye. Ji bo ku problema lêkolînê li gorî rêbaz û teknîkên zanistî bê gengeşekirin û li ser çavkanîyên metodolojîyê xebateke xweser bê kirin di destpêka lêkolînê de hat dîtin ku têra çareserîya problema lêkolînê dane li ber destan mawcûd in. Hebûna daneyan dê çareserkirina problema lêkolînê hêsan bike. Lewre pîrsgirêka lêkolînê û bersivdayîna pirsên wê, qada xebatê di serî de kulliyata Nûrsî, berhemên edebiyata kurdî yên klasîk, berhemên li ser folklorê kurdî, xebatên li ser gramera zimanê kurdî û ferhengên kurdî, wekî materyalên lêkolînê hatin amadekirin.

Ew mînakên tîkildarî metnên edebiyata kurdî ya klasîk, çanda folklorê kurdan û zimanê kurdî ku di berhemên Nûrsî de hene, yek bi yek dê bîr tesbîtkirin û wekî daneyên nimûne dê bîr destnîşankirin û analîza wan bê kirin. Ji ber ku dê qewareya xebatê temamê nimûneyên kulliyatê ranegire, li vir dê tenê ji temamê wê mînakên nimûneyî bîr analîzkirin.

Di vê xebata xwe de em ê rêbaza pêwendîya navdeqîtiyê (*intertextuality*) jî bi kar bînin. Her wiha em ê analîza metnan bikin. Têgehên dahurînin. Metnan berawird bikin. Jêgirtinên ji çavkanîyên çand û berhemên kurdî yên di kulliyata Seîdê Nûrsî de ne deşîfre bikin. Bi kurtasî em ê di berhemên Nûrsî de bi pirsên “çima”, “çawa” û “bi çi awayî” li çanda kurdî û tesîra wê bikolin. Wekî teknîk jî em ê xwendin û lêgerîna lîteratûrê bi kar bînin.

A. Mijar û Çarçoveya Xebatê

Mijara tezê *Çanda Kurdî di Berhemên Seîdê Nûrsî de* ye. Gava mirov li berhemên Seîdê Nûrsî dinêre mirov dibîne ku hem bi awayekî eşkere hem bi awayekî sergirtî çanda kurdî û tesîra wê di wan de tê dîtin, nexasîm tesîra kitêbên klasîk ên edebiyata kurdî. Bi vê xebatê em ê rengvedana çanda kurdî di çarçoveya berhemên Seîdê Nûrsî de destnîşan bikin. Her wiha dê xebat bi berhemên Nûrsî sînordar be. Ji aliyê tematîk ve jî xebat bi wan mijaran hatiye sînorkirin ku têkildarî çanda kurdî ne. Di vê çarçoveyê de mijarên wekî edet, destan, derbûmesele, îdyom, nîfrîn, henek, ziman û hwd. hene.

B. Armanç û Giringîya Xebatê

Armanca vê xebatê selmandina hîpoteza vê teza doktorayê ye. Wekî hat diyarkirin hîpoteza vê teza doktorayê ew e ku yek ji binyad û paşxaneyê Rîsaleyên Nûr çand, ziman û kelepura kurdî ye. Rîsaleyên Nûr bi hin awayan xwe dispêre berhemên kurdî yên klasîk û hîpoteza folklorê kurdî. Ev xebat jî du milan ve “giring” e: Yek dê bide zanîn ku Rîsaleyên Nûr bi awayekî ji awayan ber û berhema çanda kurdan e, dido dê bi cihana ku Rîsaleyên Nûr li zimanê wan hatiye wergerandin bide zanîn ku van berhemên bi gelek awayan sûd ji çand û hişmendîya kurdî wergirtine.

Gava ev problema lêkolînê bê çareserkerin bivê nevê dê bi kêrî warê teorîya siyasîyê jî bê. Li gel zanistê, hêvî heye ku di qada xebat û lêkolînê têkildarî kesayîtiya Seîdê Nûrsî û cihêwaziya berhemên wî de nûtiyekê bi xwe re bîne. Lewra jî ber van egeran qenaet heye ku problema lêkolînê û çareserkerina wê giring e.

C. Rêbaza Xebatê

Ji ber ku materyalên eslî yên vê xebatê berhemên Nûrsî ne, serê ewil dê ew cîyên ku li gorî lêkolîna me jî ber berhemên edebiyata kurdî ya klasîk hatine girtin bîn tesbîtkirin û digel berhemên edebiyata kurdî ya klasîk bi rêbaza navdeqîtiyê bîn berawirdkirin. Bi vî awayî em ê nîşan bidin ku teyîsîna berhemên edebiyata kurdî li ser berhemên Nûrsî pêk hatine.

Ji bilî berhemên edebiyata kurdî ya klasîk şop û rêçên çanda kurdî ya folklorîk û zimanê kurdî jî li ser berhemên Nûrsî hene, em dê wan jî ji berhemên wî tesbît bikin û bi referansên folklorê kurdî û zimanê kurdî destnîşan bikin.

D. Xwendina Lîteratûrê

Çavkanîyên lîteratûrê ji xebatên wekî gotar, bîrewerî, pirtûk û ji tezên ku bi awayekî bi vê tezê re eleqedar in pêk tên, li vir bi giştî ev berhem bi awayê kronolojîk hatine rêzkirin.

Berk (1975) bi navê *Türkiye’de Nurculuk Davası* berhemeke ji 862 rûpelan pêk tê nivîsîye. Bekir Berkê ku di 1958ê de dest bi parêzerîya Nûrsî û Rîsaleyên Nûr kirîye pazdeh sal domandîye. Di vê xebata xwe de cî daye kuporên rojnameyan, rapor, îddîa û biryarên mahkeme û pisporên edlî yê derbarê Nûrsî, berhemên wî û şagirtên wî de.

Malmîsanij (1991) di kitêba xwe ya *Said Nursi ve Kürt Sorunu (Seîdê Nûrsî û Pîrsa Kurdî)* de bi çavekî sekulerî û rexnegirî Seîdê Kurdî dinirxîne (1991:41–42).

Rohat (1991) bi navê *Unutulmuşluğun Bir Öyküsü: Saidi Kürdi (Çîrokeke Jibîrbûnîyê: Seîdê Kurdî)* pirtûkek li ser Bedîuzzeman nivîsîye. Alakom, di vê xebata xwe de digel danasîna Nûrsî di gelek cîyan de derbarê Nûrsî de bersivên rexneyên Malmîsanij jî dane.

Xebata bi navê *İçtimai Dersler* (2004a) û *Asar-ı Bedîyye* (2004) di vê lêkolînê de bûn serçavîyên sereke. Ji ber ku di van herdu pirtûkên giştî de hema hema hemû berhemên ewil ên Bedîuzzeman hene.

Aktaş (2008) bi gotara xwe ya “*Said-î Kurdî: Kürtlerin Gandisi (Seîdê Kurdî: Gandîyê Kurdan)*” derîyê nîqaşê li ser hêla wî ya etnîkî û ramanên wî vekirîye. Wî di vê xebata xwe de bi tevî ku bal kêşaye ser xweragirtina wî ya siyâsî, pê re hewl daye zela bike bê ka desthilatdarên kapîtalîst çawa ew ji bo berjewendîyên xwe bi kar anîye. Digel vê, Aktaş bersiv daye hin rexneyên ku ji hêla kurdperweran ve li Bedîuzzeman hatine kirin û bi awayekî ji awayan helwesta wî di nav seqaya dîrokî ya serdema wî de dinirxîne.

Kovara Nûbiharê di sala 2010î de di salvegera 50yem a wefata Bedîuzzeman de sempozyûmeke navneteweyî bi navê “*Di 50 Salîya Wefata Wî de Sempozyûma Bedîuzzeman Seîdê Kurdî ya Navneteweyî li Bajare Dîyarbekirê*” li dar xist. Di vê sempozyûmê de gelek lêkolîneran lêkolînên xwe yê li ser alîyên curbicur ên Bedîuzzeman pêşkêş kirin. Ew xebatên wan jî bi kêrî vê lêkolînê hatin.

Munazarat Sempozyumu: 1 (Anon, 2012a) *Milliyet Fikri ve Kürt Meselesi (Fikra Millîyetê û Pirsê Kurdî)*. Di vê sempozyûma ku rûniştêk sax ji fikra Nûrsî ya perwerdehiyê û projeya wî ya Medresetu'z-Zehrayê re hatiye veqetandin, gotar bi giştî di çarçoveya “pirsgirêka kurd û millîyet”ê de hatine pêşkêşkirin.

Özcan (2011) xebateke bi navê *Risale-i Nur Hizmetkarları Ağabeyler Anlatıyor (Xizmetkarên Rîsaleyên Nûr Biragewre Dibêjin)* ya heşt bergî kiriye. Di vê xebata xwe ya berdewamî de di serî de bi şagirtên Nûrsî re û wan kesan re ku rûbirû ew dîne reportaj kirine û tomar kirine.

Aydeniz (2013) bi navê *Eski Said'in Ehemmiyetli Talebesi Hamza (Hemze: Şagirtêkî Giring ê Seîdê Berê)* di lîteratura têkildarî Bediûzzaman de cih girtiye. Wî di van xebatên xwe de cih daye peywendîya Şefîq Arwasî, Hemze Begê Muksî û Mehmed Mihrî Hilav digel Bediûzzamanî.

Münazarat Sempozyumu I: Milliyet Fikri ve Kürt Meselesi (Anon, 2012a) di vê sempozyumê de bi dehan teblîx hatine pêşkêşkirin. Sempozyum li Mêrdînê bi mazuvaniya Zanîngeha Artukluyê hatiye kirin. Bi giştî li ser ramana Nûrsî ya netewetîyê teblîx hatine pêşkêşkirin. Teblîxên derbarê projeyên Nûrsî û bi taybetî yên derbarê Medresetuzzehrayê jî ciyekî giring digirin di vê sempozyumê de. Gotareke ku rasterast bi teza me ve eleqedar jî ev e di berhema vê sempozyumê de: Ahmet Demir, *Bediüzzaman Said-i Nursî'nin Eğitim Modelinde Kürt Dilinin Yeri ve Önemi*

Said Nursi'nin Eğitim Felsefesi: Medresetüzzehra (Anon, 2012b) di vê sempozyomê de jî bi dehan gotarên derbarê fikra Nûrsî ya derbarê perwerdehiyê de û xasma ya derbarê Medresetuzzehrayê de hatine pêşkêşkirin û hemû teblîxên sempozyumê wek kitêb hatine çapkirin.

Uluslararası Bitlis Sempozyumu; di vê sempozyumê de bi giştî li ser çand, dîrok, bajar û şexsiyetên Bedlîsê hatiye rawestan. Bi vê xebatê re eleqedar gotareke Ekrem Malbat (2014) a bi navê “*Bediüzzaman'ın Kürt Kimliği Üzerinde Yapılan Tahrifatlar (Texrîfatên ku li ser Nasnameya Kurdî ya Bediüzzamanî Hatine Kirin)*” heye. Malbat di gotara xwe de balê dikişîne ser guherandinên derbarê kurd û kurdayetîyê di berhemên Nûrsî de.

Epözdemir (2015) di lêkolîna xwe ya *Medreseyên Kurdistanê* de cih daye jîyana sîyasî, berhem û kesayetîya Bediûzzaman a kurdperwerîyê.

Aytemur (2015) bi xebata xwe ya *Risale-i Nur'da Yapılan Tahrifat (Tehrîfatên ku di Rîsaleyên Nûr de Hatine Kirin)* bi taybetî li ser berhemên Bedîuzzeman kûr bûye û weşanxane bi weşanxane xerabkirinên li ser bêjeyên derbarên kurdan de xebitîye.

Veroj (2015) di xebata xwe ya bi navê *Mehmed Mîhrî Hîlav û Kovara Kurdistanê* de cih daye peywendîya M. Hîlav a digel Bedîuzzeman û bi xweşbînî behsa xebat û xizmetên wî kirîye bê ka wî çawa di biwara huqûqî de berevanîya Bedîuzzeman kirîye. Digel van, Verojî hinek ji axaftina Hîlav a ku di *Tarihçe-i Hayata* wî de derbas bûye neqil kirîye. Çawa ku tê zanîn Hîlav di sala 1952yê de di mehkemeya *Gençlik Rehberi (Rêbera Ciwanan)* ya Bedîuzzeman de avûqatî kiriye.

Soleimani (2018) di xebata xwe ya bi navê *İslam, İslamîzm, Dewlet û Neteweperwerîya Kurdî* de cih daye gotareke li ser Bedîuzzeman a bi navê “Vebêjeya Dînî ya Seîdê Nûrsî di Warê Neteweya Kurd de”. Nivîskarî di vê lêkolîna xwe de kesayetîya sîyasî ya Bedîuzzeman daye ber xwe û li ser helwesta wî ya li pêşberî desthilatdarên Osmanî kûr bûye. Li gorî wî Bedîuzzeman dildarekî mezin ê doza kurdîtiyê ye û di vê rêyê de ji piranîya rewşenbîrên kurd ên serdema xwe lipêştir e. Soleimanî di xebata xwe de li dijî hin kesên derdora kurdperwer ku rexne li kesayetîya sîyasî ya Bedîuzzeman girtine derdikeve û piştevanîya fikrên Nûrsî dike.

Açıkgenç (2018) bîyografîya Bedîuzzeman a bi navê “*Said Nursi*” nivîsîye û TDV İslam Ansiklopedisi ew belav kiriye. Nivîskar piştî ku bi kurtî behsa jîyana Bedîuzzeman a perwerdeyê kiriye, dor anîye ser peywendîya wî digel walîyê Bidlîs û Wanê û hatina wî ya Stenbolê. Digel hinek jîyana wî ya Stenbolê û peyre vegera wî ya li Wanê, çûyîna wî ya Dîyarbekir, Urfa, Kîlîs, Şam û Stenbolê peyre miradê wî yê ku Sultan Reşad butçe ji bo projeya wî ya Medresetuzzehrayê texsîs dike jî bûne mijara xebata wî. Ketina Bedîuzzeman a herba cîhanê, dîlketina wî, vegera wî ya li Stenbolê û desteka wî ji bo Quway-i Millîye, hatina wî ya Ankarayê û serdemên kesayetîya wî, sirgûna wî ya Burdurê û cîyên din, tevgera wî û girtin û darizandina wî û telebeyên wî bûne mijara nirxandina Açıkgenç. Di pey van de nivîskarî cih daye ramana îtîqadî ya Bedîuzzeman a têkildarî hebûna Xwedê, nubuwwet, ilmên îslamî, zanista sîyasetê û berhemên wî.

Aydinkaya (2020) bi navê *Bedîûzzaman'in Hançerî (Xençera Bedîuzzemanî)* xebatek kirîye. Aydınkaya di vê xebata xwe de ji naveroka berhemên Nûrsî zêdetir ji tiştên li ser wî hatine nivîsîn û rewşa “xwegirtîyên” wî sûd wer girtiye. Balê dikêşe ser

hêla Nûrsî (Seîdê Berê) ya şidetê û wî bi Xalidê Şarezorî re muqayese dike. Ji bo Seîdê Nû jî dibêje ku projeya wî ya sêwirandina “mirovêkî nû” bi ser neketîye. Ji dêvla înşakirina wî mirovê baş şexsiyeteke xwedî prototîpa çîna navîn ê tirk-îslamparêz derketîye holê.

Zinar (2022) xebateke bîyografîk a bi navê *Said Kürtlüğün Kayıp Risaleri (Rîsaleya Wenda ya Kurdayetîyê)* kiriye. Zinar, para zehf li ser hêla Nûrsî ya siyasî û kurdayetî sekinîye ku hinek derdor û xwegirtîyên wî naxwazin bê zanîn. Xebat him ji hêla naveroka xwe ve him ji hêla uslûba xwe ve Nûrsî dide nasandin.

Eratila (2023) di kitêba xwe ya bi navê *Bediüzzaman'ın Şark Yıldızları (Stêrkên Bediüzzaman ên Şerqê)* de bîranîn û serborîyên şagirt û naskirîyên Nûrsî bi terzê hîkayebêjîyê nivîsandiye. Berhem ji 193 rûpelan pêk tê.

Salar (2024) pirtûkek li ser Bediüzzaman bi navê *Bediüzzaman Seîdê Kurdî en-Nursî (Bediüzzaman Seîdê Kurdî yê Nûrsî)* çap kiriye. Wî di vê xebata xwe de îddîa û cewabên têkildarî Bediüzzaman anîne rojeva xwe. Bi taybetî wî ew îddîayên ku hin derdor têkilîya Bediüzzaman bi Teşkilat-i Mahsusa ve datînin, nêrîna wî ya li gelê ermen û peywendîya wî ya digel rûdana Bidlîs û Şêx Seîd re daye ber xwe û li serê kûr bûye.

Adak (2024), bi navê *Şiyarkirina Gelê Kurd di Hizra Seîdê Kurdî de* kitêbek nivîsandiye. Ev kitêb berfirehkirina tezên wî yên lisans û masterê ne. Tê de behsa jiyan û hizrên Nûrsî dike.

Kovara Nûbiharê hejmara 167em (2024): Kovara Nûbiharê ya ku gelek caran cî daye Nûrsî û berhemên wî di vê hejmara xwe de wekî dosya bi sernavê Mele Seîdê Kurdî hatîye weşandin. Ji qelemên gelek kesên nasyar û akedemîsyen yên wekî Martin Van Burunsen, Rohat Alakom, Abdurrahman Adak, Fırat Aydınkaya, Abdullah Can, Serdar Şengül, Ekrem Malbat û hwd. gotar weşandine.

E. Tezên li Ser Bediüzzaman Seîdê Nûrsî Hatine Çêkirin

Gelek tezên akedemîk ên master û doktorayê li ser Nûrsî hatine çêkirin. Li vê derê dê bi awayekî kronolojîk navên wan bê dayîn.

1. Çiftçi, A. (1980). Bediüzzaman Said Nurs'nin Hayâtı, Eserleri ve Tasavvufî Yönü. (Teza masterê).

2. Çancı, H. (1988). İslam Siyasal Düşüncesi çerçevesinde Bir Siyasal İdeoloji Olarak Milliyetçilik ve Said Nursî. (Teza doktorayê).
3. Abalı, N. (1995). Said Nursî'de Müslüman Hıristiyan Diyalogunun Sosyolojik İncelemesi. (Teza masterê).
4. Kileci, M. R. (1995). Said Nursi'nin Risalelerinde İ'caz-ı Kur'an. (Teza doktorayê).
5. Yetim, S. (1998). Bediüzzaman Said Nursi'in Eğitim Metodları. (Teza masterê).
6. Koçar, M. (1999). Eleştirel Açıdan Said Nursî'nin Kelâmî Görüşleri. (Teza doktorayê).
7. Beki, M. (2007). Said Nursi ve Tasavvufi Görüşleri. (Teza masterê).
8. Yörük Kesik, D. (2007). Said Nursi'nin Risalelerinde Mehdilik Telakkisi. (Teza masterê).
9. Akdağ, S. (2009). Said Nursî Ve Siyasî Düşünceleri. (Teza masterê).
10. Adak, R. M. F. (2001). el- Mewaqif el-İmam en-Nûrsî es-Siyasiye. (Teza lîsansê)
11. Özyurt, S. (2010). Bediüzzaman Said Nursi'nin İtikadi-Siyasi İslam Mezheplerine Bakışı. (Teza masterê).
12. Göktaş, Ü. (2011). Arap Dili Ve Edebiyatı Açısından Bediüzzaman Said Nursi. (Teza masterê).
13. Ertaş, F. (2012). Said Nursi'nin Eserlerinde Din ve Etnisite Sorunu. (Teza masterê)
14. Arslan, V. (2013). Tasavvufî Açıdan Bediüzzaman Said Nursî'de “Acz” ve “Fakr” Kavramları. (Teza masterê).
15. Can, M. A. (2014). Said Nursi'nin Risaleleri'nde Geçen Hadislerin Tahriri ve Değerlendirilmesi. (Teza masterê).
16. Kurt, Ö. (2015). Bediüzzaman Said Nursi'de Kur'an Belagatına Dair Kavramlar. (Teza masterê).
17. Sarıgül, H. (2015). Bediüzzaman Said Nursi'nin Aleviliğe Bakışı. (Teza masterê).
18. Boz, E. (2015). Bediüzzaman Said Nursî'nin İttihad-ı İslâm Düşüncesi. (Teza masterê).

19. Özbey, T. N. (2016). Bir Sivil İtaatsizlik Örneği Olarak Bediüzzaman Said Nursi’de Müspet Hareket Metodu. (Teza masterê).
20. Uzunaras, A. (2016). Psiko-Sosyal Açıdan İknâ: Bediüzzaman Said Nursî Örneği. (Teza masterê).
21. Yardım, İ. (2016). Bediüzzaman Said-i Nursi’ye Göre Sahabe ve Sahabe Dönemi Olayları. (Teza masterê).
22. Aydın, E. (2017). Bediüzzaman Said Nursi’nin Eserlerinde Din-Siyaset İlişkisine Dair Bir İnceleme. (Teza Doktorayê).
23. Yıldırımçakar, A. (2018). Li ser projeya Bediüzzaman a Medresetu’z-Zehrayê tezeke masterê bi navê Umrek û Mirazek Bediüzzaman û Medresetuzzehra nivîsîye.
24. Cengiz, A. (2019). Bediüzzaman Said Nursi’de Kötülük Problemi. (Teza masterê).
25. İbrahim, Y. (2022). Bediüzzaman Said Nursi'nin Esmâü'l-Hüsnâ Konusundaki Metodu (Kelam İlmi Çerçevesinde Analitik Bir Çalışma). (Teza doktorayê).

Nûrsî xwedî kullîyateke li dora 130 perçe berhemî ye, û bi angaşt ku kullîyata wî tefsîra Qur’anê ya dîrayetî ye radibe. Lewma berhemên wî gelek mijarên cihêwaz di hundurîn. Berhemên wî yên serdema Seîdê Berê bihtir mijarên siyasî û îctîmaî di hewîn. Ev xusûsiyet dest didin ku di mijarên cihêreng de lêkolîn û xebatên zanistî li ser berhemên wî bîn kirin û hatine kirin. Hin kovar hene ku tenê li ser berhemên Nûrsî û li ser berhemên wî weşanên xwe dikin ku yek ji wan *Köprü* ye ku heta niha 167 hêjmar weşandine. Herwiha bi dehan gotarên lêkolînî di kovarên muhekkem de, li ser ramanên Nûrsî hatine weşandin. Li cîhana ‘ereban gelek zanayên zanistên Îslamî li ser fikr û ramanên Nûrsî berhem nivîsandine û bi dehan sempozyûm li welatên ‘ereban û li Rojava di vê biwarê de hatine lidarxistin. Nûrsî hê jî bi dehan zimanên dunyayê tete xwendin û xebatên piralî li ser wî û fikrên wî têtin kirin. Berhemên wî ji pêncî zimanan zêdetir hatine wergerandin. Li ser navê wî enstîtu û kursî ava bûne. Bi navê wî sempozyûm, konferans, semîner tên lidarxistin, xebatên akademîk tên kirin. Navê wî li mizgeft, kullîye û sazîyan tê danîn. Bi navê wî yê din Mele Seîdê Kurdî - wekî bi vê xebatê jî hatiye selmandin- hêz û feraseta xwe di serî de ji Qur’an û Hedîsê, ji kevneşopiya medreseyan kurdan û çanda gelê xwe wergirtiye.

BEŞA YEKEM

1. JÎYAN Û BERHEMÊN BEDÎUZZEMAN SEÎDÊ NÛRSÎ

1.1. Bîyografiyên Bediuzzeman Seîdê Nûrsî yên Heta Niha Hatine Nivîsîn

Nûrsî bi şexsîyeta xwe û fikir û ramana xwe bûye mijara gelek xebatan. Hinek ji van xebatan di saxîya wî de, hinek ji wan jî piştî wefata wî hatine kirin. Li vê derê bîhtir xebatên bîyografîk dê bî destnîşankirin:

- M. Hamza, *Bediüzzaman Said-i Kurdi'nın Tercüme-i Halinden Bir Hulasadır (Puxteyek ji Jîyana Bediüzzeman Seîdê Kurdî)* (Bediüzzaman Said-i Nursî, 2004, rr. 653–61). Telebeyê Bediüzzeman, Hemze Begê Muksî bi xebata xwe ya tirkî, hin agahdarîyên têkildarî jîyan û xebatên Nûrsî rêz kirine. Ji ber ku xebata ewil e ji bo vê lêkolînê giring e. Hemze Beg, bîyografiya Bediüzzeman ji destpêkê heta ku beşdarî Şerê Cîhanê yê Ewîl bûye nivîsîye. Lêbelê ev jî bi awayê kurtebêjî ye.
- Abdurrahman Nursi, (1997a) birazîyê Seîdê Nûrsî ye, bi xebata xwe ya *Bediüzzaman'ın Tarihçe-i Hayatı (Jînenîgarîya Bediüzzeman)* ji bo vê lêkolînê bû çavkanîyeke eslî. Wî ev xebata xwe bi alfabeya erebî-osmanî nivîsîye û di sala 1919ê de li Stenbolê daye çapkirin. Bîyografiya Bediüzzeman ji destpêkê heta Herba Cîhanê ya Giştî tê de cih girtiye.
- Abdurrahman Nursi (Bediüzzaman Said-i Nursî, 2004, rr. 662–665) xebata xwe ya li ser bîyografiya mamê xwe, bi *Tarihçe-i Hayatın Zeyli (Pêveka Jînenîgarîyê)* berdewam kiriye û bi taybetî û kurtî behsa jîyana wî ya li Stenbolê kiriye.
- *Sorularla Bediüzzaman Said Nursi (1) û Sorularla Bediüzzaman Said Nursi (2)* ji aliyê İsmail Mutlu ve hatiye amadekirin û di sala 1995ê de di weşanxaneyê Mutlû de hatiye weşandin (Mutlu, 1995).
- *Bediüzzaman'ın Van Hayatı ve Hayatındaki Üniversite* ji aliyê Mahmut Aksu (2003) ve hatiye amadekirin û li Urfayê di sala 2003yê de hatiye çapkirin.
- *Üstad Bediüzzaman'ın Van Hayatı* ji aliyê Ayhan Işık (2013) ve hatiye nivîsin û di sala 2013ê de ji layê weşanxaneyê Şahdamarê ve hatiye çapkirin.

- Yusuf Ziya, Zübeyir, Abdülmuhsin (Mardin, 2024), *Bediuzzaman'ın Terihçe-i Hayatından Harikalar (Derasayîyên ji Jiyana Bediuzzemanî)*. Musteqil e nehatiye çapkirin.
- Eşref Edib, *Risale-i Nur Muellifi Said Nur; Hayatı, Eserleri, Mesleği (Seîdê Nûr ê Nivîskarê Rîsaleyên Nûr: Jiyana wî, Berhemên wî, Rêbaza wî)* (2011). Edib, nas û hogirekî Nûrsî ye. Çavdêrî û întîbaya xwe bi kurtasî derbarê jiyan, berhem û pêşeya wî de vedibêje.
- Komisyon, *Risale-i Nur Muellifi Bediuzzaman Said Nursî Tarihçe-i Hayatı (Jînenîgarîya Bediuzzaman Seîdê Nûrsî yê Nivîskarê Rîsaleyên Nûr)* (2004). Ev berhem, cara ewil di sala 1958ê de hê Nûrsî li heyatê bû ji alîyê hinek şagirtên wî ve hatiye amadekirin. Wekî *Tarîxçeya Mezin* jî tê zanîn.
- A. Badıllı, di xebata xwe ya li ser sê cildan a bi tirkî *Mufasssal Tarihçe-i Hayat (Jînenîgarîya Berfireh)* (1990) de bi hûrbînî li ser jîyan, felsefe û berhemên Nûrsî xebitîye û bi rêbaza nîqaşê ronahî daye ser gelek alîyên wî. Ev berhem xebata herî dorfîreh e ya derbarê Nûrsî de.
- A. Badıllı, jînenîgarîyeke bi navê *Bi Xulaseya Xulaseyî ji Encama Jiyîna Hezretî Ustad Seydayê Bediuzzaman Seîdê Nûrsî* (r.d.) (1992) nivîsiye û xistiye dawîya wergera *Küçük Sözler*ê a bi navê *Peyvên Biçûk*. Ev jînenîgarî (*Peyvên Biçûk*) yek ji wergerên pêşîn ên kurdî yên Rîsaleyan e û yekemîn jînenîgarîya Bediuzzaman a bi kurdî ye.
- Necmeddin Şahiner, *Bilinmeyen Taraflarıyla Bediuzzaman Said Nursi (Bediuzzaman Seîdê Nûrsî bi alîyên wî yên Nayê Zanîn)* (2004). Ev xebat ji hinek hêlan ve behsa jînenîgarîya Nûrsî dike.
- Mustafa Çalışan, *Asrı Güzelleştiren Adam Bediuzzaman Hayatı ve Mefkûresi (Bediuzzaman: Zilamê ku Serdem Xweşik Kiriye, Jiyana wî û Doza wî)* (2012). Ev berhem behsa jiyan û mefkûreyê Nûrsî dike.
- Ahmed Akgündüz, *Arşiv Belgeleri Işığında Bediuzzaman Said Nursi ve İlmî Şahsiyeti (Di Ronahîya Belgeyên Arşîvan de Bediuzzaman Seîdê Nûrsî û Kesayeta wî ya İlmî)* (2013). Ev xebat ji 6 cildan pêk tê. Bi berhevkirina pêncî hezar belgeyên arşîvên dewleta Turkiyeyê hatiye amadekirin. Di xebatê de wêneyên belgeyan ên orjînal hene. Akgündüz

di şirovekirinên xwe de subjektîv tevgerîyaye. Ev berhem di nav berhemên ku li ser Nûrsî hatine amadekirin ya herî dorfireh e.

- Hayrat Neşriyat / Lijneya Lêkolînên Ilmî ya Hayrat Vakfî, *İlk Defa Yayınlanan Orijinal Mektuplar Işığında Bediüzzaman Said Nursi ve Hayru'l-Halefi Ahmed Hüseyin Altınbaşak, (Di bin Ronîya Nameyên Resen ên Yekem Car Tê Weşandin Bediüzzaman Seîdê Nûrsî û Peyrewê wî yê Qenc Ehmed Xusrew Altınbaşak* (2013). Ev xebata lijneyî wekî 3 bergan hatiye çapkirin. Wekî ji navê wê jî diyar e ne tenê jiyannameya Bediüzzaman e her wiha ya Xusrew Efendî ye jî.¹ Tiştê bi mijara me re têkildar e: Tenê qederê 3 rûpelan cî dane Medreseya Zehrayê li wir jî behsa wê jêdera Nûrsî nakin, ya ku kurdî jî di zimanên perwerdeya zanîngehê de dijmêre².
- M. İzzet Çixsî *Bedîê Esrê Jînameya Bediüzzaman* (2016). Çixsî vê xebata jînenîgarîya Nûrsî bi aweyekî helbestkî nivîsîye. Hem tîpên latînî hem jî yên erebî bi kar anîye.

Derbarê heyata Bediüzzaman Seîdê Nûrsî û bîrdozîya wî de pirtûkên bi zimanê biyanî jî hene. Pirtûka Şerif Mardin (*Religion and Social Change in Modern Turkey The Case of Bediüzzaman*) bi navê *Bediüzzaman Said Nursi Olayı (Diyardeya Bediüzzaman Seîdê Nûrsî)* (1915) ji alî Metin Çulhaoğlu ve li tirkî hatiye wergerandin û berhema Şükran Vahide a bi navê *İslam in Modern Turkey An Intellectual Biography of Bediüzzaman Said Nursi (Bîyografyaya Entelektuelî ya Bediüzzaman Seîdê Nûrsîyê Misilman di Turkîyeya Modern de)* (2005) du heb ji van pirtûkan in.

Jiyana Nûrsî bûye mijara gelek romanên bîyografîk jî, *Zamanın Sesi Bediüzzaman Beşlemesi (Dengê Zemanî, Pêncanekirîya Bediüzzamanî)* (2011) ya İslam Yaşar yek ji van berheman e. Ev romana ji pênc cildan pêk tê bi hûrbînî li ser jiyana Nûrsî sekiniye. Son Suvari (2013) ya Ferîd El-Ensarî ku bi zimanê erebî nivîsîye, navê wê yê orjînal *Axîru'l-Fursan (Siwarîyê Dawî)* e. *Çizgilerle Bediüzzaman Said Nursi (Bi Xêzik û Neqşan Bediüzzaman Seîdê Nûrsî)* (2022) ya Hayreddin Ekmen bi terzê wêneçîrokî hatiye nivîsîn û xêzkirin. Ji du cildan pêk tê.

¹ Bnr. Bo xwendineke rexneyî ya bo vê xebatê: <https://www.ilkehaber.com/yazi/hayratin-tarihcesi-ya-da-dagin-fare-dogurmasi-11638.htm>. 3 nivîs hene. Dema têkilîyê: 21.01.2025.

² Bnr. Berg 1, rr. 141-144.

Berhemên li ser Nûrsî hatine nivîsîn ji qamê der in. Mijar û qewareya vê xebatê dest nade ku li vê derê hemû bên destnîşankirin. Bi munasebata behs û babetan dê yên bihtir eleqedar werin diyarkirin.

1.2. Jîyana Bediuzzeman Seîdê Nûrsî

Mutefekir ber û berhema civata xwe ne, ji hêla din ve sazkar û mîmarê civata xwe ne jî. Rewşenbîr û alim bêhtir serdema xwe temsîl dikin. Hin ji wan dibin nasnameya serdema xwe, serdema wan bi wan tê binavkirin, wekî pêxember û şaxsiyetên navdar ên wekî *Sokrat, Konfîçyus, Buda, Gandî* û êd. Tê gotin “serdema filankesî/ê”, mebest jê ew kesên bi bîr û raya xwe reng dane wê serdemê. Hin ji wan jî hê di ciwanîya imrê xwe de nav û deng didin, meşhûr dibin wekî Şêx Abdulqadirê Geylanî (1077-1166), Şehabuddîn Sohrewerdî (1154-1191), Mewlana Xalidê Şehrezorî (1779-1827), hin ji wan jî bi navê bedî‘ û delalîya serdemê tên nasîn. Seîdê Nûrsî jî yek ji wan çend kesan e ku wesfê “Bediuzzeman” wergirtîye mîna Ebu’l-Fazl Bediuzzeman Ahmed b. El-Huseyn b. Yahya el-Hemedanî (968/1008) û Bediuzzeman Mîrza Kurê Huseyîn Baykarayê Heratî (1469-1515).

Bediuzzeman Seîdê Nûrsî nexwestîye şexsiyeta wî ya takekesî zêde derkeve pêş. Gava pê hisiyaye şagirtên wî jînenîgarîya wî dinivîsin, gotiye; ne hewceyê tefsîlatê ye. Bila tenê behsên derbarê xebatên *Rîsaleyên Nûr* de bîn nivîsîn (Komisyon, 2004, r. 25). Li gel wî Bediuzzeman Seîdê Nûrsî, destûr daye telebeyê xwe Hemza Begê Muksî da ku jînenîgarîya wî ya bi navê *Beüzzaman Said-i Kurdi'nın Tercüme-i Halinden Bir Hulasadır* (Puxteyek ji Jînenîgarîya Bediuzzeman Seîdê Kurdî) binivîse. Tarîxçeya heyata wî ya ku birazîyê wî Abdurrahman Nursî nivîsiye weke pêvekê xistiye pişt berhemeke xwe; dîsa musaede kirîye ku telebeyên *Rîsaleyên Nûr* ên li Stenbolê *Küçük Tarihçe* (Tarîxçeya Biçûk) binivîsîn û dawîyadawî li ser israra şagirtên wî izin daye ku şagirtên wî yên li Isparta û Kastamonuyê bi piştgirîya telebeyên wî yên din û bi teshîha wî berhema bi navê *Bediüzzaman Said Nursî Tarihçe-i Hayati* (Dîrokçeya Heyata Bediüzzaman Seîdê Nûrsî) bi awayekî berfireh neşir bibe (Akgündüz, 2013, r. 7). Gava amadehîya nivîsîna vê berhemê dihat kirin şagirtên wî xwestine tiştên tenê derbarê jînenîgarîya wî ya şexsî de binivîsin lêbelê Nûrsî ev yek nexwestîye (2004, r. 25). Sedema vê yekê baş nayê zanîn, gelo nedixwest ku şexsiyeta wî ya takekesî zêde derkeve pêş an di vî warî de nebawerîyek bi kesên ku dê binivîsin hebû? Sedem her çî ye, tam nayê zanîn, Nûrsî gotiye, ne jînenîgarîya min, a Rîsaleyên

Nûr binivîsin, lewma rîsaleyên wekî *Ayetu'l-Kubra* û *Munacatê* jî xistine nava vê berhemê. Her wiha ji Rîsaleyên wekî *Îki Mekteb-i Musibetin Şehadetnamesi*, *Munazarat*, *Hutbe-i Şamiye*, *Lem'alar*, *Mektubat* û *Şualarê* gelek qisim û Mektûbên ji Rîsaleyên Nûr jî xistine nava vê berhemê.

Jînenîgarîya Nûrsî bi giştî dikare li ser du beşan bê dabeşkirin:

A yekem: Ji dayîkbûna wî hetanî pêncî salîya wî ku heyata wî ya tehsîlê, niştecihbûna wî li Wanê, çûna wî ya li Stenbolê, heyata wî ya sîyasî, seyahetên wî, tevlibûna wî ya herba umûmî, esareta wî ya li Rûsyayê, li Stenbolê endamtîya wî ya Daru'l-Hîkmeti'l-Îslamîyeyê, hatina Ankara û tevgerên wî yên li Meclîsa Mebusanê ya Yekem û piştî demeke kurt vegerîna wî ya Wanê û li wir ketina wî ya înzîwayê.

A duyem: Ji nefikirina wî ya ji Wanê dest pê dîke 34 salên bi mişextî, sûrgûnî, heps û tecrîdê derbas dibe; heyata wî ya li Barlayê (1925-1934), heyata wî ya li Eskişehirê (1935-1936), heyata wî ya li Kastamonuyê (1936-1943), heyata wî ya li Denizliyê (1943-1944), heyata wî ya li Emirdaxê (1944-1947), heyata wî ya li Afyonê (1948-1949) û heyata wî ya li Ispartayê (1950-1960) (Komisyon, 2004, rr. 1-31).

Di vê beşê de dê jînenîgarîya Nûrsî bi awayekî berfireh bê diyarkirin. Hêla wî ya malbatî, ya medreseyê, ya nav kurdan, ya sirgûnî, tecrîdî û heta wefata wî dê bê veçirandin. Ji ber ku mijara vê xebatê “*Çanda Kurdî di Berhemên Seîdê Nûrsî de*” ye em ê hêlên wî yên bi teze re eleqedar zêdetir derxînin pêş. Nûrsî, di heyata xwe de ji şohretê direvîya lê wî li pey xwe bi rêya berhemên xwe (*Rîsaleyên Nûr*) yên li dora şeş hezar rûpelan in, rêçek hiştiye ku bi dehan grûbên xwegirtîyên wî çêbûne. Bedîuzzeman Seîdê Kurdî, di sala 1293yê Rûmî/1876 Mîladî de li gundê Nûrsê yê li ser nehîyeya Îsparîta girêdayî qezaya Hîzana Bedlîsê ye hatiye dinyayê. Heta neh salîya xwe li ba bavê xwe maye (Nursi, 1997b, r. 13).

1.2.1. Malbata Wî

Navê bavê wî Mîrza ye. Navê diya wî Nûrê ye. Li gorî rêza temenê wan xwîşk û birayên wî: 1- Durriye, 2- Xanim (w.1945), 3- Abdullah (w.1914), 4- Bedîuzzeman Seîdê Nûrsî (1876-1960), 5- Mihemed (1951), 6- Abdulmecîd (1967) 7- Mercan (kengî li kuderê wefat kiriye nayê zanîn) (Badıllı, 1990, r. 52). Bedîuzzeman di 80 salîya xwe de di nameyeke xwe ya ku di *Emirdağ Lahikası*yê de weşandîye weha behsa malbata xwe dîke: Ji ber ku min ji neh salîya xwe ve dayîka xwe ya bi şefqet nedîtiye, ji sohbeta

wê bêpar im. Ez ji wê hezkirina hêja mehrûm im û ji pazdeh salîya xwe ve min hersê xwîşkên xwe jî nedîtine. Rihma Xwedê li wan be ji ber ku ew jî li gel dayîka min derbasî berzexê bûne ji tehm û lezeta sohbeta xwîşk û biratîya wan a bi hurmet û merhemet a ku xweşîya herî xweş ya vê dinyayê ye mehrûm mam. Û ji ber ku ji sê birayên xwe min dido ji wan ev pêncî sal in nedîtine (rehma Xwedê li wan be) ji sohbeta her duyên wisa biqîmet wisa dîndar, wisa alim û ji hezkirina wan a bihurmet, şefqeta wan a bimerhemet mehrûm im (Nursî, 2003a, r. 443).

Nûrsî, dema dixwaze dilê birayê xwe Ebdulmecîd aşt bike wekî rol-model helwesta bavê xwe nişanî wî dide. Gava ew (Ebdulmecîd) xeberên xirab û mûsîbetî dibihîse bila bibe wek bavê min ê rehmetî (rh) bila nebe wek dayîka min a rehmetî. Lewra dema berê di jiyana min a bi xirecir de nûçeyên ecêb diçûn dêûbavê min. Dema bavê min xeberên xirab ên wekî “Lawê we mir yan hat lêdan yan kete hepsê.” dibihîstin kêfa wî dihat û dikenîya. Digot: Maşallah lawê min dîsa karekî giring kiriye û lehengîyek nîşan daye ku herkes behsa wî dike. Lê dayîka min li hember kêfxweşîya wî bi tundî digirîya (2003a, r. 91).

Di cîyekî din de Nûrsî wiha behsa dayîka xwe dike: Tevî ku min di vî imrê xwe yê heştê salî de ji heştê hezar kesî ders wergirtiye, qesem bi navê Xwedê darsa herî asasî û nehejînok ew ders û telqînên dayîka min a rehmetî ye û her tim darsa xwe dubare dike ku ew ders di fîtreta min de goya di laşê min ê maddî de wekî dendikan bi cî bûne. Ez bi yeqînî dibînim û dihesim ku dersên min ên dîtir li ser wan dendikan zîl dane û geş bûne. Nexwe ew ders û telqînên ku dayîka min a rehmetî niqutandibûn fîtret û ruhê min ê di yeksalîya min de, niha ez şahidîyê dikim ku di nav heqîqetên mezin de, yên ku niha di vê heştê salîya xwe de dibînim, bûne yekoyek dendikên asasî (Bediüzzaman Said Nursî, 2004c, r. 200).

1.2.2. Tehsîla Wî

Gava mirov bala xwe dide tahsîla Nûrsî mirov dibîne ku pergala medreseyên kurdan ne li gorî tebîetê wî bûye. Lewre hê di neh salîya xwe de li gundê Taxê yê li ser nahîyeya ocaxa Îsparîtê li ba Mele Mihemed Emîn dest bi xwendinê dike. Lê li wir zêde namîne û ji wir diçe gundê Pirmisê, piştî wî diçe havîngeha Şêxê Hîzanê li ba Şêx Seyîd Nûr Muhemed dixwîne. Ji ber tebîetê xwe û ji ber amadehîya qedêrî ya bo paşerojê û fikra guherandin û kemilandina rêbaza medreseyan li wir jî pir namîne. Ji wir bi birayê xwe Mele Abdullah re diçe havîngeha Şêxanê ya gundê Nûrşênê. Ji wir

vedigere gundê Hîzanê. Li wê derê dev ji tehsîla medreseyê berdide tê malê, cem bavê xwe. Piştî demekê bi destûra bavê xwe dîsa ji bo tehsîla ilmê diçe nehîyeya Erwasê, çima ku seydayê muderris ew teslîmî şagirtêkî xwe dike da ku dersa wî bide ev yek jê re giran tê, li wir namîne derbasî medreseya Mîr Hesenê Welî dibe, ji ber sedemên pergala medreseyê li wir jî debar nake diçe Westanê, ji Westanê ligel yekî navê wî Mele Mihemed e diçe Bazîdê. Seîdê Nûrsî li vê derê dest bi tehsîla xwe ya heqîqî dike. Heta vê gavê bîhtir bi ilmê serfê û nehwê meşxûl bûbû û gihîştibû *Îzharê*. Ev xwendina wî ya li Bazîdê ya li ba Şêx Mihemed Celalî jî tenê sê mehan domandîye. Ligel wî, Seîdê Nûrsî li gorî rêbazeke ku wî li gorî xwe tesbît kiribû hemû kitêbên rêzê qedandine (Komisyon, 2004, rr. 24-36).

1.2.3. Jîyana Dewra Seîdê Nû

Her çiqas destpêka serdema Seîdê Nû bigîhêje êsîrîya wî ya li Kosturmayê (Bediüzzaman Said Nursî, 2004c, rr. 234–38) û dema çapkirina kitêbên wî yên li Ankarayê ku kitêbên pêşî yên Seîdê Nûrsî ne (Bediüzzaman Said Nursî, 2004c, r. 113; Nursî, 2003b, r. 7). Li vê derê em ê bi sirgûnîya wî ya Burdurê dest pê bikin. Digel agahîyên asasî; rewşa jiyana wî, nivîsîna Rîsaleyan, îskana mecbûrî, ketina wî ya hepsê, îqameta mecbûrî ya bajarên curbecûr û hwd. Heta ji dest hat em ê balê bikêşin ser têkilîya wî ya bi welêt û welatîyan, pêwendîya wî ya bi sirgûnîyên wekî wî re.

Gava Nûrsî ji Stenbolê vedigere Wanê, Dîyaneta serdemê wesîqeya waiztîyê didê. Ew li Wanê di Mizgefta Norşênê de dersdêrî û waiztîyê dike. 9-10 meh şûnde diçe di şikefteke çiyayê Ereke de dikeve înzîwayê. Bi hinceta piştgirîya hereketa Şêx Seîd kirine, fermana kurdan radibe. Digel ku ev hereket li alîyê Wan, Hekarî, Beytuşebab û Bedlîsê zêde belav nabe jî bi hinceta ku têkilîya wan bi hadîseyê re heye gelek kesên navdar ên kurd digrin binçav. 10ê Sibata 1925ê Nûrsî li Ereke desteser dikin tînin navenda Wanê. Bi gelek kesên navdar re berê wî didin sirgûnê. Badîllî (1990, r. 567) vê merheleyê wiha vedibêje: Gava cendirme Ustad Bediüzzaman dibin, telebeyên wî yên fedaî û girseyek ji gel dixwazin wî ji destê cedirmeyan xelas bikin. Bi “zimanê mehellî” dibêjinê Seyda misadeya te hebe emê te birevînin, bibin nav dewleteke misilmanan. Bediüzzaman wiha bersiva wan fedaîyan dide: “Na, ez bi rizaya xwe diçim. Ev eskerên muhafîz ne neyar in. Birayên we yên misilman in û di hukmê şagirtên min de ne. Rewşeke meraqdarîyê nîn e. Ez bi rizaya xwe diçim

Anadoluyê. Di bin muhafazayê de me. Endîşe nekin. Belav bibin, herin mala xwe.” Bi vî awayî wan teskîn dike.

Yek ji wan şexsîyetên ku tên sirgûnkirin jî miftîyê Wanê Şêx Masûm e. Şêx Masûm mirovekî ixtiyar e. Badîllî ji devê Haydar Subhandağliyê kurê Kor Huseyîn Paşa wiha neqil dike: Wextê sirgûnîyan ji Wanê bi rê dixin, destê Nûrsî û yê Şex Masûm bi hev ve kelebçe dikan. Di rê de destê Şêx Masûm di kelebçeyê de dişide, wisa dişide hew debar dike. Ji cendirmeyekî muhafîz rica dike da ku kelebçeya destê wî hinekî sist bike. Cendirme ji dêvla kelebçeya destê wî sist bike, qûntaxtingekê li navpiştê Şêx dide. Demsal zivistan e. Dinya şilî ye. Her der herî û teqan e. Bi derba cendirme Şêx bi serdevo şûşî erdê dibe. Bedîuzzeman wî radike, dimeşin. Diçin ser kanîyekê, Bedîuzzeman bi destê xwe yê serbest ser û çavê wî ji herîyê dişo. Sê çar rojan li Patnosê, şevekê li Agirîyê, hefteyekê li Erzurûmê dimînin (1990, r. 571). Ji wir bi dor derbasî Trabzon, Stenbol, Îzmîrê û Burdurê dikan. Li gorî bîranînên kurdên zaza û şêxên herêma Çanê ev qefleya mişextîyan ku Nûrsî jî tê de bû tûşî êrîşa bi keviran dibin û astengî derdixin ku têkîlî çênebe di navbera van mişextîyan û kurdên nişteciyên berê de (Zînar, 2022, r. 299). Nûrsî li vir bi qasî deh mehan dimîne, kitêba *Nurun İlk Kapısıyê* (Derîyê Pêşîn ê Nûrê) jî li vir dinivîse. Piştî ji bo ku bi temamî ji insanan dûr bikeve û bêtir di bin çavan de bimîne dişînin nehîyeyeka bi navê Barlayê ya bi ser Ispartayê.

1.2.3.1. Jîyana li Barlayê

Di 1ê Adara 1927ê de Nûrsî tînin Barlayê, heyanî Îlona 1934ê li wir dimîne. Rayedar naxwazin ku bi kesî re bikeve têkîliyê; da ku bê jibîrkirinê, nekeve nav tu tevgeran. Lê berovajîyê mexseda wan, gelek rîsaleyên Peyvan û yên Mektûbatê û heta Lem‘eya 21ê (Bedîuzzeman Seîd en-Nûrsî, 1992, r. 144) li vir dinivîsîne. Gelek insanên bawermend û dilsoz li dora wî dicivin û dibin şagirtên wî (Zînar, 2022, r. 298). Li vir şagirtên wekî Xulûsî Beg, Hafîz Elî, Siddîq Silêman û Hafîz Tewfîqê Şamî û Muhacir Hafîz Ehmed gelek kesan xwe dan dora Nûrsî.

Di xerîbîya li Ispartayê de çend nameyên di navbera Barlayê û welêt/welatîyan de, him dibin wesîleya bêhnvedanê him jî kul û kesara welêt, meriv, heval û hogiran nîşan didin. Nameya birazîyê wî Ebdurrehman yek ji wan e. Ebdurrehmanê ku Nûrsî wekî peyrewekî xwe yê qenc ê piştî wefata xwe lê dinihêrt. Piştî çend salên sirgûnîyê pêwendîyek pê re danîye. Di wê nameya tirkî de wiha xîtabî Nûrsî dike: Aziz Mamo!

(Nursî, 2002, r. 39). Nameyek heye (Nursî, 2002, rr. 121-23) ku wekî masûra tevnê di navbera Wan, Norşîn, Dîyarbekir, Stenbol, Şam û Medîna munewer de diçe û tê, behsa gelek heval, şagirt û welatîyên li wan deran dike. Bi hesret dibêje “Heyata ilmî ya bîst salî ku min li Wanê borand... Wan, bo min pir bi qîmet e.” Namenûs, digel nameyê dîyarî jî şandine bo Nûrsî, lê ew dîyarîyan qebûl nake û ev yek bo Nûrsî weke xeteke sor e. Lewma him spasî û lêborîna xwe, him wefadarîya wan û dîyarîya herî hêja ya bo xwe wisa tîne ziman: “Di vî zemanî de li wê deverê lêgera we ya li min a bi wefadarî, şefqetkarî dîyarîyeke wisa ye ku ji hezar dîyarîyên weke vê hêjatir e. Parastin û xwedîlêderketina we ya li wan rîsaleyên ku min bo we şandin, dîyarîyeke ku bihayê wê bi hezaran banqnotî ye bo min. Lewra ew rîsale encama jiyana min, wezîfeya min a welatî ne û awayek ji awayan dana deynê min ê li hember biratî û hezkirina birayên min ên wê deverê ne. Hûn bûn wesîleya gihandina destê kesên ahlê wan rîsaleyan, ev yek dîyarîyeke wisa ye ku miqabilê bi hezar dîyarîyên dinyayî ye (Nursî, 2002, r. 123). Xwişka Nûrsî Xanim jî, ji Şamê du nameyan jê re dişîne. Nûrsî jî bi nameyekê bersiva wê dide, ji bo dilê wan xweş bike dibêje ez li gundekî melatîyê dikim (Badıllı, 1990, r. 870). Di nameyeke din a bersivê de, piştî besmelê û silavan navê gelek hezkirîyan li pey hev rêz dike û dibêje: Min nameya we wergirt. Di vê hewayê xerîbîyê de bêhna welêt seh kir. Newayên hezîn ên welêt ji dûredûr li tîlên hestên min ketin û min ew bi xweşikî guhdarî kirin. Her wiha di nameyeke din a wî de ya ku ji şagirtê xwe yê yekem Xulûsî Beg re dişîne, em bi kul û kesera wî ya welêt dihesin. Bi minasebeta derketina tayîna Xulûsî derdikeve Qersê, Nûrsî nameyekê jê re dişîne: Biracan! Qedera Îlahî ji bo xizmeta Nûrê te dîgerîne. Sewqî cîyên herî hewcedar dike. Bi taybetî ew herêm, memleketê min...(Nursî, 2002, r. 380).

1.2.3.2. Girtîgeha Eskişehirê

Piştî heşt salan bi ultîmatoma hikûmeta desthilatdar, Nûrsî ji Barlayê vediguhezînin Ispartayê. Sedema vê sirgûnê hêj zêdetir kontrolkirin bû (Şirnexî, 2024, r. 82). Li vir bi dek û dolaban ji bo ku hincet çêbe û bibe wek bûyera Menemenê da wan sewqî mehkemê bikin û tîxin zindanê. Bi îhtîmala hincetî ya “Dibe ku zirar bigîhinin asayîşê û dîn bikin amûrê sîyasetê û hwd.” desteser dikin û dibin Eskişehirê, piştî darizandinê ji nav 120 şagirtî 97 heban berdidin (Badıllı, 1990, r. 148). Nûrsî û yên mayî dixin zindana Eskişehirê. Nûrsîyê ku jê re sekin nîne di vê zindanê de dîsa Nûrê pêdixe. Peyvên 27, 28, 29em, Lem‘eya 30î û Şu‘eyên 1 û 2yem dinivîse (Şirnexî,

2024, r. 83). Dadgeha Giran a Eskişehirê biryara bicihkirina mecbûrî ya li Kastamonuyê dide û dûra sirgûnî wê derê dikin.

1.2.3.3. Sirgûnîya Kastamonuyê

Ji bihara 1936ê heta payîza 1943yê nêzî heşt salan emrê wî li Kastamonuyê dibore. Hertim di bin çavdêrîya hukûmet û polîsan de bû. Sê mehên pêşî di qereqolê de dimîne û dûra jî li xaniyekî biçûk ê li hemberî qereqolê tê bicîkirin. Hetta du sal û nîvan jî nedikarî bi şagirtên xwe yên Ispartayê ra têkilîyê dayne (Bediuzzeman Seîd en-Nûrsî, 1992, rr. 150-51).

Li vir jî Şu'eya Sêyemîn (Munacat) heta Şu'eya Dehemîn heşt Şu'eyan dinivîse. Şu'eya Heftemîn ku bi navê Ayeta Kubra belav dibe, yek ji giringtirîn rîsaleyan e. Dema têkilîya bi Ispartayê re çêdibe kitêbên ku li wir dihatin îstînexkirin jî teshîh dike. Li vê derê jî hêdî hêdî şagirt û hevalders çêdibin wekî Mehmed Feyzîyê Kastamonî, Sadiq Begê Taşkoprewî, Ehmed Nazîfê Îgnebolewî (Bediuzzeman Seîd en-Nûrsî, 1992, rr. 150-51). Ji bilî telîf û teshîha rîsaleyan û çend şagirtên dilsoz dilê wî, bi welatîyekî wî jî aşt dibe: Emînê Şikakî yê di tevgera rojhilat de hevaltîya Smaîl Axayê (Simko) Şikakî kiriye. Ev begê kurd jî ber şert û mercên sirgûnîyê ji bo debara xwe, li wir çaygerîyê dike. Çawa Bekir Beg li Ispartayê hevaltîya Nûrsî û xizmetkarîya Rîsaleyên Nûr dikir, ev Emîn Beg jî li Kastamoniyê bi heman mîsyonê li ba Nûrsî cî girtibû. Ji ber vê pêbawerî û emîndarîyê tevî ku navê wî yê eslî Yemen bûye, Nûrsî navê Emîn lê kiriye, û jê re gotîye “Rehmetullah” ango rehmeta Îlahî ku bi hevaltî û xizmetkarîyê hatiye şandin bo hawara wî (Badıllı, 1990, r. 1145).

1.2.3.4. Girtîgeha Denizliyê

Şu'eya Pêncemîn a behsa elametên qiyametê dike, ku li Kastamonuyê hatibû nivîsandin, piştî belavbûnê dibe hinceta dozvekirinê ku Nûrsî li hember înkîlabê ye, dijberî rejîmê ye û hwd. Di heman demê de jî li Ispartayê Şu'eya Pêncemîn ku Ayeta Kubra ye, bi makîneya teksîrê hatibû zêdekirin û dê bihata belavkirin. Ji asayîşê tirê ku di van kolîyên kitêban de Şu'eya Heftemîn heye lewma desteser dikin û bi emrê tewqîfa dozgerê Ispartayê, Nûrsî û gelek şagirtên wî ji Kastamonuyê tînin û tevî hin şagirtên li Ispartayê dixin girtîgeha Denizliyê. Di nav şert û mercên giran ên zindanê û hepsa tecrîdî de ne. Nûrsî dîsa jî karê îrşad û te'lîfê dewam dike. Şu'eya 11em ku wek fêkîyeke zindanê tê pênasekirin û gelek nameyên ilmî, îrşadî di vê zindanê de

hatine nivîsandin. Tevî ku bi îdamê dihatin darizandin hertim şagirtên xwe aşt dikir hêvî û motîvasyonên wan zêde dikir û digot “Xeman nexwin dê ev Nûr bibiriqin.”³ Piştî beraatê qederê çil rojî li Denizliyê dimîne lê serbest nahêlin û ji wir jî (30/07/1944) sirgûnê Emirdağa Afyonê dikin (Badıllı 1990:1093).

1.2.3.5. Jiyanî Sirgûnî ya li Emirdağê û Zindana Afyonê

Li vir jî li xaniyekê li hemberî avahîya hikûmatê bi cî dikin. Berî ketina hepsa Afyonê û piştî wê nêzikî heşt salan li vî xaniyê dimîne. Nûrsî piştî tehlîyeya hepsa Denizliyê gelekî bi ihtiyat tevdigere. Digel ku de‘weya wî ji aliyê mahkemeyê ve hatibû bereet kirin jî dîsa dişînin temîzê. Bi kesî re têkilî danayne. Tenê diçe mizgeftê û tê. Piştî demekê qeymeqam nahêle here mizgeftê jî. Ev îzolekirina Nûrsî bi qasî ku nikaribe roja îda Remezanê û ya Qurbanê bi nas û dostên xwe îdê pîroz bike dişwar tê tetbîqkirin. Piştî şeş mehan hê karî nameyekê ji telebe û xwegirtîyên xwe re bişîne (Badıllı, 1990, rr. 1094–1095).

Di sê sal û nivê ku Nûrsî anîn Emirdağê heta bikeve hepsa Afyonê çend kitêbên wekî berhevok ên ji berhevkirina rîsale û nivîsên berê amade kirin. Wekî *Zulfiqar*, *Esayê Mûsa*, *Sîracu’n-Nûr*, *Tilsimler* (Berhevoka Tilisman), *Sîkkeya Tesdîqa Xeybî*. Dîsa di van deman de hin berhemên berê dikeve rojeva wî û ew jî wekî ku dixwaze bi hinek mijarên civakî û pirsên kurdî şagirtên xwe bihesîne, wan perwerde û hişyar bike, him jî wan berhemên berê di ber çavan re derbas bike, teshîh bike (Badıllı, 1990, r. 1114).

Di tarîxa 23/01/1948ê de Nûrsî û 15 şagirtên wî dixin zindana Afyonê. Ji bo îmhakirin û kuştina wî îca ji xeynî jehrdanê di çilê zivistana Afyona bi sermaye xwe navdar e Nûrsî bi tenê dixistin qawîşeke fireh û ya bêsope da ku ji sir û seqemê biqefîle û bimre. Ne sobe heta nedihîştin ku menqelekê jî daynin. Piştî sal û nîvekê di 20ê Îlona 1949ê de tahliye dibe û ji zindanê derdikeve lê belê dîsa jî serbest nahêlin. Piştî du-sê mehan dîsa dibin Emirdağê, li cîyê berê bi cî dikin û teqîba xwe dewam dikin (Zınar, 2022, rr. 382–84).

³ Şagirtên wî piştî bi salan şûnde têbinîyekê datînin wê hevokê: “Birako, bala xwe bidê. Di zindana Denizliyê de tevî ku temamê sebebên alemê ji aliyê xuyanê ve li hember Ustad bû û bi daxwaza îdamê dihatin darizandin Ustad dibêje: ‘Meraq nekin birayên min dê ew Nûr bibiriqin.’ Binêr ev gotin çawa pêk hat. Şagirtên wî.” (bnr. Nursî, 2005, r. 308).

1.2.3.6. Salên Dawî yê Nûrsî û Wefata Wî

Di sala 1949ê de êdî telîfa Rîsaleyên Nûr diqede. Dimîne teshîh û belavkirina wan. Telîf diqede lê nivîsandin dewam dike. Nûrsî dixwaze birayê xwe Ebdilmecîd daxilî xizmetê bike lewma jê ra dibêje *Îşaratu'l- İcaz* û *Mesnewîya Nûrîye* yê erebî wergerîne tirkî û *Esayê Mûsa* jî wergerîne erebî. Di wê heyamê de Nûrsî jî tevî ku şagirtên dora wî erebî nizanîbûn dest bi dersdariya van kitêbên xwe yê erebî dike, beşeke wê dersê wekî dursa teqrîrî jî weşandiye (Nursî, 2003a, rr. 86–98).

Têkilîya wî ya bi Partîya Demokrat re heta niha jî mijareke spekulatîf e. Tevî ku xetên sor ên ku Nûrsî di rîsaleyan de bi berdewamî nîşan dide dîyar dîkin ku ev têkilî ne têkilîyeke sîyasî û polîtîkî ye, ya berjewendîyê ye. Wekî murşîdekî, rênişandêriyek e. Û tiştên di nameyan de bo serok û endamên partîyê re gotine di dewra Partîya Gel de, ji wan re jî, berîya wê di dewra Osmanî de jî ji Îttîhadçîyan û Siltanan re gotibûn, heman tişt in û çend mijarên sereke ne, yê wekî: Fikra nijadperestî ne rewa ye û me kurdan û welatîyên din dadibeline û dev ji vê rikê berdin. Karmend bila nebin wek firewnan û xizmeta gel bikin. Dersên dînî û rîsaleyan di dibistanan de bidin xwendin. Medreseya Zehrayê ava bikin. Edelata mehza ya Qur'anê tetbîq bikin û bi sûcê yekî meriv û derdora wî, gund û eşîra wî nabe berpirs û li wan zilmê nekin û hwd.

Meha dawî ya sala 1959ê Nûrsî di nava mehekê de îcabeta vexwendinan dike, çend caran diçe bajarê Stenbol, Ankara, Konya û Ispartayê. Sedema hîlbijartinan e. İsmet İnönü daxuyanîyê dide çapemenîyê dibêje: “Partîya Demokrat ji bo kampanyaya hîlbijartinê Seîdê Nûrsî wezîfedar kiriye.” Li ser vê yekê bi fermana desthilatdariyê 11ê meha yekê ya 1960î nehiştin Nûrsî bikeve Ankarayê, ew paş ve rêkirin Emirdağê. Û bi teblîxeke fermî ew mecbûrî rûniştina Emirdağê kirin.

18ê Adara 1960î Nûrsî giran nexweş e. Telebeyê wî doktor Tahir Barçin tê derzîyan lê dide û serumê didê. Şagirtên wî li ber serê wî nobetê digrin. Roja piştî wê bişev, Bayram Yüksel dibêje, ez û Zübeyir Gündüzalp li ber serê Ustad bûn. Saet li dora didoyê şevê bû. Ustad çavên xwe vekirin got “em ê biçin”. Min got, baş e Ustadê min! Em ê biçin ku? Got, “Urfa-Diyarbakir”. Piştî demeke dîn dîsa got, “Em ê biçin!” Min got, biçin ku Ustadim? Got, “Em ê biçin Urfayê!”. Kekê Zubeyîr got, “Agirê Ustad zede ye, dibe ku ne li hişê xwe xeber dide”. Lê me dî ku Ustad bi berdewamî vî emrê xwe tkrar dike, dibeje “Bila bibe sibe em ê biçin Urfayê!”. Sibehê erebeyê amade dîkin. Qoltixê paş bi destek nivîn radixin. Nûrsî lê radizînin. Hüsnü

Bayramoğlu şifêr e. Bayram Yüksel û Zübeyir Gündüzalp li kêleka wî saet li nehan dikevin rê (Badıllı, 1990, rr. 1721-24).

Nûrsî bi vê helwesta xwe ya vegera welêt, biryara îşkana mecbûrî bînpê dike, dawî li sirgûnîya xwe ya 34 salan tîne. 21ê Adarê digihîje Urfayê. Li Otêla Îpek Palasê bi cî dibe. Umrê wî gihaye 84 salan. Nexweşekî giran e (Zınar, 2022, r. 411). Hê di salên 1950î de li ser vexwendina Urfahîyan Nûrsî sê telebeyên xwe; Ceylan Çalışkan, Abdullah Yeğin, Hüsnü Bayramoğlu û alavên xwe yên xusûsî dişîne Urfayê û dibêje ez ê jî bêm. Nihayet piştî 8-9 salan Nûrsî tê Urfayê. Nûrsîyê ku li sirgûnîyê dema nexweş diket qet dîdarîyê qebûl nedikir, lî vir, digel nexweşîya xwe ya giran hevdtîna tu kesî red nedikir (Badıllı, 1990, r. 1726).

Urfahî dema dibihîsin Bedîuzzeman hatiye Urfayê bi girseyî tên serdana wî. Zübeyir Gündüzalp serdêran dixe dorê. Bayram Yüksel û Hüsnü Bayramoğlu bi destê Nûrsî digrin, gel tê wî ziyaret dike. Nûrsî jî ser û hustuyê yên dihatin ziyaretîya wî maçî dike, bi destê wan digre naxwaze berde. Di wê navê de Bayram û yên din ji ziyaretvanan re dibêjin, “Birayê min, tu biçe da ku yên di dorê de ne bîn”, ew dibêjin, “Ka binere, Ustad naxwaze berde.” Bi vî awayî ev serlêdan roj û nîvekê didomin. Li hêla din, polis tên dibêjin wan, “emrê wezîrê karen hundur e, demildest divê hûn vegerin Ispartayê.” Nûrsî dibêje wan, “Li vê ecêbê! Ez hatime ku li vir bimirim. Belkî bimirim jî. Hûn rewşa min nabînin, min biparêzin. “Polîs dibêjin, “Em emirber in.” Xwedîyê otêlê bertekê nîşanî vê helwesta polîsan dide. Li derve gel bi vê yekê dihesê. Bi mezin û biçûkan radibin ser piyan, dibêjin em mêvanê xwe nadin (Badıllı, 1990, rr. 1735-36).

Wesyeta Nûrsî ya defînkirina wî wiha ye: “Barla’da vefat edersem Barla’nın yukarı mezaristanına, İsparta’da vefat edersem Sava mezaristanı’na götürünüz” (Eger li Barlayê wefat bikim min bibin qebrîstana jorê Barlayê, eger li Ispartayê wefat bikim min bibin qebrîstana Savayê) (Hayrat Vakfı İlmi Araştırma Heyeti, 2013, r. 1149).

Nûrsî dibêje li ku derê bimirim min li wê derê veşêrin, ev yek, a didoyê dibêje “ez hatime ku li vir (Urfa) bimirim”, yanî ne xwestîye li Isparta yan cîyekî din bê veşartin. Ji ber ku gava giran nexweş bû gotibû em biçin Urfa, Diyarbekirê, yek dikare bêje xwestîye li Urfa an Diyarbekirê bê veşartin.

Şeva 22yê Adarê ya berê sibeha 23yê wê (25ê meha Remezana 1379ê⁴) sala 1960î li dora saet 02.00-02.05an Nûrsî rehmî dîke. Şagirtên wî xebere wefata wî bi telgîrafan digihînin çar alîyê welêt. Ji Ispartayê bi navê Ahmed Husrev Altınbaşak jî vê telgîrafê re bersîveke enteresan tê, dixwaze cenazeyê Nûrsî “bi her halî” bînin Ispartayê: “Wefata Hezretê Ustad em gelek zêde mehzûn û xembar kirin. Hemû berhem û heyata Ustadê Ezîz li Isparta borîye. Gelek lazîm e ku qebra şerîf a Ustadê Ezîz jî li Ispartayê be. Cesedê mubarek e Ustadê mubarek jî bi her halî bînin Ispartayê. Ez bi hêşirên çava sersaxî didim we hemûyan û seadetê ebedî dixwazim”.⁵ (Bilgi, 2021).

El-Baqî Huwe'l-Baqî

Husrev

Ev daxwaza A. H. Altınbaşak a neqil kirina cenazeyê Nûrsî bo Ispartayê wê gavê nehatiye cî. Lê piştî cuntaya leşkerî ya 27ê Gulanê bi mehek û nivê yanî 12ê Tîrmeha 1960î bi fermana rayedarên qebra Nûrsî bi balîyozan tê hilweşandin û cenazeyê wî direvînin dibin cîyekî nediyar (Zînar, 2022, r. 411).

1.3. Berhemên Wî

Nivîskarê metnekî nivîskî yan e pirtûkekê, bi giştî derbarê cureyê wê nivîsarê û pirtûkê de pêşagahdarîyekê dide mirov. Agahdarîyêke bingeîn a dîtir jî mirov jî pirtûkê fêr dibe, eger em nivîskarê berhemê nas nekin, agahdarîyên di pêşberg û paşbergê berhemê de yê derbarê cureyê wê de me agahdar dîke (Înce, 1993, r. 91).

⁴ Di *Leme'atê* de dema wefata xwe bi helbestekê wiha destnîşan dîke:

DÛ'AKAR

Ez qebreke hilweşiyayî me ku, kom bûye di navê de

Ji Seîd heftê û neh mirî (**) bi gunehên eleman.

Yê heştêyan bûye, jî qebrê re kêlikek

Tev bi hev re digrîn ji xisarên Îslamê re.

Bi vê gora xwe ya ku bi kêlika min û hemû miriyan dinale

Rêwiyê warê axreta pêşerojê me.

Baweriya min heye ku, li pêşerojê asoyên parzemîna Asyayê

Bi hev re bibin teslîmî destê pak e Îslamê.

Lewre hêla rastê, bereketa îmanê ye

Ewlehiyê, bi selameti dide mirovan.

{** Ji ber ku di her salê de beden du caran xwe nû dîke, tê wê maneyê ku du Seîd mirine.

Hem îsal Seîd di heftê û neh saliya xwe de ye.

Di her salekê de Seîdek miriye ku dê heta vê tarîxê (1379) Seîd bijî (Nûrsî, 2014b, r. 8).

⁵ Pêvek -3: Metin/rismê orjînal e telgîrafê.

Berhemên nivîskî berî her tiştî berên zimên in. Helbet ev tişteki gelekî normal e, lêbelê ku tiştên din tunebin, bi serê xwe ne bereke zimên ne jî tişteki din in. Ji ber vê yekê, hevokên ku wekî yek maneyekê îfade dikin dixuyên, di binyada xwe de dibe ku tiştên din jî dibêjin (İnce, 1993, r. 66). Zimanê berhemên Nûrsî zimanekî çêkirî yê di bin tesîra zimanê kurdî de ye. Lewma di nav berhemên wî de, cî bi cî ne ji zanîna kurdî be têgihîştina hinek mijaran gelekî zehmet e. Mînakên vê yekê di beşa Mantelîteya Kurdî de hatine dayîn.

Kullîyata Nûrsî xwedî şeş hezar kusûr rûpelî ye, li vê derê em ê tenê navê berhemên wî bidin û bi giştî hinekî behsa naveroka wan bikin. Nûrsî di sala 1901ê de bi berhemên kurdî dest bi telîfê kirîye. Du berhemên kurdî nivîsîne. Yek ji wan derbarê ilmê sîmayê de bûye ku behsa xet û xêzên rû û nava destê însên dike, yên ku wekî remz û nîşaneyên çarenûsîyê yên teyîsîna hikmeta Îlahî tên qebûlîkirin. A duyem derbarê hesabê rîyazîyat û matematîkê de bûye.⁶ Tê gotin ku ev herdu berhem jî di şewata qonaxa walîyê Wanê Tahir Paşa de ji dest çûne. Gotareke Nûrsî ya bi sernavê Ey Gelî Kurda⁷ ya bi kurdî jî heye. Ev gotar di rojnameya *Kurd Teavun ve Teraqî* 22yê Teşrînêsanî 1324ê, 11ê Zilqade 1326ê [5ê Berfanbara 1908ê] hêjmar 1, rûpel 7em de hatiye weşandin. Piştî wê, du berhemên erebî yên bi navê *Te'likât 'Ela Burhani'l-Gelenbewî Fî'l-Mentiq*⁸ û *Qizil Îcaz 'Ela Sullemu'l-Munewraq*⁹ê telîf kirîne (Badıllı, 1990, rr. 130–131; Nursi, 1997b, r. 41). Nivîskariya Nûrsî heta 1950yî berdewam kirîye. Li dora 130 perçe berhem dane. Ji van berheman ên heta sala 1926ê nivîsîne bi navlixwekirina wî yên “Eski Saîd” (Seîdê Berê) ne, ev berhem, ji hêla naverokê ve para zehftir meseleyên îmanî (2/3) û têra xwe (1/3) derheqê meseleyên civaka kurdan de ne, cara ewil bi tîpên osmanî di bin sernavê *Asarên Bedîîye* de hatine berhevîkirin û çapîkirin. Dûra bi heman navî bi tîpên latînî jî hatiye çapîkirin. Ji alîyê weşanxaneyên

⁶ “Hz. Ustad, çend caran ji şagirtên li ba xwe ra gotiye ku: Dema ku ez li Wanê bûm û hê bi xweşikî nikarîbûm bi tirkî bi axivim min bi zimanê kurdî du rîsaleyên biçûk nivîsandibûn. Yek jê derheqê Matematîkê û ilmê hesabê de bû. Ya duyem jî derbarê qederê de bû ku di cîyên wekî destê mirov û kefa destê wî de ji alîyê qederê ve hin nîşan û nivîs hene ku qabiliyeta ruhê wî mirovî nîşan dide ka minasibê çi ye.” (Nursi, 1998, r. 229).

⁷ Pêvek-4 Ey Gelî Kurda.

⁸ *Te'likât 'Ela Burhani'l-Gelenbewî Fî'l-Mentiq*: Ev berhema ku wekî *Te'likâtê* tê zanîn bi erebî ye. Nûrsî ew weke *te'liq* û haşîyeyên li ser kitêba *mentiqê* ya bi navê *Burhan* a *Gelenbewî* (1730-1790) nivîsîye. Li gorî Abdulkadir Badıllı berî 1907ê telîf bûye.

⁹ *Qizil Îcaz*: Bi erebî ye. Şerha kitêba *mentiqê* ya bi navê *es-Sulemu'l-Munewraq fî ilmi'l-Mentiq* ya ji alîyê Ebdurrahman Exderî (m. 983/1575–76) ve bi zimanê erebî û bi awayekî menzûm hatiye nivîsîn. Nûrsî sala 1901ê ew telîf kirîye, di sala 1923yê de hatiye neşîrkirin.

curbicur û bi navên cuda jî hatiye çapkirin: Weşanxaneyê Tenvirê - Îctimai Reçeteler (Raçetên Civakî), Weşanxaneyê Zehrayê - Îctimaî Dersler (Dersên Civakî), Weşanxaneyê Soz Basim Yayin - İlk Dönem Eserleri (Berhemên Dewra Pêşî), Weşanxaneyê Yeni Asyayê - Eski Said Dönemi Eserleri (Berhemên Dewra Seîdê Berê). Ên piştî sala 1926ê yê “Yeni Said” (Seîdê Nû) ne.

1.3.1. Li Gorî Nûrsî Rîsaleyên Nûr û Mîsyona Wê

Berî em derbasî danasîna berhemên bibin lazim e ku em pênasekirina Nûrsî ya derbarê berhemên wî de diyar bikin, ji ber ku Nûrsî misyoneke taybet li wan bar dike. Nûrsî, ji aliyê fizîkî ve kulliyata Rîsaleyên Nûr wiha pênase dike:

“Wek tê zanîn; Rîsaleyên Nûr serê peşî ji sih û sê peyvên pêk tê û bi navê *Sözler* (Koma Peyvan) tê binavkirin. Lê Peyva sih û sisêyan ne bi serê xwe ye, ji sih û sê mektûban pêk tê û bi navê *Mektûbat* tê zikirkirin. Piştî mektûba sih û yekê bi xwe jî ne xweser e, ew jî ji sih û yek lem‘ayan pêk tê û bi navê *Lem‘alar* tê naskirin. Piştî lem‘aya sih û yekê jî ne xweser e, bi izna Xwedê ew ê jî ji sih û yek şu‘ayan pêk were” (Nursî, 2005, r. 665).

Çar navên kulliyata rîsaleyên Nûrsî hene: *Sözler*, *Rîsale-î Nûr*, *Resailî’n-Nûr* û *Rîsaletu’n-Nûr*. Bediûzzaman dibêje sedema ku navê *Rîsaletu’n-Nûr* li tevahiya sih û sê Komên Peyvan û Mektûban hatiye kirin ev e: “Di tevahiya jiyana min de peyva Nûrê li her derê li rasta min hatiye. Wek mînak, gundê min Nûrs e, navê rehmetiya dayika min Nuriye ye, ûstadê min ê Neqşî Seyîd Nur Muhammed e, ûstadê min ê Qadirî Nureddîn, seydayê min ê Qur’anê, Nurfî, ji şagirtên min ên bi min re herî eleqedar, kesên navên wan Nur in. Di berhemên min de mînaka ku herî zêde mijaran ronî dike, Nûr e. Di Qur’ana Hekîm de ayeta ku ewilî di hiş û aqilê min de birîqî û fikra min bi xwe re eleqedar kir, ayeta *مَثَلُ نُورِهِ كَمِشْكُوتٍ* bû. Hem di heqîqetên îlahî de yê ku piraniya mişkîleyên min çareser kirine, ji Esmayên Hûsna navê Nûrê nûranî ye. Hem sedemê şewqiyata min a zêde û xizmeta min a bo Qur’anê rêberê min ê taybet zînnureyn e” (Nursî, 2002, r. 148).

“Peyvên hatine nivîsîn ne tesewûr in, tesdîq in. Ne teslîm in, îman in. Ne marîfet in, şehadet in, şuhûd in. Ne teqlîd in, tehqîq in. Ne îltîzam in, îz’an in. Ne tesewûf in, heqîqet in. Ne de‘we ne, bûrhanên di nav de‘weyê de ne” (Nursî, 2002, r. 22). Nûrsî bi vê angaşî radibe; gotinên di rîsaleyan de ne berhemên fikir, raman û

tesewira min in, tesdîq in ango erêkirinên min in. Ne teslîm in, îman in; yanî ji rîtuêlên Îslamê wirdetir heqîqetên îmanî ne. Ne zanîn in, çavdêrî û tiştên hatine muşahedekirin in. Ne teqlîd in, tehqîq in, yanî ji ber fikrên kesî nehatine girtin, heqîqetên Qur'anî ne, bi qebûlkirina wan mirov nabin muqelîd, li gorî îzan û îdraka xwe dibin xwedî dereceyeke îmanê. Ne îltîzam in, îzan in, yanî ew ne eydê aliyekê ne, yê tegihîştinê ne. Ne tesewûf in, heqîqet in; yanî ne hêla mîstîk a Îslamê ne, rastîyên îmanî ne. Û her wiha ne rêçik û de'we ne, delîlên di nav de'weyê de ne. Helbet Nûrsî vê angaştê xwe ji bo wan "peyvên" ku bi awayê îlhamî û sinûhatî hatine hiş û dilê wî dibêje.

1.3.2. Berhemên Seîdê Berê

- **İki Mekteb-i Musibetin Şehâdetnâmesi veyahut Divân-ı Harb-i Örfî:** Ev berhema dunavî xwedî gelek taybetmendîyan e. Çawa ji navê wê jî diyar e Nûrsî ew wekî destûrnameyekê bi nav kirîye, destûrnameya du mûsîbetên ku yek ji wan tîmarxane ya din hepisxane ye. Û navê wê yê din *Dîwana Herba Urî* ye. Nûrsî di sala 1907ê de diçe Stenbolê da ku li çend cîyan dibîstanan bide vekirin, wî dixin tîmarxanê û hepisxaneyê. Piştî wî, xwe di nav bûyera 31ê Adarê (13 Nîsan 1909) de û li pêşberî Dîwana Herbê dibîne. Ev berhem, ji parêznameya Nûrsî ya Dîwana Herbê û hin gotarên wî pêk tê ku yê di wê navê de di kovar û rojnameyan de weşiyabûn. Berhem di sala 1909ê de hatiye nivîsîn û di sala 1911ê de hatiye çapkirin.
- **Xutbeya Şamiye:** Nûrsî di 35 salîya xwe de, di sala 1911ê de gava çûye Şamê li ser daxwaza alimên wê derê li mizgefta Emewî ya Şamê bi erebî ev berhem xwendîye. Wê demê ji ber giringîya wê di hefteyekê de ev berhem bi erebî du caran hatiye çapkirin. Berhem bi giştî behsa problemên cihana Îslamê û çareserîya wan dike.
- **Dewau'l-Ye's:** Nûrsî di vê berhemê de sedemên maddî û manewî yê li paşmayîna misilmanan û bi pêşketina xirîstîyanan şirove dike û mizgînîya ku dê li dahatuyê ev yek biguhere dide. Berhem di sala 1911ê de hatiye nivîsîn û çapkirin.
- **Munazerat (Recetetu'l-Awam/Reçetetu'l-Ekrad):** Ev berhema ku Nûrsî wê wekî reçeteya kurdan bi nav dike, ji diyalogên wî yê wekî pîrs û bersivan ên bi eşîrên kurdan re yê piştî îlankirina Meşrûtiyeta Duyem kirine pêk tê. Gelek mijarên wekî hurrîyet, meşrûtiyet, zordarî, rewşa alim, axa û şêxan,

mafên kêmarên nemislîman, têkiliya kurdên misilman û ermenên mesîhî, meseleya perwerdehiya kurdan, paşdemayîna wan û xweîdarekirina kurdan di hundirîne. Ev berhem bi erebî jî hatiye çapkirin. Berhem di sala 1911ê de hatiye nivîsîn û çapkirin.

- **Muhakemat** (Sayqalu'l-Îslamiyet): Nûrsî ev berhem wekî destpêka tefsîra *Îşaratu'l-Î'cazê* nivîsiye. Heman berhem, bi navê *Recetetu'l-Ulema* an *Recetetu'l-Xevas* (Receteya alîman) e. Ji sê gotarên bi navê *Unsûru'l-Heqîqat*, *Unsûru'l-Belaxat* û *Unsûru'l-Eqîde* pêk tê. Di van gotaran de bi giştî behsa tewhîd, nubuwet û axiretê tê kirin. Ev berhem di sala 1911ê de hatiye nivîsîn û bi erebî û tirkî hatiye çapkirin.
- **Nutuq:** Ev berhem jî gotarên Nûrsî yên di destpêka Meşrûtiyeta Duyem de hatine nivîsîn pêk tê. Derbarê azadî, wekhevî, edalet û zordariyê de ne. Di sala 1908 û 1909ê de hatine nivîsîn, di sala 1912ê de hatiye çapkirin.
- **Îşaratu'l-Î'caz Fî Mazanni'l-Îcaz:** Nîşeyên bingeîn ên vê berhemê bi kurdî ne¹⁰ lê dûra ev berhem bi erebî hatiye nivîsîn û çapkirin. Nûrsî tefsîra sûreya Fatîhayê û 33 ayetên sûreya Beqereyê kiriye. Li gorî siyaq û sîbaqa peyvên ayet şîrove kirine. Bi vî awayî xwestiye î'caza Qur'anê nîşan bide. Bi kurtasî li ser behsên wekî uluhiyet, nubûwet û axretê sekinîye. Di dema Şerê Cîhanê yê wil de gava qumandarê yekîneya milîsên xwebexş bû û li hemberî Rûsan şer dikir telif kiriye. Di navbera sala 1914 û 1916ê de hatiye nivîsîn û di sala 1918ê de hatiye çapkirin.¹¹ Berhem hê Nûrsî li heyatê bû ji aliyê birayê wî Abdulmecîd Ünlükul ve li tirkî hatiye wergerandin. Her wiha Nûrsî şandiye ba Mela Sedreddîn Yûksel jî tehqîqa wê kiriye û hê Nûrsî berheyat bû ji aliyê Şêx Tahîrê Şoşîyê kurdê başûr ve jî hatiye îstînsaxkirin û tehqîqa wê hatiye kirin ku ev yek, him belavbûna berhemê him jî pêwendîya alimên kurdan nîşan dide (Nursî, 2015, rr. 55–56).

¹⁰ Feqîyê Bediüzzeman Hemzayê Muksî wiha salox dide: “Hezretê Ustad berî ku tefsîrê telif bike ez di heleqeya darsa wî de bûm. Radihişt Kêlamê Qedîm dixwend û bi kurdî dida nivîsandin, qet li kitêbê an jî li tefsîrê nedinihêrt. Ji hevalên me yekî bi navê Mele Hebib Efendî bi kurdî nîşe werdigirtin. Tê de gelek neçû herba umûmî dest pê kir (Badîllî, 1990, r. 302).

¹¹ Mîna keke pêwendîya Kurdên li Stenbolê jî çapa vê kitêbê ye. Piştî çapê, Kovara Jînê di hejmara xwe ya 16ê Kanûna Dawî 1334/29ê Çileyê 1919ê de bi pesindanê reklam û agahdariya kitêbê dike: “Tefsîra şerîf a bi navê *Îşaratu'l-Î'caz* ku ji telifatên cenabê Bediüzzeman Seîdê Kurdî yê yek ji alimên navdar ê Kurdistanê û ji endamên hêja yên Daru'l-Hikmetu'l-Îslamiyeyê ye, çap bûye û bo belavkirinê di pirtûkxaneyê Şerefê de tê firotin. Em wek peywîr dibînin ku li pêgîr û ehlê ilîm re kîrîna wê tewsiye bikin.” (Nursî, 2023, r. 9).

- ***Nuqtatun min Nurî Marîfeti'llah*** (Nokta): Berhem behsa çar delîlên tewhîdê dike ku Hezretê Muhemmed, kaînat, Qur'an û wijdan in. Di sala 1919ê de hatiye nivîsîn û çapkirin.
- ***Sunûhat***: Ev rîsale ji mijarên wekî emelê salih, millîyeta menfî û musbet, rizîq, şehadet, edaleta mehz û edeleta îzafî, seltenet û xîlafet, medenîyeta Îslamê, siyaseta û Heccê dike. Di sala 1920î de hatiye nivîsîn û çapkirin.
- ***Hutuvata Sitte***: Ev berhem di sala 1920î de gava Stembol ji alîyê ingilîzan ve hatibû îşxalkirin hatiye nivîsîn. Bersiva propoxandaya li hemberî misilmanan dide. Di sala 1920î de hatiye nivîsîn û çapkirin.
- ***Lemaât***: Berhemeke li ser nezma destana *Şerê Newala Sîsebanê* hatiye nivîsîn. Kurteyê Rîsaleyên Nûr e. Di sala 1921ê de di meha Remezanê de hatiye nivîsîn û di heman salê de hatiye çapkirin.
- ***Şuaat***: Berhem, ji alîyekî ve behsa delîlên pêxembertîya Hz. Muhemmed dike û ji alîyê din ve behsa delîlbûna Hz. Muhemmed a wekî delîla tewhîdê ye dike. Di sala 1921ê de hatiye nivîsîn û çapkirin.
- ***Rumûz***: Berhem, derbarê î'caza Qur'anê, ittîhada Îslamê û çima kafîr li misilmanan serdest in dike. Di sala 1921ê de hatiye nivîsîn û çapkirin.
- ***Tuluat***: Berhem ji mijarên wekî îxtîlafa navbera alimên misilmanan, siyaseta ingilîzan, rewşa Daru'l-Hikmeti'l-Îslamîyeyê, dahurîna hedîsan û temasula ezraîl pêk tê. Di sala 1921ê de hatiye nivîsîn û çapkirin.
- ***Qatre, Zeylu'l-Qatre***: Berhem bi erebî ye. Îzaha mijarên wekî niyet, nezer, maneya herfî, maneya ismî, nexweşîyên nefsê û maneya Laîlaheîlallah dike. Ji alîyê birayê Nûrsî, Abdulmecîd Ünlükul ve li tirkî hatiye wergerandin û di *Mesnewîya Nûrîye* de hatiye cîdan. Di sala 1922ê de hatiye nivîsîn û çapkirin.
- ***Habbe, Zeyla Habbeyê***: Berhem bi erebî ye. Derbarê şexsîyeta Hz. Pêxember a nûranî, mahîyeta însan, meseleyên îmanî û bersiva fikra tebîetperestîyê de ye. Ji alîyê birayê Nûrsî Abdulmecid Ünlükul ve li tirkî hatiye wergerandin û di *Mesnewîya Nûrîye* de hatiye cîdan. Di sala 1922ê de hatiye nivîsîn û çapkirin.
- ***Zerre***: Berhem bi erebî ye. Ji tewsîyeyên exlaq û hikmetê pêk tê yên wesweseya nefis û Şeytan îzale dikan. Ji alîyê birayê Nûrsî, Abdulmecid

Ünlükul ve li tirkî hatiye wergerandin û di *Mesnewîya Nuriye* de hatiye bicihkirin. Di sala 1922ê de hatiye nivîsîn û çapkirin.

- **Şemme:** Berhem bi erebî ye. Derbarê mahîyeta “ene” û teyîsîna nav û sîfatên Xwedê de ne yên ku hebûna wî îsbat dîkin. Ji aliyê birayê Nûrsî Abdulmecid Ünlükul ve li tirkî hatiye wergerandin û di *Mesnewîya Nûrîye* de hatiye cîdan. Di sala 1922ê de hatiye nivîsîn û çapkirin.
- **Zehre, Zehrenin Zeyli:** Derbarê mahîyeta însan, mahîyeta vejîna li heşrê, fanîbûna dinyayê, fen û medenîyeta Ewropa û qîmeta îmanê de ye. Ji aliyê birayê Nûrsî, Abdulmecid Ünlükul ve li tirkî hatiye wergerandin û di *Mesnevîya Nûrîye* de hatiye bicihkirin. Di sala 1923yê de hatiye nivîsîn û çapkirin.
- **Hubab, Zeyla Hubabê:** Berhem bi erebî ye. Mijarên wekî hêsanîya îsbatkirina meseleyên îmanî û zehmetîya di kufur û înkare de, raza mezin a di duayan de, şirka veşarî, feydeya zikirkirinê, îctîhad û şertên wê, cihêtiya di navbera medenîyeta mumînan û medenîyeta kafiran û hwd. di hundurîne. Ji aliyê birayê Nûrsî, Abdulmecid Ünlükul ve li tirkî hatiye wergerandin û di *Mesnevîya Nûrîye* de hatiye cîdan. Di sala 1923yê de hatiye nivîsîn û çapkirin.

1.3.3. Berhemên Seîdê Nû

- **Sözler:** Ev risale berhema bîngehîn a kullîyata Rîsaleyên Nûr e. Berhemên din temamkerên wê ne. Ji 33 peyvên pêk tê. Gelek mijarên cur bi cur ên wekî bismîllah, nimêj, îmana bi Xwedê, îbadet, heşir, rubûbîyeta Xwedayê Teala, mucîzeta Qur'anê, delîlên pêxembertîya Hz. Muhemmed, tewhîd, îctîhad, delîlên îsbatkirina melaîketan, mahîyeta “ene”ya di fitreta însan de û hikmeta tevgera zerreyê ku bûnewer bi wê hatine wucûdê, bi delîlên eqilî û neqlî îzaha mucîzeyê mîracê pêk tê. Nûrsî gava li Barlaya Ispartayê li sirgûnê bû di navbera sala 1926 û 1933yê de nivîsîye.
- **Mektûbat:** Ev berhem ji 33 mektûban pêk tê. Para zehf bersivên pirsên derbarê meseleyên dînî yên telebeyê Nûrsî de ne ku Hulusî Yahyagil û hin telebeyên wî yên din kirine. Digel vê, mijareke bi navê “Mu‘cizata Ehmedîye” ya ku ji sêsedî zêdetir behsa mu‘cîzeyên Hz. Pêxember dike di hundurîne. Wisa hatiye destnîşankirin ku ji van 33 mektûban mektûba

çardehem û ya bîst û pêncem nehatine nivîsîn. Mektûba bîst û heftem lahîqayên bi navê *Barla*, *Emirdağ* û *Kastamonu* ne. Mektûba sîhem *Îşaratu'l-Î'caz* e. Mektûba sî û yekem *Lemalar* e. Mektûba sî û duyem *Lemaat* e. Berhem li Barlayê di navbera sala 1929 û 1934ê de hatiye nivîsîn.

- **Lem'alar:** Ev berhem ji 33 “Lem'ayan” pêk tê. Mijarên wekî qiseta Hz. Yûnus, qiseta Hz. Eyyûb, meseleya îmamet û xîlafetê ya navbera Ehlê Sunetê û Şîayê, wahdeta vucûdê, giringîya sunneta senîyeyê, hîkmeta xuliqandîna şeytan û xirabîyê, Seda Zulqirneyn û Yecûc û Mecûc, giringîya îqtîsadê û qenaetê, îxlas, tesettur, dilxweşkirina nexweşan, hurmeta îxtîyaran, nizûla hesin, îsmê ezem û munacatê îhtîwa dike. Wisa hatiye destnîşankirin ku lemaya pêncem û ya şeşem nehatine telîfkirin. Lem'aya heştem derbarê kerametê Xewsê Ezem Ebdulqadirê Geylanî yê derbarê *Hizbu'l-Qur'anê* de ye, di mecmuaya *Sikkeya Tesdîqa Xeybî* de hatiye neşîrkirin. Lem'aya pazdehem *Rîsaleya Fîhrîstê* ye. Lem'aya hijdehem derbarê hinek keramatên Hz. Elî yê derheqê dahatuyê de ne, di mecmuaya *Sikkeya Tesdîqa Xeybî* de hatiye neşîrkirin. Lem'aya bîst û heftem mudefeayên mehkemeya Eskişehîrê ye û tevî parêznameyên dîn bi navê *Mudafaalarê* wekî pirtûk hatiye neşîrkirin. Lem'aya sî û yekem şûaya çardehem e di mecmuaya *Şualarê* de hatiye neşîrkirin. Lem'aya sî û duyem rîsaleya *Lemaatê* ye, di dawîya mecmuaya *Sözlerê* de hatiye neşîrkirin. Lem'aya sî û sêyem ji *Qetre*, *Habbe*, *Şemme*, *Zerre*, *Hubab*, *Zuhhre*, *Şule* û ji zeylên wan pêk tê, di *Mesnewîya Nûrîye de hatine neşîrkirin*. Berhem li Barlayê di navbera sala 1929 û 1934ê de hatiye telîfkirin.
- **Şualar:** Berhem ji pazdeh “Şûa'yan” pêk tê. Mijarên wekî tewhîd, wehdanîyet, yekbûn û hebûna Xwedayê Teala û teyîsîna nav û sîfatên wî li gerdûnê, tefsîra ayeta “*hesbunellahû wenîmelwekîl*”ê, şîroveya duaya *et-Tehîyatû*, tefsîra ayeta çîl û çarem a Sûreya Israyê ku bi navê “Ayetên Mezintirîn” e, bawerîya heşîr û axretê, dubareyên di Qur'anê de, hadîseyên dê di axirzeman de biqewimin û behsa Mêhdî, Sufyan, Deccal, Yecûc-Mecûc û Dabetu'l-erz, sî û sê ayetên Qur'anê yê ku li gorî Nûrsî bi hesabê cîfir û ebcede li Rîsaleyên Nûr dinêrin û bi vî awayî mucîzebûna Qur'anê dipeyîtîne îhtîwa dike.

- ***Asaya Mûsa:*** Berhemeke ji berhemên din ên Nûrsî ye ku hatiye berhevkirin. Ji du qisman pêk tê. Mijarên wekî îman, îbadet, axîret, nav û sîfatên Xwedayê Teala û ji hinek nesîhetên Nûrsî pêk tê.
- ***Muwazeneyên Îman û Kufrê:*** Berhemeke ji berhemên din ên Nûrsî ye ku hatiye berhevkirin. Mijarên wekî îman û kufrê di hundurê.
- ***Sîkkeya Tesdîqa Xeybê:*** Berhem ji *Şualarê* şuaya yekem û ya heştem, ji *Lemalarê* lemaya heştem û ji hinek nameyan hatiye berhevkirin. Di vê berhemê de Nûrsî cî daye gelek behsên cîfîr û ebcedê.
- ***Lahîqeya Barlayê:*** Berhem ji nameyên Nûrsî û yên şagirtên wî yên ku ji hev re şandine pêk tê ku wê gavê Nûrsî li Barlayê di navbera sala 1926 û 1935ê de li îskana mecbûrî bû.
- ***Lahîqeya Kastamonuyê:*** Berhem ji nameyên Nûrsî û yên şagirtên wî pêk tê. Ew name di navbera sala 1936 û 1943yê de ji ketina Nûrsî ya hepsa Denizliyê heta derketina wî ya ji hepsa Kastamonuyê ne.
- ***Lahîqeya Emîrdaxê:*** Berhem ji du beşan pêk tê. Di beşa ewil de nameyên şagirtên Nûrsî û bersivên wî yên van nameyan tê de cî digirin ên ji sala 1944ê piştî Nûrsî ji hepisxaneyê Denizliyê tehlîye bûye hetanî mahkemeya Afyonê. Di beşa duyem de nameyên Nûrsî yên ji şagirtên xwe re nivîsîye û hinek parastinên wî yên mahkemeyan cî digirin ên ku di navbera sala 1948 û 1953yê de pêk hatine¹² (Beki, 1999, rr. 20-22).

¹² Ji bo kronolojîya nivîsîn û çapkirina berheman bnr. (Badıllı, 1990, rr. 350–354, 460–464, 737–749).

BEŞA DUYEM

2. NAVDEQÎTÎ DI NAVBERA BERHEMÊN EDEBIYATA KURDÎ YÊN KLASÎK Û BERHEMÊN SEÎDÊ NÛRSÎ DE

2.1. Navdeqîtî

Navdeqîtî (*intertextuality*) ya ku mirov dikare wê bi kurtebêjî wekî têkilî û danûsitandina navbera du yan zêdetir deqan pênase bike, wekî têgih cara ewil ji aliyê Julia Kristeva ve hatiye bikaranîn û di dawîya salên 1960î de li qada edebiyata nivîskî cihê xwe girtiye. Ev têgih bi giştî dikare wekî çalakîyeke ji nû ve nivîsînê (*réécriture*) jî bê fêmkirin (Aktulum, 2000, r. 17).

Diyardeya navdeqîtiyê di serdema postmodern de derketiye holê, herçiqas xwedî û danerê wê Kristeva be jî, bingeha wê pêştir hatiye danîn. Navdeqîtî çi nû çi kevin be taybetmendîyeke hemû metnên nivîskî ye. Li gorî Kristeva û teorîsyenên din di rastîya xwe de her deq, deqeke navdeqîtiyê ye; her deqa ku nû tê nivîsîn ji perçe û parîyên deqên berî xwe ku hatine nivîsîn tê wucûdê. Krîsteva ev fikra xwe ji teorîya Baxtîn a gotûbêjkarîyê (*söyleşimcilik, dialogism*) wergirtiye (Aktulum, 2002, r. 284). Ev diyardeya navdeqîtiyê tenê ne taybetmendîyeke serdema postmodern e; her wiha çawa di metnên kevin ên nivîskarên wekî Rabelais û Montaigne yên serdema klasîk û kesên wekî Lautréamont, Proust û Joyce ên serdema modern de jî tê dîtin. A ku nû ye, wekî ku Laurent dibêje ev diyarde di vê serdema postmodern de di biwara rexnedariya nivîskî de hê nû hatiye naskirin û binavkirin (Aktulum, 2002, r. 11). Wekî mînak, T. S. Eliot bi gotara xwe ya *Tradition and Individual Talent* (Kevneşopî û Şair) de destnîşan dike ku divê nasnameya nivîskar ne bi taybetmendiyên wî yê şexsî, bi aliyê wî yê sûdwergirtinê yê ku taybetmendiyên pêşiyên wî ne bê naskirin. Ji xwe wesf yek ji bingeîn hizra navdeqîtiyê ye. Dîsa li gorî Baxtîn gotar an jî metin divê di çarçoveya raborîya xwe ya dîrokî, civakî, çandî û dewrûberên xwe de bê nirxandin, lewra deq digel deqên berî xwe peywendîdar e. Ronald Barthes jî di xebata xwe ya bi navê *Le degré zéro de l'écriture* (Dereceya nivîsînê asta sifirê) de diyar dike ku nivîs ji aliyê ruxsar, ziman û naverokê ve girêdayî tradisyoneke diyarkirî ya di bin fişara dîrok û nêrîtê de ye. Viktor Şklovskîyê formalîstê Rûs dibêje ku berhemeke edebî di nav tevahî û hevgirtina berhemên din de dikare bê têgihîştin (Ergün, 2017, rr. 166–67). Divê bê zanîn ku pergala formalîstîyê ne wekî encama “pergala rêbazeke taybet” derketiye holê, bereksê wê bi têkoşîna serbixwekirina zanîsta edebîyatê û şenberîya

wê afirîye. Ji bo formalîstan a giring wekî mijar lêpirsîna edebîyatê ye (Eichenbaum, 1994, r. 5).

2.1.1. Rêbazên Navdeqîtiyê

Diyardeya navdeqîtiyê ya ku postmodernîst wê bi zanîn ji bo pirdengî û têkilîya navbera berhem û xwîner bi kar tînin, xwedî gelek rê û rêbazan e. Gelek kesan di xebatên xwe de cî dane nav û nîşanên rêbazên navdeqîtiyê. Genette yek ji wan vekoleran e. Genette di xebata xwe ya bi navê *Palimpsest: Literature in Second Degree* de navdeqîtiyê digel *paratextuality* (deqa arîkar), *metatextuality* (raserdeqî), *architextuality* (jordeqî) û *hypertextuality* (deqa navendî) şeweyeke “*transtextuality*”yê nîşan dide. Nathalie Piegay-Gros navdeqîtiyê li ser sê beşan dabeş dike. Di bin sernavê “Peywendîya Pevrebûna Hevbeş” de cî dide jêgirtin (*citation*), amajedan (*réfêrence*), dizî (*plagiat*) û telmîhê (*alusion*). Di bin sernavê “Peywendîyên Dariştinî” de cî dide parodî (*parodie*), û pastîşê (*pastiche*). Di bin sernavê “Wateyên Navdeqîtiyê” de cî dide behsa afirandina kesayetan (karakterîzasyon), cî, bîr, mît û dîrokê (Ergün, 2017, rr. 170–171).

Aktulum di xebata xwe ya bi navê *Mettinleraras İlişkiler* de beşek ji vê mijarê re veqetandîye. Aktulum bi vê hevoka Genette dest bi mijarê dike, “Têkilîya mişterek a di navbera dido yan zêdetir metnan de, yanî, li gorî teşeyê û zehfê caran, bi awayekî şênber hebûna metnek di nav metnekî din de” û didomîne, ku em li gorî vê pênaseyê biçin em dikarin du cure navdeqîtiyê destnîşan bikin. Têkilîya di navbera dido yan zêdetir metnan de saz dibe ku ji “têkilîya mişterek a hevbeş” pêk tê; û ya ku ji “têkilîyên dariştinî” pêk tên. Rêbazên cihêwaz ên navdeqîtiyê dikarin wekî yên ‘eşkere’ û ‘veşarî’ li ser du şeklan bîn dabeşkirin. Di metnekî de nîşandana çavkanîyan dikare bi nav û nîşan bê kirin anku navê nivîskar an navê berhema wî bê diyarkirin û qismên hatine wergirtin di nav dunikê de an bi îtalîkî bîn nîşandan ku ev dibe rêbaza navdeqîtiya eşkere; dîsa di metnekê de bêtî nîşandana çavkanî, şop û rêçan dikare wergirtin bê kirin, ev yek jî dibe rêbaza navdeqîtiyê ya veşarî. Di vê rewşê de tesbîtkirina hêmanên navdeqîtiyê dikeve ser milê xwîner. Aktulum têkilîya navdeqîtiyê di sê kategorîyan de dabeş dike: di kategorîya ewil de di bin sernavê “Têkilîya Mişterek a Hevbeş” de cî dide jêgirtin û referansê (*citation – rréfêrence*), jêgirtina veşarî (*plagiat*) û telmîhê (*allusion*). Di kategorîya duyem de di bin sernavê “Têkilîyên Dariştinî” de cî dide parodîyê (*parodi*), veguherîna tinazker (*le*

travestissement burlesque) û çavlêkirinê (*pastîş*). Di kategoriya sêyem de jî di bin sernavê “Îmajên Navdeqîtîyê” de cî dide *palimpsest*, kolaj-brîkoloj û jinûve nivîsînê (2000, rr. 93–164).

Nûrsî, çend îstîsna ne tê de hema bêje di hemû jêwergirtinên xwe de awayê navdeqîtîyê ya veşarî bi kar anîye. Wî ev yek, çî di warê berhemên nivîskî yan ên dermetnî de be çî di warê çanda kurdî de be, çî di warê çavkanîyên pîroz de be heman rêbaz bi kar anîye ku gelek hevokên wî bîrên vekolan dê mefhûmê ayetek, hedîsek an gotineke kurdan bê dîtin. Gava Nûrsî dibêje, “Ê ku bi meraqa ka di vê pevçûna herbê de çî diqewime taqîb dike, di dilê xwe de dibe alîgirê hêlekê. Zilma wî rewa dibîne, dibe şîrîkê zilma wî.” (2004b, r. 24). Tê dîtin ku ev hevok mefhûmê ayeta “وَلَا تَرْكَبُوا”¹³ (Nebî hûn mēyla zaliman bikin; nexwe hûn ê jî di agirê wan de bişewitin.). Gava guhê xwe didî gotina Nûrsî ya, “Yalan, bir lafz-ı kafirdir.” (Derew gotineke kafir e) (2003c, r. 754). Gotina kurdan a ku dibêjin “Derew dijmînê Xwedê ne” tîne bîra mirov û hwd. Herwiha Nûrsî, rêbaza navdeqîtîyê di biwara dermetnî de jî bi kar anîye. Wekî derbûmeseleyên kurdî, destanên kurdî û îdyomên kurdî ku mînakên wan di vê xebatê de cîyê xwe girtine.

2.2. Navdeqîtî di Navbera Dîwana Mela Ehmedê Cizîrî û Berhemên Nûrsî de

Mela Ehmedê Cizîrî (1567-1640) ji Cizîra Botan e. Navê bavê wî Şêx Mihemed e. Danêrê edebîyata klasîk a kurdîya kurmançî tê hesibandin. Avakerê tesewufa kurdîya kurmançî ya milê wehdeta wucûdê ye. Hevdayê Hafîzê Şîrazî, Îbn Farîz û Fedalî (Fuzûlî) ye. Yekem kesê kurdî e ku xwedî dîwaneke murettib a bi kurdîya kurmançî ye. Di *Dîwana* wî de hemû kêşên arûzê hene. Digel melatî û seydatîyê bi tesewuf û helbestê re jî mijûl bûye. Niha dîwaneke wî di dest de heye. Ev dîwan gelek caran hatiye rûnûskirin, şerhkirin, çapkirin û wergerandin. Gelek xebatên zanistî li ser hatine kirin û bûye mijara gotar û tezên akedemîk (Adak û yd., 2017, rr. 171–99).

Kurd pîrozîyekê didin helbestên Mela, dibe ku hertim li medreseyan bi destê feqî û melayan dîtibin lewma. Helbestên wî digel ku hişk in, bi mecaz, sembol û teşbîh in jî ne tenê li ser destê alim û zaneyan li ser devê xelkê jî bûne.

¹³ Bnr. Sûreta Hûd: 113.

Tê gotin ku dema Nûrsî li Wanê dursa feqîyan dida piştî ders diqedîya îcarê *Dîwana* Mela dixwend û şerh dikir. Rojekê gava hatiye ser malikekê sekinîye û şirove nekiriye. Feqîyan gotiye, “Seyda qey tu jî vê muemmayê nizanî? Ev çi muamma ye?” Nûrsî gotiye: “Vê muammayê dizanit sed melayên wek Seîd” lê piştî wî gotiye însaallah ez ê sibê ji we re vê sirra Mela bêjim. Îcar wê şevê Mela hatiye xewna wî jê re gotiye, “Mele Seîd tu bidî xatirê Xwedê sirra min eşkere nekî!” wî jî eşkere nekiriye (Ertekin, 2018).

Li vê derê, da ku rêbaza navdeqîtîyê baştir bê dîtin em ê orjîнала metnên berhemên Nûrsî yên bi tirkî bidin û di nav kevanê de wergera wan a kurdî binivîsin.

Nûrsî hê dema di *Rojnameya Volkanê* de dinivîsî di gotareke xwe ya tirkî ya bi navê “Hakikat” de cî daye beyteke Mela, dibêje: “Sırr-ı vahdet ji ezel girtiye hetta ta [bi] ebed.” (Kurdî, 1909, rr. 337–38). Mela bi vî awayî cî daye vê beyta li jor:

“Sırrê *wehdet* ji ezel girtiye hetta bi ebed

Wahid û *ferd* e bi zatê xwe wî nînin çu ‘eded

Di qîdem da ezel û ‘eynê ebed herdu yek in

Sermediyyet we dixwazit ne ezel bit ne ebed.” (el-Cezerî d.n., r. 46).

Nûrsî ji vê beyta Mela mulhem di berhemeke xwe ya ku şûn de nivîsîye jî wiha dibêje:

“Şu imdad-ı *vahidiyet* ve yüs-ü *vahdet* ve tecelli-i *ehadiyet* sırrıyladır ki, bütün mevcudat bir tek Sâni‘a verildiği vakit, o bütün mevcudat bir tek mevcut gibi kolay ve suhuletli olur.” (Bi raza vê mededa *wahidîyetê* û *hêsanîya wehdetê* û *tecellîya ehedîyetê* ye ku gava afirandina hemû mewcûdatan bi alîyê yek Sani‘ekî ve bê dayîn, ew mewcûdat wekî yek mewcûdatekî rihet û hêsan dibe) (Bediüzzaman Said Nursî, 2004d, r. 285).

Li hêla din, rexneyeke Nûrsî ji şairekî re heye, di çend beytên Mela de tê dîtin ku ihtîmala muxatebê wê rexneyê Cizîrî û yên wekî wî bin tê fêmkirin:

1. Mela gotiye:

“Ne ku şermende ji rûyê te biwa!

Afîtabî bi zewalê çi xerez?” (2006, r. 436).

“Nazika min ku mest î, di çemen hatî xiram

Ji hesed çûne xusûfê meh, mihre di felek” (2006, r. 508).

“Di istiwaê, ku ji husna te veda lami’ekî

Nezerul şemsî mînel şerqî îlel xerbî delek” (2006, r. 512).

Di meseleya şermkirina rojê de ya ji mehbûbê Nûrsî navê Melayê Cizîrî nade, lê ew hersê malikên Mela dihêlin ku ew bi ber rexneyên Nûrsî bikeve. Ji bîranînên derbarê Nûrsî de tê zanîn ku ew ji *Dîwana* Mela baş haydar e (Badıllı, 1990, rr. 557–58). Carinan ders jê daye şagirtên xwe, carinan jî jê tefe‘ul kiriye. Li alîyê din Abdulkadir Badıllı (Yılmaz, 2020) dibêje yê ku Nûrsî behsa wî dike Fizulîyê Bexdadî ye û vê beyta wî wekî mînak nîşan dide:

“Güneş mahcuptur, şem-i ruhundan yandırır çarkı,

Çıkarmak ister anı şule-i ahım hicabından”.

(Roj fedîkar e ji ronîya ruhê wê dişewitîne çerxê,

Pêta arê axînê min divê wê derxe ji wê perdê.)

1. Nûrsî dibêje:

“Halbuki aşk, mahbubuna hasr-ı nazar edip, her şeyi mahbubuna feda eder; yahut, mahbubunu i‘lâ ve sena etmek için başkalarını tenzîl ve manen zemmeder ve hürmetlerini kırar. Meselâ, biri demiş: “Güneş mahbubumun hüsnünü görüp utanıyor; görmemek için, bulut perdesini başına çekiyor.” Hey âşık efendi! Ne hakkın var, sekiz ism-i âzamın bir sahife-i nuranîsi olan güneşi böyle utandırıyor?” (Halkuwe eşq, tenê evindara xwe dibîne û her tiştî fedayê wê dike; an jî, ji bo ku pesnê mehbûba xwe bide û wê mezin bike, yên din kêr dike û manen zemma wan dike û qedrê wan dadixîne. Mesela, yekê gotiye: “Roj delalîya mehbûba min dibîne jê şerm dike, ji bo ku nebîne xwe di pişt ewran de vedişêre.” Hey aşîq efendîyo! Çi heqê te heye, roja ku rûpeleke nûranî ya ji heşt ismê ezem e wisa didî şermê?) (Said Nursî, 2004e, r. 40).

Tahsîn Îbrahîm Doskî di kovara Nûbiharê ya sala 2024ê, hejmara 168em, rûpela 27em de bi sernavê Mûnacata Bedîuzzeman ev helbesta Nûrsî ya farisî parve kirîye:

”يَا رَبُّ هَرِّ حَىٰ بِتَمَاشَاگِه صُنْعُ تُو زِهَرَجَائِ بَتَّازِي زِنْشِيْبُ اَزْ فِرَازِي مَانَنْدِ دَلَالَانْ بِنْدَاءِ بِاَوَازِي

(Her kes li temaşagehê sun'ê tû îlahî! / Teşbihê dellalan e bi nîdaî bi awazî). Doskî dibêje, Nûrsî ev munacat wekî nezîre li ber vê helbesta Cizîrî ya bi sernavê “Remzên te di canan, ne bi endaze dirazin” çekiriye (2024):

2. Mela gotiye:

Remzên te di canan, ne bi endaze dirazin
Her yek bi hezar rengî, rewanê me dixazin

Wan derbe li canê me, wekî berq û birûskan
Tîrê te, di canan, ne tenê sîne gudazin

Cana ji cefaya te û zulmê çi xebêrdin
Ku tîrê ji cewra te, di dîl da, me bi gaz in

Perwane û bulbul, bi dilê şu'leyê eşqê
Lê ger tu nezer dê, bixwe ew gulşen û raz in

Peyweste di weslê, lew dimînin ku seraser
Bişkoj û tilism û wereq û netrîk û bazin

Subbûhî û quddûsî û horên di bihiştê
Peyweste şebê Qedrê liqaya te dixwazin

Sunbul bi sema tîr û gulan perde dirandin
Bişkiftine al al, û hêşin bûne terazin

Cobar direwan in, çemenan terhê cuwan in
Mestane bi ref ref, li kenaran sî û qaz in

Her yek bi temaşagehê husna te ji her ca
Teşbihê nîgaran bi cemala te dinazin

Tîran li me dit, dostê me tê sîne hedef kir
Nazan li me kit, yarê me zarî û niyaz in

Mihrabê du ebrû, ku ji bala ve xuya bin
Der secdegehê eşqê, niyazê me nemaz in

Ger husn û mehebbet, bi sera perde ê can
Geh şah û gede geh bixweh Mehmûd û Eyaz in

Ev horî û perî, çehre pût û latê cemalê
Der sûretê tehqîq, Mela eynê mecaz in (Cizîrî, 2006, rr. 557–562).

Nûrsî hestên xwe wiha tîne zimên, “Demekê di wextê esîrtîya min de li serê çiyê gava min li sûretên biheybet ên darên qaj, qetran û hêvrisê û rewşa wan a hijmetheyran temaşe dikir bayekî gelek hênîk lebitî. Ji ber ku wê wezîyeta pir muhteşem û şîrîn a zelzeleyeke mîna reqsê ya welweleyî, veğerand şiklê tesbîhateke cizb-eda; temaşeya şahînetê, guherî nêrîna ibretê û guhdarîya hikmetê. Bi carekê ev fiqreya Ahmedê Cizîrî ya kurdî: “Her kes bi temaşagehê husna te ji her cay teşbîhê nîgaran bi cemala te dinazin” hate bîra min. Dilê min, ji bo maneyên ibretê îfade bike wiha girîya” (2003c, r. 237). Wisa dixuyê ku ev beyta Mela “Her yek bi temaşagehê husna te ji her ca / Teşbîhê nîgaran bi cemala te dinazin” bêhtir li Nûrsî tesîrê kiriye.

2. Nûrsî dibêje: (Wergera ji farisî ya munacatê ya adapteyî: Tahsîn Îbrahîm Doskî)

1. يَا رَبِّ هَرِّ حَى بِمَا شَاغَهُ صُنْعُ تُو زَهْرَجَائِ بَتَّازِ
زِشْبِيبُ أَزْ فِرَازِى مَانْدِ دَلَالَانْ بِنْدَاءِ بِاَوَازِى

1. Her kes li temaşagehê sun'ê te îlahî!

Teşbîhê dellalan e bi awaz in û gazî

2. دَمَ دَمَ زَجَمَالِ نَقْشِ تُو دَرِ رَقْصِ بَازِى
زِ كَمَالِ صُنْعِ تُو خُوشِ خُوشِ بِيگَازِى

2. Hindek ji nişîv tîn û ji evrazîyê hindek

Bo neqşê cemala te li govend in û bazî

3. زِشْبِيرِ بِنِى اَوَازِ خُودِ هِىَ هِىَ دِنَازِى
أَزْوَى رَقْصِ اَمْدُ جَذْبِهِ خَازِى

3. Nalîne ewana ji kemala evî sun'î

Awazeke şêrîn diden û heyhey û nazi

4. أَزَيْنِ اَنَارِ رَحْمَتِ يَافَتِ هَرِّ حَى دَرَسِ تَسْبِيحِ نَمَازِى
اَيْسَنَادَسْتِ هَرِّ يَكِى بَرِ سَنَكِ بَالَا سَرَفِرَازِى

4. Tesbîh û nivêj ders e ewa j' rehma Xudayî

Lew cezbe ewana bo semayê vedixwazî

5. دِرَازْ كَرْدَسْتِ دَسْنَهَارَا بَدَرْگَاهِ اِلَهَى هَمَّ جُو شَهَبَازِى
بِجُنُبِدَسْتِ زُلْفَهَارَا بَشَوُقِ اَنگِيزِ شَهَنَازِى¹⁴

5. Yê wergiritin dersê serevraz e li bala

Destê wî dirêj e li derî wek şehê bazî

¹⁴ Ev nişe ji bo peyva “Şehnazî” hatiye danîn, “Şehnaz- 1 Çelkezî, delaleke dinyayê ye ya bi çil kezîyên honayî. Dikarî bnr. (Nursî, 2003c, r. 239). Şehnaza Çilkezi lehengeke çîrokê ye, di guhertoyeke çîroka Mirza Mihemed de dibore (Oner, 2016).

6. بَبَالَا مِيزَنْتَنْدُ اَزْ پَرْدَه هَايِ هَايِ هُوِي عَشْقُ بَاژِي
مِيدَهْدُ هُوشَه گِرِيْنَهَايِ دَرِيْنَهَايِ رَوَالِي اَزْ حُبِّ مَجَاژِي

6. Bîr têtêve hingî wî li girî û xem û qehra

Hatî ji zewala heçî hubba ku mecazî

7. بَرِ سِرِ مَحْمُودَهَا نَعْمَهَايِ حُزْنِ اَنگِيزِ اَيَاژِي
مُرْدَهَارَا نَعْمَهَايِ اَزَلِي اَزْ حُزْنِ اَنگِيزِ نَوَاژِي

7. Ruh tê digehit zemzemeya naz û niyazan

Mehmûd e dizanî nexema huzna Eyazî

8. رُوْحَه مِي اَيْنْدُ اَزُو رَمَزْمَه نَاژِ نِيَاژِي
قَلْبُ مِيخِوَاَنْدُ اَزِيْنِ اَيَاْتَهَا سِرِّ تَوْجِيْدُ زِ غُلُو نَظْمِ اِعْجَاژِي

8. Nê dil ji evê ayetê tewhîdê dixwînit

Ku nezmeke ‘ulwîy ye bi i‘cazî û razî

9. نَفْسُ مِيخِوَاهَدُ دَرِ اَيْنِ وَلَوْلَهَا زَلْزَلَهَا دَوَقِ بَاقِي دَرِ فَنَائِ دُنْيَا بَاژِي
عَقْلُ مِيبِيْنْدُ اَزِيْنِ رَمَزْمَهَا دَمْدَمَهَا نَظْمِ خَلَقَتْ نَفْسُ جَعَمَتْ كَنْزِ رَاژِي

9. Nefsê di evê welwele yû zelzeleyê da

Zewqê ebedî dît di fena dunya newazî

10. اَزُو مِيْدَارْدُ هَوَا اَزِيْنِ هَمْمَهَا هُو هَوَهَا
مَرگِ خُوْدُ دَرِ تَرْكِ اَدْوَاقِ مَجَاژِي

10. ‘Eqlî nezîma xilqet û neqşê tijî hîkmet

Dît wextê ku ev himhîme bo bûye terazî

(Nursî, 2003c, rr. 237–38).

Mela di helbestê de îşqa xwe aniye zimên. Ji evîndara xwe re dibêje tu ewçend bê hed delal î, nazik û binaz î ji her alî ve bûnewer tên temaşeya husn û cemala te. Nûrsî, herçiqasî di vê munacata xwe de dorûberê wekî zikirxaneyekê dişayesîne jî, hem ji alîyê wezn û teşeyê ve hem ji alîyê têgihên ku bi kar anîne aşkere dixuyê ku nezîreyeke vê helbesta Mela nivîsîye. Ev nimûneyên helbestan nîşaneyên navdeqîtiya her du berheman in:

Her yek bi temaşagehê husna te ji her ca
Teşbihê nigaran bi cemala te dinazin (Mela)

Her kes li temaşagehê sun'ê te îlahî!
Teşbihê dellalan e bi awaz in û gazî (Nûrsî)

Ger husn û mehebbet bisera perdeyê can bin
Geh şah û geda, geh bixweh Mehmûd û Eyaz in (Mela)

Ruh tê digehit zemzemeya naz û niyazan
Mehmûd e dizanî nexema huzna Eyazî (Nûrsî)

3. Mela gotiye:

“Ji vê [şeva]¹⁵ zulmat û deryayê ji mewcan qet xeber nayê

Şikestî keştîya bayê ‘ecacê wê şefeq dayê.” (Cizîrî, 2004, r. 26).

3. Nûrsî di behsa Yûnus (a.s.) de dibêje:

“Hazret-i Yunus aleyhisselâmın kıssa-i meşhuresinin hülâsası: *Denize atılmış, büyük bir balık onu yutmuş, deniz fırtınalı ve gece dağdağalı ve karanlık ve her taraftan ümit kesik bir vaziyette, اِنِّى كُنْتُ مِنَ الظَّالِمِينَ* münacatı, ona süraten vasıta-i necat olmuştur.” (Puxteya qiseta Hezretê Yûnus a meşhûr: *Ew avêtine behrê, masîyekî mezin ew belîandîye, behr bifirtone û ecac e, şev bi daxdaxe û zulûmat e û rewşeke wisa ye ku ji her hêlê ve hêvî qut e, munacata اِنِّى كُنْتُ مِنَ الظَّالِمِينَ* bi lezgînî ji bo wî bûye sedema xilasbûnê.) (2004c, rr. 11-12).

Mela di van beytên xwe de rewşa xwe ya pêşîrteng a ji ber eşq û evînê bi awayekî mecazî dişibîne ya mirovêkî ku di şeva tarî de, keştîya wî ji ber ecacê di nav memcên behrê de şikestiye, li ber xeniqandinê ye û kes bi hewar û gazîya wî de nayê (Turan, 2010, r. 66). Wekî li jor hat destnîşankirin Nûrsî bi hinek têgînên vê beyta Mela qiseya Yûnus Pêxemberî vegotiye. Herwiha Nûrsî jî bi awayekî mecazî rewşa xwe û yên kesên wekî xwe dişibîne rewşa Yûnus (e.s.), dibêje: Şeva me pêşeroja me ye. Pêşeroja me, ji ber xefleta me ji ya wî bi sed dereceyê tarîtir û bidehşettir e. Behra me, rûyê erda me ya sergerdan e. Di her mewceke vê behrê de bi hezaran cenaze hene; ev behr hezar dereceyê ji behra wî metirsîtir e (Bediüzzaman Said Nursî, 2004c, r. 12).

4. Mela gotiye:

“Leşkerê alem meger yekser te dijmin bin Mela

Xem bi mûyek nakişînî ger te dilber yar-i bit.”(el-Cezerî, d.n., r. 24).

4. Nûrsî dibêje:

¹⁵ Di nusxeya Celalettin Yöyler de ku şirove kiriye wiha ye, “Şeva zulmat û deryayê ji mewcan qet xeber nayê” (Cizîrî, 2006, r. 27).

“Îman hem nurdur, hem kuvvettir. Evet, hakiki imanı elde eden adam, kâinata meydan okuyabilir ve imanın kuvvetine göre, hadisatın tazyikatından kurtulabilir.” (Îman him nûr e, him qewet e. Belê, mirovê ku îmana heqîqî bi dest bixe, dikare li ber kâinatê meydan bixwîne û li gorî qeweta îmanê, ji fişara bûyeran xwe rizgar bike) (2003c, r. 332).

Ehmed Zivingî vê qitaya Mela wiha şirove dike: Ey Mela wisa ferz bike ku leşkerên cîhanê hemû dijaminê te ne. Bi qasî mûyekî xemê nekêşe piştî ku evîndara te ji te re yar be û sadiq be yan tu ji evîndara xwe re sadiq bî (Ez-Zivingî, 2013, r. 127). Nûrsî, ji milê derbirînê ve îfadekirina xwe şibihandîye ya Mela.

5. Mela gotiye:

Senema sur ji Semed, neyşekera leb ji nebat

Ehsenellahû tebarek ji sura wê senemê (Cizîrî, 2006, r. 925).

Senema sur ji Semed, şewqê ji heq daye wucûdê

Ger Ezazîlî bidîta nedibir xeyrê sicûdê (Cizîrî, 2006, r. 915).

5. Nûrsî dibêje:

“Çünkü, Samed ayinesi olan bâtın-ı kalb ile, sanem-misal dünyevi mahbublara perestiş etmek, o mahbubların nazarında sakıldır.” (Lewra, nihêrtina bi hundurê dil ê ku eynika Semed e, bi awayê hebandinê bengîtîya evîndaran kirin, li ber çavê wan evîndaran giran e.) (Nursî, 2003c, r. 378).

Mela li gorî nêrîna wehdeta wucûdê nisbeta delalî û xweşikahîya dide bibal Xwedê ve, dide zanîn ku divê ew sir bê dîtin. Îblîs ji ber ku ew sirr nedîtîye lewma neçûye sicûdê. A ku Nûrsî dibêje ji derbirîna Mela ne dûr e, ew jî dibêje nêrîna li mehbûbê dinyayî divê di mesabeya eynedarîya Xwedayê Teala de bin. Ji xwe têgihên ku Nûrsî bi kar anîne yên wekî Semed û senem nişan didin ku wî ne tenê ji aliyê maneyê ve ji aliyê tabîr û têgihan ve jî ji Mela sûd wergirtiye.

Wekî ji muqayesekirina mînakên li jor jî tê fêmkirin Nûrsî, bi piranî rêbaza navdeqîtîyê ya veşarî pêk anîye. Yek du îstîsnayên wekî “Sirrê wehdet ji ezel girtiye heta bi ebed” û “Her kes bi temaşagehê husna te ji her cay teşbîhê nîgaran bi cemala te dinazin” ne tê de hemû jêgirtinên ji Mela bi awayê veşartî ne. Nûrsî, wekî hat dîtin

li gorî peywendîya navdeqîtîyê carinan bi awayê resterst carinan jî bi telmîhî an bi dubarekirinê jêwergirtin kirine.

2.3. Navdeqîtî di Navbera Kullîyata Ehmedê Xanî û Berhemên Nûrsî de

Ehmedê Xanî (1650-1707) kurê Îlyasê kurê Rostem Begê ye, ji eşîra "Xanî" ye li bajarê Bazîdê di sala 1650yê de hatiye dinyayê, di sala 1707ê de jî li wir wefat kiriye. Bavê wî ji Hekarîyê bi koçberî hatiye Bazîdê, li wir bi cî bûye (Durre, 2002, r. 10). Xanî mexlesên wekî "Mela", "Pepûk" û "Kurdî" jî bi kar anîne (Yıldırım, 2008, r. 14). Ji bilî yên ku nisbetî bal bi Ehmedê Xanî ve tên dayîn yek jê dîwançe çar berhemên wî hene. 1) Berhema wî ya yekemîn *Nûbehara Biçûkan* e, di sala 1683yê de nivîsiye. Ji bo zarokên Kurdan ên dema dest bi xwendina erebî bikin da ku çavbinas bin ferhengeke menzûm a Kurdî-Erebî ye. Ev ferheng di medreseyan kurdan de hatiye xwendin û jiberkirin. 2) *'Eqîdeya Îmanê*, Xanî ev berhem di sala 1687ê de nivîsiye. Ev berhem derbarê eqaîda Îslamê de ye. Ev berhem jî di medreseyan kurdan de wekî pirtûka dersê hatiye xwendin. 3) *Dîwan*, ev berhema Xanî piştî wefata wî ji aliyê hin kesan ve hatiye berhevkirin û çapkirin. *Dîwan* ne muretteb e. Hejmara helbestên wê li gorî berhevkarên diguhere. Yekemîn car Mele Mahmûdê Bazîdî (1799-1867) 25 heb helbestên Xanî di dîwançeyekê de berhev kirine; bi destê A. Jaba ev dîwançe gihîştîye "Kutûpxaneya Giştî Ya Gel li Petersburg"ê. 4) *Mem û Zîn*, Xanî ew di sala 1695ê de qedandiye. Ev berhem digel ku mesnewîyeke eşqê ye, mijarên wekî kurdayetî, civakî, siyasî, olî, çandî, felsefî û tesewufî di hundurê. Ji 2656 beytan pêk tê (Yıldırım, 2010, rr. 22-39).

Gava Nûrsî 13-14 salî bû, ketibû nav tereduda rêçîka ku pê da diçû; gelo li ser rêya rast bû an na, rêya wî bi nêrîna alimên berî wî re li hev dikir an na. Lewma li ba melayên navdar digerrîya, wekî tebarîkî çend ders ji wan werdigirt, dixwest ji şubheyên xwe xelas bibe. Van fikirînan ew xistibû nav bêdengîyekê, gelek hindik diştexilî. Jixwe demek berê çûbû ser tirba Ehmedê Xanî, carinan bi şev jî li balê dima, ya ku xelk bi roj jî bi tirs diçûn balê ew carinan bi şev jî li balê dima. Ji ber vê yekê xelkê bo wî digot, "Bûye mezherê feyza Hezretê Ehmedê Xanî." (Nursî, 1997a, r. 20).

2.3.1. *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî

Mem û Zîn a bi teşeya xwe mesnewî, bi tîmaya xwe lîrik, bi naverok û mijara xwe wekî bîngeh eşq û evînê di hundurîne ya ku zimanzan, mutesewîf, filozof, şair û seyda Ehmedê Xanî ji destana gelêrî ya kurdan “Memê Alan” sûd wergirtiye û ew nivîsîye, ji 2656-7 beyt û 60 beşan pêk tê. Bi wezna arûzê behra hezec û qalibê “Mefulu mefaîlun feûlun” hatiye nivîsîn. Bi dîbaceyeke ku 361 beytan pêk tê dest pê dike. Di vê dîbaceyê de pêşî nav, hemd û senayê Xwedê Teala hildide, medhê Hz. Muhemmed dike û hal û rewşa kurdan a wê serdemê destnîşan dike. Pûte bi zimanê kurdî dide; gazinan ji bazara kesad a ziman û edebiyata kurdî dike. Herwiha Xanî rexneyê li kurdan dike çima yekîtiya wan nîne û îtabê li rom, ereb û eceman dike çima ku çarmedorê kurdan dagir kirine û wan di sînoren nav xwe de dîperçiqîn. Xanî piştî wî dest bi hikayeya *Mem û Zînê* dike heta dirêjahîya wê digîhîje 2470yî, di beşên ber bi dawî de behsa bûyerên di nav hikayeyê de diqewimin, mahiyeta eşq û evînê û muhehebeta Îlahî dike (Dorskî, 2005, rr. 32–33; Xanî, 2013, r. 73; Yıldırım, 2010, r. 39).

Mem û Zîn digel ku yekem nimûneya mesnewîya edebîyata kurdî ye, yekem berhema kurdî ye ku di formata pirtûkekê de hatiye nivîsîn û kopyayên wê hatine zêdekirin. Herwiha yekem berhema kurdî ya klasîk e ku ji serî heta binî hikayeyek vegotiye. Heta niha li zimanên wekî rûsî, farisî, almanî, îngilîzî, azerî, siwêdî, tirkî û hwd. hatiye wergerandin. Bûye mijara gelek tezên akademîk, xebatên zanîstî, şano û filman (Tek, 2018, rr. 2–7).

Nûrsî bîyî ku navê Ehmedê Xanî bilêv bike di gelek cîyan de ji kulliyata wî sûd wergirtiye. Ne yek û dido gelek caran ev kirîye, hem ji aliyê teşe û formê ve hem ji aliyê tîgîh û tabîran ve û hem jî ji aliyê mane û naverokê ve bi dehan jêwergirtin ji Xanî girtine. Baş nayê zanîn ka Nûrsî bi çi ferasetê ev karvanî pêk anîye. Gerçî bi rêya îhsas û telmîhê bîyî bi nav û nişan bike mefhûmê gelek ayet û hedîsan jî vediguhêze.

Wekî ku dê ji berawirdîya mînakên jî bê fêmkirin Nûrsî fikir û ramana Xanî ji berhemên xwe re dike bîngeh û palpişt. Da ku ev rastî û rêbaza navdeqîtîyê baştir bê dîtin em ê orjînala metnên berhemên Nûrsî anku tirkîya wan bidin û di nav kevanê de wergera wan a kurdî diyar bikin.

Di jêgirtinên jêr de her çiqas bi şeklekî mudellel meriv nikaribe gotinên Xanî wek jêder nişan bide jî, di şîroveyên Nûrsî de nêzîkbûna ji aliyê me‘nayê ve qenaetek bi meriv re çêdibe, dibe ku di van şîroveyên jêr de Nûrsî ma‘nen ji Xanî sûd wergirtibe.

1. Xanî gotiye:

“Şem‘ î ne qîsmê nûr û nar î

Şems î ne ‘eyan tu perdedar î.” (Xanî, 2013, r. 82).

1. Nûrsî dibêje:

“Evet şiddeti zuhurundan görünmemek derecesine gelenler vardır. *Cırmi şems gibi.*” (Belê yên ji ber zêde eşkerehiyê ku tên dereceya nexuyakirinê hene. Wekî gumlata rojê.) (2004e, r. 101).

Li vê derê diyar e ku Nûrsî bi vê rêzika Xanî ya navborî re têkilî danîye.

2. Xanî gotiye:

“Mecmû‘ê mukewwenatê ‘alem

Hetta ve xulase new‘ê adem” (Xanî, 2013, r. 461).

“Lew ra tu numûnedarê zat î

Ayîneyê sûretê sîfat î” (Xanî, 2013, r. 530).

2. Nûrsî dibêje:

“Nasıl ki insan, şu âlem-i kebirin bir misal-i musağğarıdır.” (Çawa ku însan, nimûneyeke biçûk a vê alema mezin e.) (2003c, r. 50). “Mevcudat ayinelerinde cemallerini gösteren bütün esma-i kudsiye-i ilâhiye.” (Hemû esmayên qutsî yên îlahî yên ku di eyneya bûneweran de cemala xwe nişan didin.) (2003c, r. 80).

Wekî ji mînakên diyarkirî jî dixuyê vegotina Xanî û ya Nûrsî çî ji aliyê uslûbê ve çî ji aliyê naverokê ve wekî ku berdewama hev bin ewçend dirûvê hev didin.

3. Xanî gotiye:

Ewwel biriqî ji husnê sermed

Nûrek bûye me‘niya Muhemmed

Ew nûr e bi emrê ‘alimul’keyb

Bû menşe‘ê feyzê ‘alemul’keyb

Ev mijarên bi vî rengî yê derbarê lîteratûra Îslamê de ji gelak alim û zanayan re bûne warê xebatê. Mumkun e ku Xanî û Nûrsî ji heman lîteratûrê îstîfade kiribin an Nûrsî digel çavkanîyên din ji Xanî jî îstîfade kiribe. A li vir me eleqedar dike lihevixwarin û tenasuba her du metnan e ya ku dikare di nav rêbaza navdeqîtiyê de bê qebûlkin.

5. Xanî gotiye:

*“Qehra xu bikî eger tu zahir
Cennet li me dê bibîte agir*

*Wer feyzê biket sehabê rehmet
Dûzex li me dê bibîte cennet*

*Ger kafîr û ger gunahkar in
Bi’l-cumle ji te umîdwar in”* (Xanî 2013, r. 157).

5. Nûrsî dibêje:

“Cehenneme gitse de, yine Cehennem içinde bir nevi hususî Cenneti, onun hasenatına mükâfaten halkedebilir. Kışta bazı yerde baharı halkettiği ve zindanda, uyku vasıtasıyla, bazı adamlara zindanı saraya çevirdiği gibi, hususî Cehennemî, hususî bir nevi Cennete çevirebilir.” (Heger biçe dogehê jî, di nava dogehê de jî dîsa bi awayek buhişteke taybet, di muqabilê qencîyên wî de wekî mukâfat dikare biafirîne. Çawa ku di zivistanê de li hin cîyan beharê diafirîne û di zîndanê de, bi rêya xewnê, ji hinek kesan re zîndanê vediguhêzîne serayê, dikare dogehê taybet veguhezîne buhiştê taybet.) (2004d, r. 440).

Li vir, metna Nûrsî dikare wekî şerh, îzah û şîroveya van beytên Xanî bê hesibandin, helbet şîroveyeke tundrav. Lewra Nûrsî “umîdwarîya kafiran” ji rehma Xwedê, bi qasî ku dibe ji wan re di cehnimê de cenetek bê avakirin şîrove dike.

6. Xanî gotiye:

*“Tewfîqê refîq-i bit ji Barî
Ez dê we bikim bi sihrekârî* (Xanî 2013, r. 373).

6. Nûrsî dibêje:

“Eğer meşiet-i ilâhiye taalluk etse ve *tevfik-i rabbanî refik olsa*, tafsilatını zikretmek fikrindeyim.” (Heger meşîeta ilahî eleqedar bibe û tewfîqa Xwedê bibe alîkar fikra min ew e ku berfirehîya wê bejim.) (2004e, r. 107).

Nûrsî hevoka Xanî “Tewfîqê refîq-i bit ji Barî” wergirtiye forma wê guherandiye “tevfik-i rabbanî refik olsa” û bi kar anîye.

7. Xanî gotiye:

“Neqşê ku Xweda kirî *muxeyyer*
Kî qadir e wî biket mu'xeyyer” (Xanî, 2013, r. 415) .

7. Nûrsî dibêje:

“Kadîr-i Âlîm ve Sâni-i Hakîm kanuniyet şeklindeki âdâtının gösterdiği nizam ve intizamla, kudretini ve hikmetini ve hiçbir tesadûf işine karışmadığını izhar ettiği gibi; şüzuzat-ı kanuniye ile, âdetinin harikalarıyla, tegayyûrat-ı sûriye ile, teşahhusatın ihtilâfatıyla, zuhur ve nüzul zamanının tebeddülüyle meşietini, iradetini, *fail-i muhtar olduğunu* ve *ihtiyarını* ve hiçbir kayıd altında olmadığını izhar edip yeknesak perdesini yırtarak ve her şey, her anda, her şe'nde, her şey'inde Ona muhtaç ve rububiyetine münkad olduğunu ilam etmekle gafleti dağıtıp, ins ve cinnin nazarlarını esbabdan müsebbibü'l-esbaba çevirir.” (Qadirê Elîm û Saniê Hekîm bi nîşandana nîzam û întîzama adetên xwe yê di şiklê qanûnan de, çawa ku bi qudreta xwe û hikmeta xwe eşkere dike ku qet tesadufek tevli karê wî nebûye; bi awerteyên qanûnan, harîqayên adetên xwe, bi guherînên muwaqit, bi cihêwazîya şexsîyetbûnê, bi cîgorandina zuhûr û nuzûlê bi meşîeta xwe û îradeya xwe, eşkere dike ku failê bi serê xwe ye û di terciha xwe de ne girêdayî tu qeyd û şertan e û perdeya yeknesakîyê dîçirîne, bi îlankirina ku her tişt, her car, di her rewşê de, di her tiştan de muhtacê Wî ne û girêdayî rubûbîyeta Wî ne xefletê belav dike, nêrîna beşerê ji sedeman bal bi musebibê sedam ve diguherîne) (2003c, r. 215).

Wekî di vê mînakê de û gelek mînakên din de jî dikare bê dîtin Nûrsî bi dupatekirina fikra Xanî nasekine, zehfî caran gotinên wî vediçirîne, şirove dike, binî dadigere û lê zede dike, bi vî awayê wekî şerh û îzah bike Xanî baştir dide fêmkirinê.

8. Xanî gotiye:

“*Dinya ku behîştê kafîran e*
Me'wayê belayê mu'minan e” (Xanî, 2013, r. 639).

8. Nûrsî dibêje:

“Yanî, *dünyada şu mü'mîn, kısmen kusuratından cezasını gördüğü için, dünya onun hakkında bir dâr-ı cezadır. Dünya, onların saadetli ahiretlerine nisbeten bir zindan ve cehennemdir. Ve kâfirler, madem cehennemden çıkmayacaklar, hasenatlarının mükâfatlarını kısmen dünyada gördükleri ve büyük seyyiatları tehir edildiği cihetle, onların ahiretine nisbeten dünya, cennetleridir.*” (Yanî, li dinyayê, ev mumîn, ji ber ku cezayê hinek kêmasîyên xwe dibîne, dinya ji bo wî mala cezayê ye. Dinya, li ber axîreta wan a biseadet zindan û cehnem e. Û kafir, madem dê ji cehnemê derneyên, ji ber ku mukafata qencîyên xwe li dinyayê hinek dibînin û gunehên wan ên mezin tên texîrkin, dinya li gorî axreta wan, cenneta wan e) (2004c, rr. 70–71).

Weke ji mînakên hatine muqayesekirin xuya dibe ku Nûrsî him ji alîyê maneyê ve him ji alîyê tebîr û têgihan ve him ji alîyê hişmendî ve û him ji alîyê form û teşeyê ve ji *Mem û Zîna* Xanî jêgirtin kirine.

2.3.2. *‘Eqîdeya Îmanê ya Ehmedê Xanî*

Eqîdeya Îmanê yek ji çar kitêbên Xanî ye. Xanî ev berhem di sala 1687ê de nivîsîye. Ji 70 beytan pêk tê. Li gorî wezna “muteqarib” a ilmê arûzê hatiye nivîsîn. Naveroka vê eqîdenameyê li gorî ekola “Sunnî-Eşerî” ye. Berhem di medreseyên kurdan de wekî kitêbeke dersê dihat xwendin û jiberkirin. Ev eqîdename yekem kitêba dersê ye ya ku di warê ilme dînî de dihat xwendin. Herwiha ev berhem ji eqîdename û kitêbên kurdî yên di warê zanîstên dînî de bûye nimûne (Yıldırım, 2008, rr. 42–43).

1. Xanî gotiye:

“Li ba te muheqqeq bitin ev cewab

Duhû gote min hatîfî bê hîcab” (Yıldırım, 2008, r. 175).

Hatîf ango milyaketê ji xeybê xeber dide yan ew kesê dengê wî tê bihîstin lê ew naxuyê (Devellioğlu, 2006, r. 341). Kadri Yıldırım dibêje, sedemên nivîsandina berhemên klasîk zehfê caran li ser daxwaza dost û nasan an şagirtan an jî kêmasîya warekî bû, lê sedema ku Xanî nîşan daye tiştêkî heta niha nehatiye dîtin. Lewre Xanî dibêje rojek berê hatîfek yanî gazîkerekî veşarî bangî wî kiriye û gotiyê berhemeke ku ji pirsên aqîdeyî re bibe bersiv binivîsîne (2008, r. 176). Nûrsî jî di gelek ciyan de diyar dike ku berhemên xwe bi awayê îlhamî û sinûhatî dinivîse.

1. Nûrsî dibêje:

“Eğer *sünûhat-ı kalbiye* olsa bilmeceburiye meşgul oluyorum.” (2004c, r. 117). (Heger sunûhata dilî be bi mecbûrî pê re meşxûl dibim.) “*Ne vaqit Cenab-ı Hakkın rahmetinden kalbe sunûhat gelse*, tedricen size yazılır.” (2004d, r. 441). (Kengê ji rehmeta Cenabê Heq sunûhat bê, bi tedricî bo we tê nivîsîn.) “*Rehmet-i ilahiye ile kalb-i acizaneme gelmiş.*” (Ji rehmeta îlahî hatiye dilê min ê reben.) (2004d, r. 387).

2. Xanî gotiye:

Sa Ehmed sena ke bi qewlê sehîh

Li tewhîdê Barî bi qewlê fesih (Yıldırım, 2008, r. 177).

2. Nûrsî dibêje:

“*Birden, o hâlette iken, baktım ki, mühim bir zat bana âmirane diyor ki: ‘İ‘caz-ı Kur‘an‘ı beyan et!’*” (Bi carekê, ku ez di wê rewşê de bûm, min dît ku, zatekî muhîm bi ferman ji min re dibêje ku: “Î‘caza Qur‘anê beyan bike!”) (2004d).

Nûrsî jî wekî Xanî xwe ji bo î‘laya kelîmetullahê wezîfedar dihesibîne. Lewma Nûrsî di piranîya nivîsarên xwe de bi “Bismîhî subhanehû we înn min şeyin îlla yusebbîhu bihemdîhî” (Bi navê Xwedayê ku ji her cure kêmasîyan bêpar e û qet bûnewerek nîne ku Wî bi pesin tesbîh neke.)

3. Xanî gotiye:

“Ku serdefterê cumle ‘alem ew e

Nubuwet xwe mektûb e xatem ew e.” (Yıldırım 2008, r. 193).

“*Xudê aferandin ji bo wî felek*

Ji bo xizmeta wî şîhandin melek” (Yıldırım 2008, r. 196).

3. Nûrsî dibêje:

“Bu sıfatları haiz, bu vazifeleri en mükemmel görebilecek Hazret-i Muhammed aleyhissalâtu vesselâmdan başka âlemde bir şahıs yoktur. En câmi, en kâmil, en fazıl o zattır.” (Di cîhanê de ji bilî Hezretê Muhemmed elehîselatuwesselam kesekî din ê ku xwedîyê van wesfan be û bikaribe vê wezîfeyê bi cî bîne nîne. Ê herî tamam, ê herî kemilî, ê herî bifezîlet ew zat e.) (2003b, r. 43). “*O zat nasıl ki risaletiyle, hidayetiyle saadet-i ebediyenin sebep-i husûlü ve vesile-i vüsûlüdür. Onun gibi, ubudiyetiyle ve duasıyla o saadetin sebep-i vücudu ve Cennetin vesile-i icadıdır.*” (Ew zat çewa ku bi

rîsaleta xwe û bi hîdayeta xwe sebeba hebûna seadeta ebedî û wesîleya gihîştina wê ye. Wekî wî, bi evdîtî û duayên xwe jî sebeba wucûda wê seadetê û wesîleya îcadkirina Cennetê ye.) (2003a, r. 79).

4. Xanî gotiye:

“Bi fî ‘lê di qenc da nekî minnetê

Bi fedla Xwedê dê biçî cennetê.” (Yıldırım, 2008, r. 312).

4. Nûrsî dibêje:

“Ubudiyet, mukaddeme-i mükâfat-ı lâhika değil, belki netice-i nimet-i sabıkadır.” (Ubûdîyet, ne destpêka mukafatên ku dê bîn dayîn e, belkî encama nametên ku hatine dayîn e.) (2003c, r. 380).

Xanî gotiye, bi fêla xwe ya qenc, helbet îbadet jî tê de mineta xwe neke, tu yê ne bi wê xêrkirîne bi fedl û ihsana Xwedê biçî cennetê, yanî cennet dana Xwedê ye. Nûrsî jî heman tiştî dibêje; ubûdîyet yanî evdîtî, pêkanîna hemû emir û fermanên Xwedê, ne destpêka mukafatên ku dê bide me ne, berdêla qencîyan in ên ku li vê dinyayê Xwedê bi me re kirine. Mirov bi kirina îbadet û qencîyan deynê xwe didin. Lê Xwedê Teala wad kiriye kî wezîfeya xwe ya evdîtîyê bine cî, Ew ê wî bixe cenneta xwe.

2.3.3. *Dîwana Ehmedê Xanî*

Dîwana Xanî, ji 30 heb helbestên wî yên ku heta niha hatine bidestxistin pêk tê. Bi qasî tê zanîn *Dîwan* di saxîya Xanî de nehatiye berhevkirin, piştî wefata wî ji alî derdorên ilim û edebiyatê ve hin bi hin hatiye civandin. Cara ewil Mela Mahmûdê Bazîdî (1799-1867) 25 heb helbestên Xanî di diwançeyekê de civandine. Konsolosê Rûsyayê yê Erzurûmê A. Jaba ew biriye xistiye “Pirtûkxaneya Gel a Petersburg”ê. Piştî wî kesên wekî Îsmail Badî, Mesûd Kettanî, Muhemmed ‘Elî Qeredaxî, Abdurrahman Durre, Abdullah Varli, Tahsîn Îbrahîm Doskî û Kadri Yıldırım helbestên Xanî hin bi hin lê zêde kirine heta hêjmara helbestên wî yên berhevkirî gihîştine 30 heban (Xanî, 2014, rr. 29–30).

1. Xanî gotiye:

“Ew rû ne yan gulbergê al, alal e, yan dêma bixal

Qendîlê Nûra Zulcelal, mir'at e ya na mezher e

Dêm, şûşe nûra heqq di nav, dev xunçe ya şîrîn gulav
Rux, sorgula rengîn xunav, xal misk e, nîşan Enber e.” (Durre, 2002, r. 116).

“Însan, Te ji bo alemê Kubra kire nûsxe
Lew mudxeyekî jê Tu dikî Erşê mûella

Wehdet bi heseb kisretê e ‘yanê mezhahir”
Her so bi sifatan diketin keşfê tecella.” (Durre, 2002, r. 173).

1. Nûrsî dibêje:

“*Însan, üç cihetle esma-i ilâhiyeye bir ayinedir.*” (Însan, bi sê aweyan ji navên Xwedê re eynikek e.) (2003c, r. 727). “Nasıl ki insan, şu âlem-i kebirin bir misal-i musağğarıdır.” (Çawa ku însan, nimûneyeke biçûk a vê alema mezin e.) (Nursî, 2003c, r. 50).

Wekî berê jî hat diyarkirin Nûrsî jî wekî Xanî alema îmkanê wekî teyîsîngeha nav û sifâtên wacîbul wucûd zatê Xwedê (c.c.) dihesibîne. Her bûnewer li gorî qabiliyeta xwe eynedarîya Zatê Zulcelal dike.

2. Xanî gotiye:

“*Bê tekelluf duxwerim sondê bi Qur'an a şerîf!*
Xanîya [Ey Xanî] sûretê canan e bi min s[Ş]ûretê Nûr” (Durre, 2002, r. 120).

2. Nûrsî dibêje:

“*İşte bu risalede mezkûr otuz üç ayet-i meşhurenin bil’ittifak, tekellüfsüz, manaca ve cîfırce Resaili’n-Nur’un başına parmak basmaları ve başta ayeti’n-Nur on parmakla ona işaret etmesi.*” (Eve di vê rîsaleyê de sî û sê ayetên meşhûr ên hatine zikirkirin bi îtîfaq, bê zordayîn, bi mane û cîfrê îşaretî serê Resaîlî’n-Nûrê dikin û di serî de ayeta nûrê bi deh tilîyan îşaretî wê dike.) (2005, r. 647).

Li vir telmîhek tê hîskirin. Xanî bê tekelluf yanî bê zordayînê bi Qur’ana Şerîf sond dixwe ku sûretê cananê bi wî wekî Sûreya Nûr tê. Nûrsî jî di Şûa‘ya Yekem (2005, rr. 621–61) de dibêje bê zordayînê 33 ayetên Qur’anê di serî de ayeta nûrê ya Sûreya Nûrê li wî li elektrîkê û Rîsaleyên Nûr dinêrin.

Wekî ku ji mînakên jî diyar dibe jêgirtinên Nûrsî ji *Dîwana* Xanî hindiktir in. Ji ber ku dîwan berhevok e û vê paşîyê derketiye nav lîteraturê, mumkin e ku Nûrsî jê baş ne haydar be. Ev mînakên wekî jêgirtinên ji *Dîwanê* dixuyên jî dibe ku li hev hatina gotinên rast û heqîqetê bin.

2.4. Navdeqîfî di Navbera *Nehcu'l-Enam* Mele Xelîlê Sêrtî û Berhemên Nûrsî de

Navê Mele Xelîlê Sêrtî yê temam Xelîl b. Molla Xalid el-‘Umerî es-Sî’irdî el-Hîzanî ye. Di sala 1750yê de li gundê Gulpikê yê Hîzana Bedlîsê hatiye dinê, di sala 1843yê de li Sêrtê wefat kiriye. Mele Xelîl di destpêkê de li ba bavê xwe Mele Huseyn xwendîye. Piştî wî ji seydayên wekî Mele Abdurrahmanê Belakî, Mele Remezanê Hezwînî, Mele Ehmedê Hafîz, Mele Ebdulhadîyê Arwasî û Mele Huseynê Xoşabî û hwd. ders wergirtiye. Piştî wî diçe Amedîyê li ba Mele Yehyayê Mizûrî û Mele Mahmûd xwendina xwe temam dike û îcazeya xwe werdigire. Sêrtî di mijarên wekî, tesewîf, fîqih, kelam, serf û nehu, tecwîd, hedîs, şemail, mewlûd, belaxet, mentiq, îstîare, adab û munazere û hwd. de 26 pirtûk nivîsîne. *Nehcu'l-Enam* yek ji van 26 berhemên e. Mele Xelîl yek jê bi erebî ya din bi kurdîya kurmancî du *Nehcu'l-Enam* nivîsîne. Mijara xebata me nusxeya kurdî ye. Berhem ji 22 beş û 271 beytan pêk tê. Di van beşan de bi giştî behsa ferzên eyin, rîknên îmanê, rîknên îslamê, sîfatên Xwedê, melayket, nubûwet, şemaila Hz. Pêxember, mîrac, îmamet, elametên qiyametê û adabê nimêjê û xwarin wergirtinê dike (Gökçe, 2015).

Nûrsî li Sêrtê li ba Mele Fethullahê Werqanisî nevîyê Mele Xelîlê Sêrtî feqîfî kiriye. Ê ku bernavê Bedîuzzeman li Nûrsî kiriye ev Mele Fethullah e (Badıllı, 1990, rr. 76–77). Ji aqilan ne dîr e ku gava Nûrsî li wir dixwend *Nehcu'l-Enam* dîtibe û xwendibe. Ji xwe gava dibêje “li ba me” Hîzanê tîne bîra mirov.

Nûrsî dibêje, “Bizde gayet meşhur ve sözü hüccet bir zat-ı muhakkik, kürtçe demiş ki: لَوْ اَنَّ جَنَّتَيْنِ قَاتِلٌ وَ هُمْ قَتِيلٌ و قيل و قَالَ و قَالَ مَكَه قَالَ و قَالَ لَوْ اَنَّ جَنَّتَيْنِ قَاتِلٌ وَ هُمْ قَتِيلٌ (Ji şerê sehaban meke qal û qîl, lewra *cennetî* ne qatil û hem qetîl.) (2004d, rr. 64–65). Ev beyt di *Nehcu'l-Enamê* de wiha dibore:

“Ji *herba* sehaban meke qal û qîl

Bihîştî ne ew qatîl û hem qetîl” (Gözetin, 2015, r. 115).

Wekî tê dîtin Nûrsî, heman malîkê bi guherîna du peyvane neqil kiriye ku ew jî guhertoyên hev in.

Nûrsî di berhema xwe ya bi navê *Muhakematê* de wiha dibêje:

“Kürdçe demiş ki: عَنَاصِرُ چَهَارُنْ رَوَانِنْ مَلَكْ (Bi kurdî gotiye ku: Enasir çihar in ji wan in melek.) (2004e, r. 70).

Ev beyt di *Nehcu’l-Enamê* de wiha derbas dibe:

“Enasir çihâr in ji wan in melek

Wekî ins û cin nûr e qismê gelek” (Gözetin, 2015, r. 112).

1. Mele Xelîlê Sêrtî gotiye:

“Tu îmanê baweriyâ dil bizan

Mutîbûne Îslâm bi zahir bizan

Welêkin qe yek bê yekî nâbitin

Musilmanî bê her du wân nabitin” (Gözetin, 2015, r. 110).

1. Seîdê Nûrsî dibêje:

“Îmansîz Îslamiyet sebeb-i necat nêbûnê gîbî, Îslamiyetsîz îman da medar-î necat nêlê.” (Çawa ku Îslamiyet bêyî îmanê nabe sedema xelasîyê, îmana bêyî Îslamiyetê jî nabe wesîleya xelasîyê.) (2004d, r. 43).

Nûrsî, di îfadekirina vê meseleye de bi nêrîna Sêrtî re têkilîya navdeqîtî daniye.

2. Mele Xelîlê Sêrtî gotiye:

“Murîd e jî bo xeyr û şerran, welê

Rîza Wî tunîne bi şola nelê” (Gözetin, 2015, r. 111).

“Xuda Xalîqê cumle fîla te ye

Welê îxtiyarî bi destê te ye

Ew e mubdiê filâ kâsib tu wî

Cezakarê fîla ku talîb bûwî” (Gözetin, 2015, r. 116).

2. Seîdê Nûrsî dibêje:

“*Halk-ı şer, şer değil, belki kesb-i şer, şerdir. Çünkü, halk ve icad bütün netaice bakar. Kesb, hususî bir mübaşeret olduğu için, hususî netaice bakar.*” (Afirandina xirabîyê, ne xirabî ye, belkî kesba xirabîyê, xirabî ye. Lewre, afirandin û îcadkirin li hemû encaman dinîhêre. Kesb, ji ber ku tevgerîneke taybet e, li encamên taybet dinêre.) (2004d, r. 52).

Li vir tê dîtîn ku Nûrsî vê nêrîna Sêrtî bi kurtebêjeyekê formule kiriye: “Afirandina xirabîyê, ne xirabî ye, kesba wê, xirabî ye.”

3. Mele Xelîlê Sêrtî gotiye:

“Bi rûh û cesed ve birin ew suwar

Bi çavê serê xwe Xudê dî du car” (Gözetin, 2015, r. 113).

3. Seîdê Nûrsî dibêje:

“Her bir insan, akıyla, hayal süratinde seyeran; her bir velî, kalbiyle berk süratinde cevelân; ve cism-i nuranî olan her bir melek, ruh süratinde arştan ferşe, ferşten arşa deveran; ehl-i Cennetin insanları, burak süratinde, haşîrden beş yüz sene fazla mesafeden Cennete çıkmaları olduğu gibi, nur ve nur kabiliyetinde ve evliya kalblerinden daha lâtîf ve emvatın ruhlarından ve melâike cisimlerinden daha hafif ve cesed-i necmî ve beden-i misalîden daha zarif olan *ruh-u Muhammediyenin (a.s.m.) hadsiz vezaifine medar ve cihazatının mahzeni olan cism-i Muhammedî (a.s.m.), elbette onun ruh-u âlisiyle arşa kadar beraber gidecektir.*” (Her mirovek, wekî çawa ku bi aqilê xwe, seyrana bi şikilê xeyalî dike; her welîyek, bi qelbê xwe geryana bi şiklê birûskî dike; û her melayketekî ku ji cismê nûranî ye, di sûretê ruh de dewrana ji erş heta ferş, ji ferş heta erş dike; mirovên ehlê cenetê, di şiklê boraqê de, derketina qada cenetê ya ji pênc sed sal zêdetir dûr e, ruhê Muhemmed (e.s.s.) ê nûr û bi qabiliyeta nûrê yê ku ji qelbê ewlîyayan letîftir e, ji ruhê mirîyan û cismê melayketan siviktir e û ji cesedê stêrkî û bedena mîsalî zerîftir e yê ku bi bêhed wezîfeyan wezîfedar e û cismê Muhemmed (e.s.s.) ê ku mexzena hunerwerîya wî ye, helbet dê bi rihê wî yê alî re heta erşê biçe.) (2003c, rr. 606–7).

4. Mele Xelîlê Sêrtî gotiye:

“*Zulim nîn e edl e heçî ku biket*

Di mulkê xwe de ew teserruf diket” (Gözetin, 2015, r. 118).

4. Seîdê Nûrsî dibêje:

“Mülk Onundur; mülkünde istediği gibi tasarruf eder. Hem acaba, sanatkâr bir zat, bir ücret mukabilinde seni bir model yapıp, gayet sanatkârane yaptığı murassa bir libası sana giydiriyor; hünerini, maharetini göstermek için kısaltıyor, uzaltıyor, biçiyor, kesiyor, seni oturtuyor, kaldırıyor. Sen ona diyebilir misin ki, “Beni güzelleştiren elbiseyi çirkinleştirdin; bana oturtup kaldırmakla zahmet verdin”? Elbette diyemezsin.” (Milk ê Wî ye; çawa bixwaze dê wisa di milkê xwe de teserrufê bike. Gelo, zatekî hunermend, di muqabilê ucretekê de te bike modêl û cilekî gelek xweşik ê ku çêkiriye li te bike; da ku hunera xwe nîşan bide, kin bike, dirêj bike, bibire, jê bike, te rake, rûniştîne. Tu dikarî jê re bibêjî ku, “Te ev cil û bergên ku ez delal kiribûm ne xweşik kirin; bi rabûn û rûniştîne te ez nerihet kirim”? Helbet nikarî bêjî.) (2004d, r. 54).

Li pişt vê nêrînê ev qaîde heye: “Xwedîyê milk, di milkê xwe de çawa bixwaze bi wî awayî teseruf dike. Nûrsî nêrîna Sêrtî bi berfirehî îzah kiriye”.

5. Mele Xelîlê Sêrtî gotiye:

“Qe bê mulheza Wî tu tiştî mexwe”

“Tu navê Xudê bine dest pê bike

Wekî ku reha bû yî hemdê bike” (Gözetên, 2015, r. 126).

“Bi navê Wî her cari dest pê bike

Li nik axirê wanî hemdê bike” (Gözetên, 2015, r. 127).

5. Seîdê Nûrsî dibêje:

“O Mün’im-i Hakikî, bizden o kıymettar nimetlere, mallara bedel istediği fiyat ise üç şeydir: Biri zikir, biri şükür, biri fikirdir. Başta bismillâh zikirdir. Âhirde elhamdülillâh şükürdür. Ortada, bu kıymettar harika-i sanat olan nimetler Ehad, Samed’in mucize-i kudreti ve hediye-i rahmeti olduğunu düşünmek ve derketmek fikirdir.” (Ew Munimê heqîqî, ji me wekî berdêla wan mal û nametên biqîmet, fiyeta ku dixwaze sê tişt in: Yek jê zikir, yek jê şikir, yek jê fikir e. Di serî de bismillah zikir e. Di dawî de elhemdulillah şikir e. Di nîvî de, fikirîn û fêmkirina ku ev nametên newazeyên senet ên biqîmet mucîzeyên qudrêtê û diyarîyên rehmeta Ehed û Samed in fikir e.) (2003c, r. 13).

Nûrsî bêyî ku navê Mele Xelîlê Sêrtî hilde bi pesn û stayîş wesfê wî dide. Helbet cîyê vê rêbazê jî di qanûna peywendîya navdeqîtiyê de heye. Bi van mînakên û helbet ên ji Mela û Xanî jî hatine wergirtin mirov pê derdixe ku Nûrsî ji lîteratûra kurdî ya li derdorên medreseyan kurdan baş haydar e. Bikaranîna lîteratûra kurdî û wekî mexez û palpişt bikaranîna wê nîşaneyê qedirgirtin û pûtepêdana wê ye û haydarbûna ji keleşor, ziman û çanda kurdî ya Nûrsî ye.

BEŞA SÊYEM

3. RENGVEDANA ÇANDA KURDÎ YA FOLKLORÎK DI BERHEMÊN SEÎDÊ NÛRSÎ DE

Ji ber ku mijara xebata me li ser “çanda folklorî” ya gelê kurd e, bivê nevê divê em serê pêşî hinekî behsa têgiha “çanda folklorê” bikin. Sazîya bi navê *United Nations Educational, Scientific and Cultural Organization, UNESCOyê* (Sazîya Perwerde, Zanist û Kulturê ya Neteweyên Hevgirtî) di Danişîna 25em a Konferansa Giştî de ku rojên navbera 17ê Cotmeh û 16ê Sermaweza 1989ê de li Parîsê pêk anîbû, pêşniyaz dike ku folklor beşek ji mîrasya giştî ya mirovahîyê ye û navgîneke hêzdar e ku mirovên cîyawaz û komên sosyal tîn cem hev û nasnameyên xwe yê kulturî pê tînin holê. Lewra ew wekî biryareke giştî li dewletên ku endamên wê ne pêşniyaz dike ku folklorê hem mihefeze bikin (*conservation*) hem jî biparêzin (*preservation*).¹⁶ Ji ber ku folklorê gelê kurd jî beşek ji folklorê mirovahîyê ye, gelek normal e ku li ser wê jî xebatên parastinê bên pêkanîn.

Berî ku em li teyîsînên çanda kurdan ya folklorîk di berhemên Seîdê Nûrsî de bigerin û jê ra mînakên bidin, pêwîst e em hinekî bi giştî behsa “çanda gelan ya folklorî” bikin. Lewra em dê li vê derê serê pêşî dorê bidin agadarîyên tîkildarî têgiha folklorê, têgihên tîkildarî wê û peyra li gorî dîsîplîna wê, hêmanên folklorê kurdan ku di pirtûkên Rîsaleyên Nûr de derketine pêş, bi awayekî tesnîfkirî rêz bikin.

3.1. Foklor

Li gorî wateya ferhengî, bêjeya *folklorê* ku bêjeyeke îngilîzî ya hevedudanî ye û ji bêjeya *folk* (gel) û *lore* (zanist) pêk hatiye. Li gorî wateya terîmî, ji wî ilmî re folklor tê gotin ku çanda maddî û manewî ya gel, bi rêbazên xwe yê xweser dide hev û wan şîrove dike. Bêjeya *folklore* jî zimanê îngilîzî ketîye kurdî û ji alîyê cureyê xwe ve navdêr e, di ferhengê de li hemberî wê bi kurmancî bêjeya *zargotin*, *foklor*, *edet*, *çîrok* û *zargotina xelkê* hatiye dîyarkirin.¹⁷ Di zimanê erebî de ku jê re “adatu’ş-şe‘ab” [edetên gel] tê gotin (Sarı, 1991), ji alîyê folklornasên hemdem ên ereb ve pênaseyên cihêreng hatine kirin (el-Cewherî, 2006, rr. 21–22): “Foklor, Çanda Şîfahî ye, ango *Oral Tradition* e û ew edeba gelî ye ku bi awayê devkî tê neqilkin. Digel van hêlan,

¹⁶ bnr. UNESCO Türkiye Millî Komisyonu. (Tarîxa xwepêgihandinê: 22.01.2025; 20:44).

¹⁷ bnr. *Saladin's English-Kurdish Dictionary*.

ew bawerî, mûsîqî, govend-reqis û edetên gel ên anonîm jî di nav wê de tên hesibandin.”

Zanista gel (folklor) li welatên Rojava ji sala 1846ê û vir ve bi navê *folk* (gel) û *lor* (zanist) wekî têgih bi navê folklor hatiye binavkirin. Folklor heta wê gavê ne zanistêke serbixwe bû, tenê diyardeyên ku ne mijara zanistêke musteqîl bûn an jî di nav biwarê zanistên din de cih digirt bi rêbazên mexsûsê xwe vedikola (Boratav, 1969, r. 5). Xebatên akademîk ên derbarê folklorê de ku ji nîvê sedsala XIXem ve tên kirin, heke xebatên Mele Mahmûdê Bazîdî (1797-1867) li hêlekê bên hiştin, ji serê sedsala XXem ve edebiyata gel a kurdî bala lêkolerên kurd ên wekî Xelîl Xeyalî, Hilmîyê Siwêregî û Law Reşîd kişandiye. Ev xebat bi piranî yên berhevkarîyê ne, bi van xebatan hatiye xwestin ku giringî û dewlemendiya folklorê kurdî bê nişandan (Aslan, 2020)

Bi pênaseyeke din folklor ew zanist e ku çanda gel ya maddî û manewî li gorî rêbazên xwe yên taybet lêdikole, berhev dike, disenifîne, tehlîl dike û dinirxîne. Bi kurdî bêjeya folklorê tê wê maneya zanista gelêrî ku lêkolîna derbarê gel de ye. Di zaravayên kurdî de ji bo folklorê bi kurmancî “zargotin” û “zanista gel”, bi soranî “xelknasî” û bi kirdikî “zanistiya şarî” tê gotin (Yıldırım û êd., 2013, r. 11).

3.2. Çanda Kurdî

Bêjeya *çandê* ku bi piranîya zimanên dunyayê *kultur* e, di sedsala 18em de, bi rêya zimanê fransî ketiye nav zimanan. Wateya wê, awayê huner û jîyana wan civakan e ku di nav wan civakên din de ji hêla dam û dezgehên xwe yên civakî ve bi pêş ve çûne. Lyons, wateyeke antropolojîk a têgeha *çandê* dide. Li gorî wî çand, ji wê mîrasa ku hemû nirxên maddî û manewî yên civakekê re tê gotin ku merivên wê, bi rêya aîdiyeta xwe ya wê civakê, wê bi dewr digire (Demir, 2011, rr. 5–6).

Çand bi giştî ji bo koma norm û rêbazên civakî yên hevpar tê gotin. Çawa ku mîrateyên maddî yên mîna temtêla cil û bergan, lîstikên zarokan, karên midbexê dikevin bin banê çandê, mîrateyên manewî yên mîna helalî û heramî, galte û ayîn jî dikevin bin banê çanda manewî. Bi ser van de yekîtiya ayîn, nijad, dîrok, berhemên edebiyata gel ên mîna mamik, gotinên pêşîyan, ferheng û muzîkê jî dîsa dikevin bin banê çanda gelekî (Yıldız, 2024, r. 68).

Bi wateyeke berfireh çand, temamê wê tecrubeya maddî-manewî ye ku meriv, li gorî hebûna xwe ya ji ber pêdivîyên bîyolojîk û psîkolojîk teşe digire û bi rêya fêrbûnê înşa dike. Bi tevî van, ew nirx, meyl, hest, fikir, tevgerên civakî, teknoloji û hunera ku bi destê merivan çêdibe jî, di bin banê çandê de cih digirin. Ji bo her gelekî çandek heye. Meriv di nav kîjan civakê de bihe dinyayê û mezin bibe, hînî çanda wê civakê dibe. Lewra şexsek, di nav kîjan çandê de mezin bûbe, hînî kîjan çandê bûbe û xwe li gorî kîjan çandê bi rêk û pêk kiribe, êdî ji bo wî çanda neteweyî ew e (Çobanoğlu, 2012, r. 3).

Ked û xebatên li ser folklorê kurdî hatine kirin ne hindik in. Qismek ji wan jî yê derbarê zargotina kurdî de ne. Lîteratura tekstên zargotina kurdan li ser du beşan dikarin bîn dabeşkirin. Beşa ewil ji pirtûk û gotarên ku ji bo hînbûna zimanê kurdî pêk hatine. Xebatên M. Garzonî, E. B. Soane, A. Xaçeteryan, K. A. Bedir-Xan û êd. hinek ji wan in. Beşa duyem jî ji wan kar û barên çapbûyî yê ku ne tenê ji bo hînbûna zimanê kurdî her wisa ji bo nimûneyên jiyan, bîr û bawerîyên kurdan in ku bi raya zanyaran a cihanê bidin naskirin (Celîl & Celîl, 2013, r. 12).

Gelek teorîyên folklorê hene, yê bi vê xebatê ve zedetir eleqedar teorîyên metinnavedî ne. Lewra ev teorî metnên vegotina gelêrî ji bo xwe dikin bingeş, şirove û analîza xwe li ser wê ava dikin (Hikmet, 2016, r. 26). Ev teorî para zehf berhemên edebiyata gelêrî mînak werdigirin û li ser pêkhatin û geşedana berhemên nav çandê disekinin, dibêjin ka bê afirandinê berhemên çandî bi çi awayî pêk hatine? (Yıldırım û êd., 2013, r. 43).

3.3. Nimûneyên Çanda Kurdî ya Foklorîk di Berhemên Nûrsî de

Çand bi awayekî, şexsiyeta gel û neteweyan înşa dike. Berhemên rewşenbîr, nivîskar û hunermendan wekî berhemên neteweya wan tên hesabandin. Ji ber vê yekê rewşenbîr, nivîskar û hunermend bi awayekî siruştî berdevkî û temsîlkariya çanda gel û neteweya xwe dikin. Seîdê Kurdî jî bi awayekî siruştî ji çanda neteweya xwe sûd wergirtiye. Nûrsî bi vî awayî li xwe mikur tê: “Quretîya fitrî ya bi min re û pesindariya min a ji ber milliyetê û tehdîsa nîmetê ya ji aliyê meslekî ve û meyla rastîyê ya ku ji ber meşrebê min tê û meyla hişkî û xwenîşandanê ya ji ber qewmîyeta min tê, enanîyeteke raserî heqîqetê, di berhemên min de nîşanî mirovên şaş dide. Erê, enanîyet heye û ne ya min e; ya milletê min e, ezezî heye; ne ya min e; ya wan mîlyaketên medreseyê ye, yê ku em ji heman sinifî ne.” (2009, r. 10). Nûrsî tu carî nasnameya

xwe ya kurdî veneşartîye. Bi pratika xwe ya jiyanê ji karakterê xwe yê kurdî tawîz nedaye.

Ev nimûneyên li jêr delîl û îsbat in ku Nûrsî bi çi awayî ji çand û kelepura neteweya xwe sûd wergirtiye. Bi qasî ku em di pêvajoya vekolîna xwe de têgihaştin û em rast lê hatin, di vegêranên Rîsaleyên Nûr de hêmanên folklorê kurdan ên mîna efsane, destan, bawerîyên gel, dab û nerîtên gel, jîyana ehlê medreseyan, pêkenî, gotinên pêşîyan û nîfiran cih girtiye. Di vê rewşê de li gorî dîsîplîna folklorê me maf heye ku em hinek ji van hêmanên folklorîk di bin banê “berhemên edebîyata kurdî ya devkî” de binirxînin, hinekan wekî “bawerîyên gel” û yên din jî di bin banê “awayê lixwekirina cil û bergan” de bi cih bikin. Çunku Nûrsî giringîyeke zêde mezin daye lixwekirina cil û bergên folklorîk ên gelê kurd.

3.3.1. Vegêranên Edebîyata Gel

Li gorî pisporên zanista gel (Boratav, 1969, r. 52; Ekici, 2018, rr. 152–234) “vegêranên pexşan” ên gel, dabeşî cureyên mîna destan, efsane, hîkayeyên gel û çîrokan (xeberoşk) dibin; “vegêranên nezmî” yên gel jî dabeşî cureyên mîna kilam, lorî, manî, zûgotinok û destanên menzûm dibin. Gotin û îfadeyên qalibî yên gel ku hene, ji gotinên pêşîyan, îdyom, mamik (tiştanok), dua, nîfir, sond, gotinên argo, gotinên pêşîyan pêk tên. Ji bilî van, hin qadên din ên zanista gel hene ku wekî pîşe di nav gel de cihê xwe digirin. Hekîmtîya gel, hiqûqa gel (doza xwînê û mîras), roşan (wekî newrozê), bawerîyên têkildarî tiştan, bawerîyên têkildarî dînan, lîstikên şanoyî, lîstikên dawetan, lîstîka sersalê, dab û nerîtên têkildarî cil û bergan, hunerên gel ên mîna tevn û hûnanê û hunerên destan. Ji bilî van, pîşeyên gel ên mîna çêkirina dîzikan (çêkirina derdanên xwarinê), karê post û çerman, sifarcîtî, karê çêkirina zenbilan, nalbendî, karê çêkirina lihêfan, kulavkarî, çêkirina tiştên ji daran û kevçîkarî, koşkarî, kêrkarî û midbexa gel. Wekî din em dikarin pîşeyên mîna çêkirina cilên heywanan ên mîna kurtan û planan û materyalên nezerê jî bihejmêrin.

Em dibînin ku di Rîsaleyên Nûrê de ji berhemên edebîyata devkî ya gelê kurd, destan, efsane, hîkayeyên gel, gotinên pêşîyan û pêkenî, nîfir û biwêjên kurdî hene. Li vir em dê bi dorê mînakên wan ên ku teyîsîne ser Rîsaleyên Nûrê rêz bikin.

Vegêranên destanî ku mijara wan hîkayeyên lehengîyê ne, di bin banê folklor û edebîyata gel de cihê xwe digirin. Li gorî çavkanîyên edebîyata gel vegêranên

destanî, hîkayeyên lehengî yên kesên zemanê berê ji xwe ra dikin mijar. Bi taybetî ev berhemên menzûm, rûdan û herbên mezin ku hatine serê neteweyan derdirbirin (Evliyaoğlu & Baykurt, 1988, r. 101). Destan awayekî vegotinê ne, derbirîna hestan û fikirên gelî dikin. Piranîya wan helbestî ne. Bi dirûv û temaya xwe ji tekstên din vediqetin. Di kultura devkî ya gelê kurd de “vegêranên destanî” gelek in.

3.3.1.1. Kawayê Hesinkar

Li ser rûdan û hîkayeya Kawa û Dehhak, hîkayeyên cîyawaz ên efsaneyî di çavkanîyên nivîskî de hene. Yek ji wan jî *Gulistana* Sadî ye. Ev berhem di medreseyên kurdan de bi mebesta fêrbûna farisî dihat xwendin. Li gorî ku Sadî radigihîne, nexweşîyeke xirab li padîşahekî dikeve. Hin hekîmên yewnanî dibêjin ku dermanê vê nexweşîna te ziravê mirovekî bi van wesfan e. Padîşah ferman dike li her derê li mirovekî ku xwedîyê wan wesfan e digerin. Dawîyê li gundekî zarokekî bi wan wesfan dibînin. Padîşah gazî dê û bavê zarok dike, wan bi mal, milk û pereyan razî dike. Padîşah piştî wî ji qadî jî fitû werdigire. Zarok tînin meydanê. Cellat tê, amadehîya xwe dike, şûrê xwe dikişîne li hêvîya îşareta padîşah disekine. Tam di wê navê de zarok serê xwe hildide li jor dinihêre. Dikene û tiştinan dibêje. Ev kena zarok bala padîşahî dikêşe, dibêje:

“Kuro! Ma ev dema kenê ye, tu dikenî?”

Kurik wiha bersiv dide:

“Padîşahê min, nazîyên zarokan li dê û bavên wan dibihurin; daweyan dibin cem qadî; edaletê ji padîşahan dixwazin. Îcar were li vê ecêbê, dê û bavê min ji bo malê dinê ez teslîmî mirinê kirim; qadî fetwaya kuştina min da; padîşah jî siheta xwe di kuştina min de dibîne. Ji bilî Xwedê yekî xwe bispêrimê nema. Lewma min berê xwe bi jor ve kir; min edalet û merhemeta wî xwest. Ji ber ku min dizanî dê li min bê rihmê, kêfa min hat ez keniya.”

Li ser vê yekê padîşah kurik dibexşîne û gelek diyarîyan didê, dibêje: “Mirina min çêtir e ji rijandina xwîna bêgunehekî wiha” (Şîrazî, 1980, rr. 349–50).

Ji naveroka vê hîkayeyê diyar dibe ku Nûrsî vê meseleya xwe ji Sadî Şîrazî girtiye. Ji hêla din ve ev hîkayeya Şîrazî destana Kawayê Hesinkar tîne bîra mirov. Ji xwe Şîrazî berî ku vê hîkayeyê vebêje behsa *Şehnameyê* dike, wiha dibêje: “Rojekê di

meclîsa wî padîşahî de kitêba *Şehnameyê* dixwendin. Behsa ku dihat xwendin derbarê ruxandina selteneta Dehhak û bidestxistina Ferîdûn a seltenetê de bû.” (1980, r. 331).

Li gorî ku di *Şehnameya* Firdewsî de tê derbirîn, bavê Dehhak hukumdarekî di rêya Xwedê de bû. Dehhak bi xebera Şeytên dixape, bavê xwe dikuje û li şûna wî rûdinê. Piştî wî, Şeytan dikeve dilqê aşpêjekî û dibe aşpêjê wî. Wî zemanî goştê heywanan kêr e, mirov bi piranî bi gil û giya debara xwe dikan. Şeytan goştê teyr û tilûran û yên heywanên teba dide Dehhak da ku cereeta wî zêde bibe, wekî şêran wî xwedî dike. Her roj ji ya din xwarinên xweştir dide Dehhak. Dehhak, wekî berdêla vê qencîyê dê daxwazeke Şeytên pêk bîne. Şeytan dixwaze herdu sermilên wî maçî bike. Gava ku maçî dike ji holê wenda dibe. Piştî wî, du marên reş di sermilên Dehhak de dertên. Her ku wan dibire, wekî şaxên daran dîsa dirêj dibin. Tu derman ji wan re nayê dîtîn. Şeytan vê carê di şiklê hekîmekî de tê cem Dehhak û dibêjê:

“Dermanê te mejîyê mirovan e, ger tu bidî wan maran wê bi domana demê re bimirin.”

Dehhak her roj du mirovan dide kuştin, mejîyê wan dide wan maran. Piştî wî, li Îranê tevlihevî çêdibe, însan tên ber qaqa reş. Du mirovên qenc ji bo alîkarîya mirovan bikin diçin dibin aşpêjên Dehhak. Her roj ji wan mirovên ku dê serê wan bê serjêkirin yekî ji wan berdidin û dişînin çiyê û ji dêvla wî ve serê mîyekê jê dikan û mixê wê didin maran. Firdewsî dibêje, ew kesên ji mirinê xelas bûne pêşîyên kurdan in (1980, r. 59). Dehhak di xewnekê de dibîne ku Ferîdûn gurzekê li serê wî dixê, wî dixê erdê, dest û pîyê wî girê dide wî kaş dike dibe çiyayê Dewamendê. Zîrekek tabîra xewna Dehhak dike, jê re dibêje:

“Yekî bi navê Ferîdûn ku hê nehatiye dinyayê piştî ku mezin bibe, dê te sernixûn bike û li ser textê te rûnê.”

Piştî tabîrkirina vê xewnê Dehhak ne dixwe, ne vedixwe û ne radizê, li çar alîyên cîhanê bi pey şopa Ferîdûn dikeve. Diya Ferîdûn ji bo ku wî biparêze wî dibe ciyekî, teslîmî mirovekî qenc dike. Di vê navê de Dehhak bavê Ferîdûn jî dikuje. Piştî Ferîdûn dikeve 16 salîya xwe ji çiyê dadikeve. Ji diya xwe esl û esasê xwe û qatîlê bavê xwe ku Dehhak e hîn dibe. Dehhak ji alîyekî ve zilma xwe didomand ji alîyê din ve berateke ku tê de dinivîsî “Dehhak mirovekî baş e” û bi rûsipîyên welêt dida

îmzekirin. Di wan rojan de Kawa derdikeve dîwana Dehhak û dawa edaletê lê dike. Dehhak dibêje:

“Min çi neheqî li te kiriye?”

Kawa dibêje:

“18 kurên min hebûn, te 17 ji wan kuştin, yek maye wî ji min re bihêle.”

Dehhak dibêje:

“Ezê kurê te bibexşînim bi şertê ku tu vê berata min îmze bikî.”

Gava Kawa beratê dixwîne berê xwe dide girseyê û dibêje:

“Tîrsa Xwedê ji dilê we çûye. Tîrsa min ji padîşah nîne û vê beratê jî îmze nakim.”

Ew, wê beratê diçirîne û davêje. Radihêje destê kurê xwe ji serayê dertê. Kawa gava digihêje sûkê xelk li dorê dicivin. Kawa wan teşwîqî heqxwestinê dike. Pêşmala xwe ya çerm a hesinkarîyê bi serê mizraqekê ve dike û dide pêşîya xelkê û wiha qîr dike:

“Kî piştgirîya Ferîdûn bike dê ji bin nîrê Dehhak bifilite!”

Ferîdûn ji xwe re li ba hedadan gurzekê dide çêkirin. Radihêje alaya Kawa û bi rê dikeve, qesta seraya Dehhak dike. Dergevanên serayê dikuje. Diçe ser textê Dehhak rûdinê, taca padîşahîyê dide serê xwe. Dehhak wî çaxî li Hindîstanê ye, gava tê, xwe bi zirhan dinuxumîne û bi dizî dikeve nava sarayê. Ferîdûn wî dibîne û gurzekê li nava serê wî dixê. Dest û pîyên wî hişk girê dide û wî dibe çiyê dixê şikeftê dadileqîne (Firdevsi, 1994, rr. 56–96). Çawa ku ji kurtêya destanê jî diyar dibe serlehengê wê ne Kawa ye Ferîdûn e. Rast ku Kawa bi sekna xwe û pêşmala xwe ya hesinkarîyê ya wekî ala bi kar anîye serhildan daye dest pê kirin lê lehengê sereke yê destanê Ferîdûn e. Çi heye destan bi navê Kawayê Hesinkar berbelav bûye.

Ev mesele wiha teyîsîye nav berhemên Bedîuzzaman:

“Bir zaman, bir padişahın müptelâ olduğu bir hastalığın ilâcı, bir çocuğun kanı imiş! O çocuğun pederi, çocuğu, hâkimin fetvasıyla bir para mukabilinde padişaha vermiş. Çocuk, mecliste ağlamak ve şekva yerine gülmüş. Sormuşlar:

“Neden istimdad etmiyorsun, şikâyet etmiyorsun, gülüyorsun?”

Demiş ki:

“İnsan, musibete giriftar olduğu vakit; evvel pederine, sonra hâkime, sonra padişaha şekva eder. Benim pederim, beni kesilmek için satıyor; işte hâkim de ölmekliğime karar veriyor; işte padişah benim kanımı istiyor... Bu antika ve pek garib ve şekli çok çirkin ve hiç görülmemiş bu hâle karşı, ancak gülmek ile mukabele edilir.” (Komisyon 2004, r. 234).

(Zemanekê, nexweşînek li padîshahekî ketîye û dermanê wê nexweşînê xwîna zarokekî bûye! Bavê wî zarokî, zarok, bi destûra hakim di muqabilê mîqdarek pere de daye padîşahî. Zarok, di meclîsê de ji dêvla bigirî kenîyaye. Jê pirsîne:

Tu çima alîkarîyê naxwazî, şîkayetê nakî, dikenî?

Gotiye:

Gava mirov giriftarê musîbetekê dibe; pêşî ji bavê xwe re, dûvre ji hakim re, dûvre jî ji padîşah re gilî dike. Bavê min, da ku min serjê bikin difiroşe; hakim biryara mirina min dide; padîşah jî xwîna min dixwaze... Li hember vê rewşa entîke û gellekî xerîb û gellekî kirêt û qet nehatiye dîtin, ancax bi ken dikare muqabele bê kirin.) Bi îhtîmaleke mezin Nûrsî, dema li medreseya dixwend rastî vê efsaneyê bûye.

3.3.1.2. Kela Dimdimê

Destana *Kela Dimdimê* li ser rûdaneke dîrokî ya rasteqîn hatiye derbirîn. Destaneke mêrxasî û welatparêzîyê ye. Kela Dimdimê dikeve başûrê rojavayê Êrmiyeyê, 18 km jê dûr e. Li ser zinarekî bilind ê bi navê Dimdim hatiye avakirin. Ev keleh berî Îslamê ava bûye. Emîrxanê Biradostî ew kela kevin ji nû ve ava kirîye. Dorpêça Kela Dimdimê di sala 1608ê de dest pê kiriye û heta dawîya sala 1609ê bi têkçûna bera Xanê Lepzêrîn ê Biradostî qedîyaye (Kaplan, 2015, r. 13).

Mele Mahmûdê Bazîdî di berhehema xwe ya bi navê Camî'ya Risaleyan û Hîkayetan Bi Zimanê Kurmancî (2010, rr. 114–17) de bi sernavê “Hîkayeta Sîûçaran” çîroka Destana Kela Dimdimê bi pexşanî nivîsandîye.

Ji vê beşa destana *Kela Dimdimê* diyar dibe ku Nûrsî jê îstîfade kirîye. Di varyanteke vê destanê de bûyera behsa wê tê kirin di navbera Şah, Xan û şivanekî de dibore. Nûrsî heman meseleyê wekî ku di navbera du şivanên ehlêqelb de dibore

vedibêje. Varyantên vê destanê yên din jî hene. Di varyanteke din a pexşanî de weke ku ev bûyer di navbera Xan û şivanekî de dibore hatiye neqilkirin (Kızıl, 2016).

“Bir zaman ehl-i kalp iki çoban varmış. Kendileri ağaç kâsesine süt sağıp yanlarına bıraktılar. Kaval tabir ettikleri düdüklerini, o süt kâsesi üzerine uzatmışlardı. Birisi uykum geldi, deyip yatar. Uykuda bir zaman kalır. Ötekisi yatana dikkat eder, bakar ki sinek gibi bir şey, yatanın burnundan çıkıp süt kâsesine bakıyor ve sonra kaval içine girer, öbür ucundan çıkar gider, bir geven altındaki deliğe girip kaybolur. Bir zaman sonra yine o şey döner, yine kavalıdan geçer, yatanın burnuna girer; o da uyanır. Der ki: Ey arkadaş! Acib bir rüya gördüm. O da der: Allah hayır etsin, nedir? Der ki: Sütten bir deniz gördüm. Üstünde acib bir köprü uzanmış. O köprü'nün üstü kapalı, pencere idi. Ben o köprüden geçtim. Bir meşelik gördüm ki başları hep sivri. Onun altında bir mağara gördüm, içine girdim, altın dolu bir hazine gördüm. Acaba tabiri nedir?” (2004d, rr. 95–96).

(Zemanekî du şivanên ehlê qelb hebûne. Ji xwe re şîr dotin kasikeke darîn û danîn ber xwe. Bilûra xwe danîbûn ser wê kasikê. Yekî ji wan got xewa min hat û raza. Demekê di xew de ma. Yê din bala xwe dide yê razayî, tiştêkî wekî mêşê, ji pozê wî dertê li kasikê dinêre û piştî wî dikeve qula bilûrê, di wî serî re dertê diçe, dikeve quleke di bin gûnîyekê de wenda dibe. Piştî demekê dîsa ew tişt vedigere, dîsa di bilûrê re derbas dibe, dikeve pozê yê razayî; ew jî şiyar dibe. Dibêje: Hevalo! Min çi xewneke ecêb dît. Ew jî dibêje: Xwedê xêr bike, çi ye? Dibêje: min behreke ji şîr dît. Pireke ecêb li ser bû. Pireke sergirtî ya bipencere bû. Ez di wê pirê re derbas bûm. Min devîyeke bisitirî dît. Di binê wê de şikeftê hebû, ketime şikeftê, çi bibînim xizîneyek tije zêr. Gelo tabîra wê çi ye?)

Di destana *Kela Dimdimê* de ev hîkaye bi rêya neqilkirinê wiha hatiye derbirîn:

Rojek ji nava rojan e
Şahî got: “Hey Xan e Xan e
Bêhnek biçîn rav û seyran e
Rav berdeyn Deştê Hozan e”

Rojêk ji rojên Xudê ye
Xan û Şah herdû çûyîne
Nava deştê da meşîne

Ser kerek pezî helbûne
Nik şivanî rûniştîne

Şivanî wê lezandiye
Miheke reş bo dotiye
Tijî kodê şîr kiriye
Deyna ber Xan û Şahî ye

Bilûrbêj e tembûrvan e
Kîs hejandî ber tilyan e
Tembûr êxist ber milan e
Bilûr êxist ber lêvan e
Anferim Xanê Kurdan e

Xewa Şahî wê hatiye
Xanî bilûr bo gotiye
Şahî di ber ra xew çûye
Xanî bilûr betal kirî
Deynabû ser kodê şîrî
Wêkî pirekê çêkirî

Şahî xewna xwe dîtiye
Xanî bi çavêd xwe dîtiye
Tişabetek ‘ecêbiye
Mêşek kepê Şahî derkeftiye
Textena kodê kiriye
Hindava koda şîriye
Nav bilûrê ra çûyiye
Li ser berekî rûniştiye

Mêş ji ser berî rabûye
Ji bilûrê derbaz bûye
Textena Şahî kiriye
Çûye ser lêva Şahiye

Nav difna wî ra çûyiye

Xan dimînît tê difukurît
‘Ecêbiyan jê werdigirît
Aql û sewda bo namînît

Şah kenî û girnîjiye
Cihê xwe helcîniqiye
Xewa şîrîn hişyar bûye

Şah ji xewê cîniqiye
Got: “Xano min xewnek diye
Xewin nîne ‘ecêbi ye

Ser behreke spî ra çûme
Pira kun ra derbaz bûme
Ser gencxanekê helbûme

Min dîtî behreke spiye
Pira darîn ser bestîye
Ez xwe ser ra derbaz bûme

Min dît xizînêd zêrîne
Derêd wan qafle kirîne
Senede zor pê birîne
Berê reş da nivîsîne
Rast e derew qet tê nîne

Xane Xane herê Xan e
Min xewnek dîtî çavan e
Bo min bêje te’bîran e”

Xanî got:
“Xewin nîne ew xeyal e

Xeyala xizîne w mal e
Xewnerojka pûç û betal e
Hindî xewnêd di rojê ne
Şîrîn in ji keyfe têne
Lew çî te' bîr bo nehêne,

Şahî bêjim te' bîr çî ye?
Xewinrojke te dîtiye
Xewnêd rojê te' bîr niye
Ber Şahî berze kiriye”

Xan û Şahî wê rabûne
Ji zozanê zivirîne
Qesta mala xwe kirîne

Qedereke zor çûyiye
Xan wê paş da ziviriye
Hecetek bo xwe girtiye
"Min gustîra xwe bîr kiriye"

Şahê Ecem d' bêjite Xanî
“Were neçe nezivire
Dideme te gustîrek çêtir e
Her daîm digel xwe hilgire”

Xan dibêtê “Şahî xweş bît
Nê hindî gustîra min e
Ser heye navê babê min e
Heta mirnê digel min e”

Xan di rêkê ziviriye
Dol û milkan serkeftiye
Textena mukrê kiriye
Girkê gencê kolayiye

Berek ji kelekê rakiriye
 Kulozek jê derkeftiye
 Derê kulozê vekiriye
 Kaxezek tê da dîtiye
 Kaxez ser êk nivîsiye
 Xanî kaxez helgirtiye
 Paxla çepê heşandiye
 Lot ber lotê bişkiftiye
 Hat û gehişte Şahiye
 Hemî ji Şahî veşartiye (Kaplan, 2015, rr. 56–61).

Bikaranîna dîyardeyên çanda kurdî tevgerake Nûrsî ya siruştî ye yan tercîheke têgihîştî ye baş nayê fêmkirin. Bi her kul û halî bikaranîna dîyardeyên bi vî awayî girêdan û henûnîya wî ya li hember çanda kurdî destnîşan dike.

3.3.2. Pêkenî

Keçel wekî têgeh peyveke qerfî ye, zehfê caran ji bo sempatîzekirinê tê bikaranîn. Nûrsî bi vê peyva kurdî ya qerfî henek bi şagirtên xwe kirine:

“Keçeli [Keçelê] Salâhaddin, tam bir Abdurrahman'dır; kahramanlıkta babasından geri kalmak istemiyor.” (2003a, r. 107).

(Keçelê Salahaddîn, Abdurrahmanekî tamam e; di lehengîyê de naxwaze ji bavê xwe kêmbimîne.)

Balkêş e, ev heneka Nûrsî ya “keçel” an “keçelê keçel” ji ber şibihandina peyva tirkî “keçe” (kulav) û “keçeli” (bikulav/kulavî) wekî leytmotîfekê ketiye ser zimanê şagirtên Nûrsî. Di nav xwe de wekî peyveke tinazkirinê bi kar tînin lê ne bi wateya wê ya kurdî.

3.3.3. Nifir

Wekî ji çavkanîyên li ber wan hatine destnîşankirin jî diyar e Nûrsî di berhemên xwe yên bi tirkî de hinek nifirên kurdî bi kar anîne:

“Ben de hiddet ettim, ‘Kapıları kapansın’ tekrar ile dedim.”... “Ben de yine: ‘Kapıları kapansın, neden böyle yapıyorlar!’ dedim.” (2005, r. 329).

(Ez jî hêrs bûm. Min li ser hev got, “Bila derîyê wan bê girtin”. Min jî dîsa got: “Bila derîyê wan bê girtin, çima wisa dikin.”). Ev nîfir bi vê maneyê ye: Derîyê wan kilît bibe/derîyê wan mor bibe (Uyanîk, 2017, r. 52).

“Senin bu iki elin kırılısın” (Bediüzzaman Said Nursî, 2004c, r. 148). (Bila ev her du destên te bişikên) (Uyanîk, 2017, r. 17).

“Şu iki pis hediyen senin başını yesin.” (Bediüzzaman Said Nursî, 2004c, r. 148). (Bila ev her du dîyarîyên te yên genî serê te bixwin.) (Uyanîk, 2017, r. 64).

Dibêjin mirov di pêşîrtengîyê de li şexsîyeta xwe ya resen vedigere. Nûrsî kêman nîfir kirine, ew jî hema bêje hemû bi mantelîteya kurdî ne.

3.3.4. Gotinên Pêşîyan

3.3.4.1. Kurê Pîrê û Navdarî

Nûrsî digel bi tirkî nivîsîye jî gotinên pêşîyan ên kurdî bi kar anîye. “Nasıl ki böyle şöhret divanelerinden birisi, namazgâhı telvis etmiş, tâ herkes ondan bahsetsin.” (Bediüzzaman Said Nursî, 2004c, r. 113).

(Çawa ku yekî weha li pey şohreta navê xwe bû, nimêjgeh qirêj kiriye, da ku her kes behsa wî bike.) Kurd/herêma Xerzan dibêjin, “navê kurê pîrê tunebû, çû ser ferşê kanîyê/nimêjê gû kir”.

3.3.4.2. Dema Mûsîbetê Dirêj e

“Musibet zamanı çok uzundur, safa zamanı pek kısa oluyor.” (Bediüzzaman Said Nursî, 2004c, r. 248).

(Dema musîbetan gelekî dirêj e, dema sefayê pir kin e.) Kurd dibêjin, “Tengî dûvdirêj in, firehî dûvkurt in.”

3.3.4.3. Destê Zehmet li ser Dilê Rehet

“Rahat, zahmette; zahmet, rahattadır.” (Bediüzzaman Said Nursî, 2004c, r. 159).

(Rihetî, di zehmetîyê de; zehmetî di rihetîyê de ye.) Kurd dibêjin, “Destê rihet, li ser zikê birçî ye.”

3.3.4.4. Navê Gur Bîne Palandar Lê Werîne

“Hatta Kûrtçe durub-u emsaldendir: نَابُ كُزْبِيَّه پَالَانْدَار لِي وَرِيَّه Yani, “Kurdun bahsini ettiğin zaman topuzu hazırla, vur; çünkü kurt geliyor.” (Bediüzzaman Said Nursî, 2004d, r. 393).

(Hetta ji derbûmeseleyên kurdî ye: Navê gur bîne palandar lê werîne.) Behsa gur e gur hazir e. Behsa gur bike, dar amade bike (Tîgrîs, 2009, r. 22).

3.3.4.5. Xwedê Meriv Şaş Neke

خدا مروشاش دکه کاش نکه کاش دکه فحش نکه فحش دکه پرش نکه پرش دکه پریشان نکه پریشان دکه
مشوش سرکردان نکه

“Allah kimseyi şaşırtmasın, şaşırtırsa süründürmesin, süründürürse de fahişce etmesin, fahişce ederse, şişirip kabartmasın, şişirip kabartırsa da, perişan etmesin, perişan ederse de sersem ve serhoş, âvâre etmesin” (Bediüzzaman Said-i Nursî, 2004, r. 116).

(Xuda mirov şaş dike kaş neke, kaş dike fehş neke, fehş dike perş neke, perş dike perîşan neke, perîşan dike mişeweş û sergerdan neke.)

Gotinên pêşîyan remz û nîşanên çanda neteweyan, xusûsiyetên zimanê wan û kodên exlaqê wan dihundirînin. Gotinên pêşîyan li gorî parzemînan, malbatên neteweyan, nijadan û dînan dikare biguherin. Wate, gotinên pêşîyan pênasîya xwediyê xwe dikin.

3.3.5. Îdyomên Kurdî

Erê Nûrsî bi tirkî nivîsiye lê ji ber ku bi kurdî fikirîye wekî ji mînakên li jêr jî dîyar e wî îdyomên kurdî rasterast wergerandine tirkî û daye nivîsîn.

“İşte, tahmin ederim ki,... Eğer deseler ki, bunların yüzlerini hayırlı şeylere çeviriniz, mecralarını değiştiriniz.” (2003a, r. 43). (Ev e, texmîn dikim ku... Eger bejin ku ruyê wan vegerînin tiştên baş, rêçika wan biguherînin.) Berê wan bidin rêya xêrê.

“Sizin minnetiniz dağ başında olsun” (2004a, r. 80). (Bila mineta we li serê çiyê be!) Mineta te li kaşê hanê (Farqînî, 2004, r. 1220).

“Gerçi yeriniz çok dardır, fakat kalbinizin genişliği o sıkıntıya aldırılmaz.” (Nursî, 2005, r. 338). (Rastî cîyê we teng e, lêbelê firehîya dilê we dê bi wê tengasîyê re sereder bike.) Cih ji dilan fireh e, cih ji dilan teng e (Tîgrîs, 2009, r. 43).

Yoksa, “yürüyüşünü terk ile başkasının yürüyüşünü öğrenmedi” ile mâsadak olacağız (Bediüzzaman Said Nursî, 2004a, r. 173).

(Nexwe, em ê bibin wekî wî yê ku “Dev ji rêveçûna xwe berda ya xelkê jî hîn nebû.”)

Kurd dibêjin, qijikê çav daye rêveçûna kewê, bi ser neketiye, îcarê li ya xwe vegerîyaye ew jî ji bîr kiriye. Lewma carina normal dimeşe û carinan jî bi çindikan xwe wekî kewê hildavêje. Hayreddin Kızıl (2016) di gotareke xwe de diyar dike ku ev meselok li ser rovîyekî ku çav daye rêveçûna şêr an qijikeke ku çav daye rêveçûna kevokê neqil dike.

“Dünyayı başıma ateş yapsanız,” (Komisyon, 2004, r. 684). (Hûn dinyayê li sere min bikin agir/Hûn agir li serê min rakin.)

Agir bi ser serê (yekî) de barandin. Agir bi ser serê (yekî) vêxistin (Borak, 2005, r. 33,36).

Ev tişt Nûrsî lî vê derê kiriye anku biwêjên kurdî bi maneyên wan ên ferhengî wergerandiye tirkî, li gorî rêçikên zimanzanî û zanîsta wergerê ne rast in. Divîyabû îdyomên tirkî yên bergîndê wan bi kar banîya lê wisa nekiriye.

3.4. Derbûmeselên Gel ên Folklorîk

Ev kevneşopa Rojhilatî ya vegotina bi derbûmeseleyan li nav kurdan jî gelek berbelav e, Nûrsî jî jê kêr nemaye, gelek caran wekî rêbaza derbirînê bi kar anîye.

3.4.1. Vizviz ji Te Hingiv ji Min

“Kürdlerin emsal-i edebîyesindendir: Bir adamın ismi a[E]lo imiş. Bal hırsızlıyordu. Ona denildi; hırsızlığın tebeyyün edecektir. O da aldatmak için bir boş petekte yabancı arıları doldurup balı başka yerden hırsızlar, küvar (kewar peyveke kurdî ye) da saklıyor idi. Biri sual etse idi, derdi: “Bu, bal mühendisi olan arılarımın sanatıdır.” Tanin sizden, bal benden هَنْكَيْنِ زَوَهَ فَطْ فَطْ derdi. Yani: “Tanin sizden, bal benden...” (Bediüzzaman Said Nursî, 2004e, r. 22).

(Ji meselokên edebiyata kurdan: Navê yekî Elo bûye. Hingiv didizî. Jê re gotin; dê dizîya te eşkere bibe. Wî jî da ku bixapîne mozeqirtik dixistin şanikeke vala û hingiv didizî di kewarê de vedişart. Yekî bipirsîya digot: “Ev, hunera mêşên min ên muhendîzên hingiv in.” Piştî wî gava bi mêşên xwe re diştexilî, bi zimanekî muşterek digot: “Viz viz ji we hingivîn ji min.” Yanî: “Tin tin ji we hingiv ji min...” Viz-viz ji te, hingiv ji min (Tîgrîs, 2009, r. 241).

3.4.2. Îşê Herî Zehmet

“Benim kendi hattımla mektub istiyorsun. Bir dudaksız adama, ‘Lâmbayı üfle söndür!’ demişler. Demiş, ‘En zahmetli işi bana gösteriyorsunuz, yapmayacağım.’ Belî, Cenab-ı Hak bana hüsn-ü hat vermemiş, hem bir satır yazmak bana büyük bir iş gibi usanç veriyor.” (Nursî, 2002, r. 86). (Tu nameyeke bi destnivîsa min dixwazî. Ji mirovekî bêlêv re gotine, “Pif bike lembeyê bitefine.” Gotiye, “îşê herî zehmet hûn bi min didin kirin, natefînim.”)

Ev mesele li dora Mêrdînê li nava gel tê gotin. Me varyanteka wê ji devê şênîyekî Dêrika Çiyayê Mazî girt (Ç4): “Zemanê berê bi şev zîlam diçûn odeya gund û dereng vedigerîn mala xwe. Zarok û zêç û pîrek ji ber karê bêrîyê filan û bêvanê û paliyê zû radizan. Vêca çira, werê di kulekê de bû, yê herî paşî bihata, wî pifî çirayê dikir û diket nav cîya ku kes pêl hev nekin. Vêca dibê xwedîyê malê devê wî wek felcî xwar û çavê wî jî şaş bû, dibê îca ji odaya gund vegerîyaye, malîyê wî gotiyê “Hema pifî çirê ke wer rakeve.” Dibê wî jî rebeno dibir ber devê xwe pif dikirê hewa wî nedidî, dibir ber çavê xwe çenedibû îcar devê wî nedihat texmê, dikir nedikir lê heyirî nedikarî vemiranda, digot: “Zaten çi karê zor hebe hûn li benda min dihêlin.”

3.4.3. Padîşah Çi Dike Axayê Me Dizane?

Bizde sâde-dil, bir taife var ki, eskiden diyorlardı ki, “Padişah, kendi ocağı yanında ve tenceresinin başında, pişirdiği bulgur çorbası yanında ne yapıyor; bizim ağamız onu biliyor.” (Nursî, 2003c, r. 368).

(Li ba me hinekên dilsaf hebûn, berê digotin ku, axayê me bi rewşa Padîşah a ku li ber tifika xwe ye, di beroşa wî de şorbeya savarê dipije çi dike dizane.)

3.4.4. Xwedê Mezin e

“Darb-ı mesel hükmünde büyük musibetlere ve büyük maksadlara karşı, herkes "Allah büyüktür, Allah büyüktür" der.” (Bediüzzaman Said Nursî, 2004b, r. 55).

“Li hember musîbet û daxwazên mezin ên wekî derbûmeseleyan, her kes dîbêje, “Xwedê mezin e, Xwedê Mezin e.”

Dema bûyerek bi serê kurdekî ve tê, ji bo ku ew wî teselî bikin li ber dilê wî bidin dibêjinê, “Xwedê mezin e, Xwedê mezin e.” Carinan jî ji bo başebaşî xwestinê wekî tehdit dibêjin, “Xwedê ji min û te re mezin e!”

3.4.5. Merdîfîya Dayîkê

“Bir vakit bir kadının sekiz oğlu varmış. Her birisine mevcut sekiz ekmekten birer ekmek verdi, kendine kalmadı. Sonra, her birisi ekmeğinin yarısını ona verdi. Onun ekmeği dört oldu; ötekiler yarıya indi” (Bediüzzaman Said Nursî, 2004c, r. 347).

(Demekê jinikeke ku heşt kurên wê hebûn, ji heşt nanê ku hebûn her yek ji wan nanekî da wan, jê re nema. Piştî wî, her yek ji wan nîv nanê xwe danê. Ê wê bûne çar nan; para her yekî ji wan daket nîvî.)

Ev derbûmesel di nav kurdan de gelek berbelav e. Li hin cîyan li ser parvekirina hêkan dibêjin, dayik dibêje ji min re nema her yek ji we zerika hêka xwe bidin min bes e. Di varyanteke din de, kevçî ji dayîkê re namîne, ji zarokên xwe re dibêje; bila diya we kulê bixwe hûn bi kevçî bixwin bila ew bi heskê bixwe. Nûrsî jî ji bo xweîfadekirinê gava lazim bûbe ev derbûmeselên kurdan bi kar anîne.

3.4.6. Kerpîçê Qesra Cennetê

Nûrsî, çawa ku di vegotin û xweîfadekirinê de ji îdyom, gotinên pêşîyan û adetên gelêrî îstîfade kirine, ji vê mînaka li jêr dixuyê ku ji menqibeyan jî îstîfade kirine.

“Eskiden bir zat, haremiyle beraber büyük bir makamda bulundukları halde, maişet müzayakası yüzünden haremi, demiş zevcine: “İhtiyacımız şeditir”. Birden, altundan bir kerpiç yanlarında hazır oldu. Haremine dedi: “İşte Cennetteki bizim kasrımızın bir kerpici dir.” Birden o mübarek hanım demiş ki: “Gerçi çok muhtacız ve ahirette de çok böyle kerpiçlerimiz var; fakat fani bir surette bu zayi olmasın, o kasrımızdan bir kerpiç noksan olmasın. Dua et, yerine gitsin; bize lâzım değil.” Birden

yerine gitti. Keşf ile gördüler diye rivayet edilmiş.” (Bediüzzaman Said Nursî, 2004d, r. 63).

(Zemanekî zatek hebûye, ew û hermeta xwe digel ku di meqamekî manewî ê bilind de bûn, ji ber destengîya debarê hermeta wî jê re gotiye: “İhtîyacîya me diyar e”. Bi carekê kelpîçek zêr li ber wan hazir bûye. Ji hermeta xwe re gotiye: “Va ye kerpîçek ji qesra me ya Cenetê.” Demildest wê hermeta qenc gotiye: “Gerçî em gelek muhtaç in û li axretê gelek kelpîçên me yên wiha hene; lêbelê bila ev bi vî awayê fanî berze nebe, bila ji wê qesra me kelpîçek kêr nebe. Dua bike, bila here cîyê xwe; ji me re ne lazim e.” Bi carekê çûye cîyê xwe. Rîwayet hatiye kirin ku ev yek bi rîya keşfê hatiye dîtin.)

Wekî amadekarê vê xebatê; di biçûkahîya min de rewşa me ya aborî ne ewçend baş bû, bavê min hertim ev menqîbe ji me re digot. Li nav kurdan tesîra terîqetan gelek xurt e. Ev yek jî dihêle ku tesewuf û rîtuêlên tesewufê sîrayetî nav çand û edebiyata wan bike. Normal e ku li vegotina Nûrsî jî tesîr kiribe.

3.4.7. Hejmara Murîdên Şêxekî

“Eski zamanda bir şeyhin müridleri pek çok olmasından, o memleketin hükümeti siyasetçe telaş edip onun cemaatini dağıtmak istemiş. O zat, o hükümete demiş: ‘Benim yalnız bir buçuk müridim var, başka yok. İsterseniz tecrübe edeceğiz.’ O zat, bir yerde çadır kurdu, kendi binler müridlerini oraya toplattı, emretti: Ben bir imtihan yapacağım. Her kim benim müridim ise ve emrimi kabul etse, Cennete gidecek. Çadıra birer birer çağırdı. Çadırın içinde gizli bir koyun kesti; güya has bir müridini kesti, Cennete gönderdi. O kanı gören binler müridler, daha hiçbir şeyhi dinlemediler, inkâra başladılar. Yalnız bir adam dedi: Başım feda olsun. Yanına gitti. Sonra bir kadın dahi gitti, başkaları dağıldılar. O zat, hükümet adamlarına dedi: İşte benim yalnız bir buçuk müridim bulunduğunu gördünüz.” (Nursî, 2005:350).

(Zemanekê ji ber ku mirîdê şêxekî gelek bûne, hikûmeta wî welatî endîşeya siyasî kirîye û xwestîye cemaeta wî bifeşilîne. Wî zatî, ji hikûmetê re gotiye: “Mirîdek û nîvê min heye, ji bilî wan nînin. We divê em biceribînin.” Wî zatî, li cîyekî çadirek veda, bi hezaran mirîden xwe li wir civand û ferman kir, got: “Ez ê îmtîhanekê bikim. Her kî mirîdê min be û fermana min bi cî bîne dê here cennetê.” Wî hebo hebo ew vexwendin çadirê. Di çadirê de bi dizî pezek serjê kir; xwedêgiravî mirîdekî xwe yê

xas serjê dikir, ew şand cennetê. Bi hezaran mirîdên ku ew xwîn dîtîn êdî guhê xwe nedan şêx, înkara wî kirin. Tenê zilamekî got: “Bila serê min bi gorî be.” Çû balê. Piştî wî jinek jî çû balê, ên din tev belav bûn. Wî zatî, ji zilamên hikûmetê re got: “Va ye we dît mirîdek û nîv mirîdê min hene.)

3.5. Vegêranên Dînî yên Lehengî

3.5.1. Qewlê Newala Sîsebanê¹⁸

Qewlê Newala Sîsebanê behsa xezaya sehabîyan dike. Sîseban navê bajarekî ye. Ev bajar di serdema navîn de li herêma Erranê ya ku diket rojhilatê Qafqasyayê bû. Sîseban îro jî li herêma Syûnîkê bi navê Sîsîanê tê zanîn (Demir, 2012, rr. 12–16).

“Ey kâri! Peşinen bunu itiraf ederim ki: Sanat-ı hat ve nazımda istidadımdan çok müştekiyim. Hattâ şimdi ismimi de düzgün yazamıyorum. Nazım, vezin ise ömrümde bir fıkra yapamamıştım. Birdenbire zihnime, nazma musırrane bir arzu geldi. Sahabelerin gazevatına dair Kürtçe قَوْلُ نَوَالِ سَيْسَبَانَ namında bir destan vardı. Onun ilahî tarzındaki tabîî nazmına ruhum hoşlanıyordu. Ben de kendime mahsus onun tarz-ı nazmını ihtiyar ettim. Nazma benzer bir nesir yazdım. Fakat vezin için kat’iyen tekellüf yapmadım. İsteyen adam, nazmı hatıra getirmeden zahmetsiz, nesren okuyabilir. Hem nesren olarak bakmalı, tâ mana anlaşılsın. Her kıtada ittisal-i mana vardır. Kafiye de tevakkuf edilmesin. Külâh püskülsüz olur, vezin de kafiyesiz olur, nazım da kaidesiz olur. Zannımca lafız ve nazım, sanatça cazibedar olsa nazarı kendiyle meşgul eder. Nazarı manadan çevirmemek için perişan olması daha iyidir.” (Nursî, 2003c, rr. 735–36).

(Ho xwîner! Di serî de vê îtîraf dikim ku ez di warê hunera nivîsîn û nezmê de ji qabîlîyeta xwe bi gazine im. Hetta vêga navê xwe jî nizamim delal binivîsim. Nezm û wezn ku hene min di imrê xwe de nivîsarek jî lê nekirîye. Bi carekê derbarê nezmê de daxwazeke bi îsrar hat hişê min. Destaneke bi navê *Qewlê Newala Sîseban* a kurdî ya derbarê xezaya sehabîyan de hebû. Rihê min ji nezma wê ya siruştî ya ku bi terzê qesîdeyê bû hez dikir. Min jî li gorî xwe terzê nezma wê hîlbijart. Pexşaneke ku dişîbihe nezmê nivîsî. Lêbelê min ji bo weznê qetîyen zorê nedayê. Ê ku bixwaze,

¹⁸ Qewlê Newala Sîsebanê ji destanê zehftir hêmanên xezewatê dihundirîne. Ji xwe Nursî jî wê wekî xezewat bi nav dike. Alîyên wê yên mîtolojîk jî hene. Wekî xezewateke mîtolojîk bê pênasêkirin dibe ku munasibtir be.

dikare bêyî ku nezmê bîne bîra xwe bi rihetî bixwîne. Hem jixwe divê wekî pexşanê guhê xwe bidê, da ku mane bê famkirin. Di her qîteyekê de pevrehîya manê heye. Bila li qafiyeyê neyê rawestan. Kum bê gulî jî dibe, wezin jî bê qafiye dibe, nezm jî bê qaîde dibe. Li gorî bawerîya min dema ku lefiz û nezm, bi awayê hunerî balkêş bin nêrînê bi xwe re meşxûl dikin. Ji bo ku balê ji maneyê nede alîyekî din perîşanîya wê çêtir e.)

Çend Nimûne ji Qewlê Newala Sîsebanê û Lemeatê:

Hemd û sena j'Xwedê ra, ew e xweyê xeyr û şer
Herçî tekbîrek vê ra, ew hazir e l'hemî der
Tekbîra bidin jê ra, ew *Sani* 'ê şems û qemer
Selewata j'nebî ra, xudanê hewz û kewser (Demir, 2012, r. 29).

“Sellû ‘ela *Muhemmed*, xelqê evê civatê
We ‘ela alî *Mhemmed*, da hûn bêjinîqatê
Resûlê ê mueyyed, ji bo me dikit xebat
Sultan û şahê *Sermed*, dê jê bidim hîkayet” (Demir, 2012, r. 32)

“Zulmetli münevverler bu sözü bilmeliler:
Ziya-yı kalbsiz olmaz nur-u fikir münevver.
O nur ile bu ziya mezcolmazsa zulmettir; zulüm ve cehli fişkırır.
Nurun libasını giymiş bir zulmet-i müzevver.
Gözünde bir nehar var; lâkin ebyaz ve muzlim.
İçinde bir sevad var, ki bir leyl-i münevver.
O içinde bulunmazsa, o şahm-pare göz olmaz;
sende bir şey göremez. Basiretsiz basar da para etmez.
Ger fikret-i beyzada süveyda-i kalb olmazsa,
halita-i dimağî ilim ve basiret olmaz. Kalbsiz akıl olamaz.” (Bediüzzaman Said Nursî, 2004a, r. 396).

(Rewşenbîrên famekor bila vî baş bizanîn:
Bêyî şewqa qelb û dil ronî nabe fikir û bîr.
Ku ew nûr bi vê şewqê nebe yek zulûmat e; cehl û zilmê difîskîne.
Zulmetek xapînok e. Cilên nûrê li xwe kiriyî.
Naveroya çavê te; fîqsipî lê taristan.

Deqa reş a di nav de, şevê ronî û ronistan.
Ew ne di navê de be, nabe çav ew perçê goşt;
Tu tişteki nabînî. Dîtina bêbesîret pênc pereyan jî nake.
Ger di famefîkrî de reşahiya qelb nebe,
fikir nabin îlim û şewq. Bêyî qelb aqil nabe.) (Nûrsî, 2014a, rr. 23–24).

“Kelime-i şehadet, vardır iki kelâmı.
Birbirine şahiddir, hem delil ve bürhandır.
Birincisi, sâniye bir bürhan-ı limmîdir.
İkincisi, evvele bir bürhan-ı innîdir.” (Bediüzzaman Said Nursî, 2004a, r. 392).

(Kelîma şehadetê, xwedî du kelaman e.
Ji hev û din re şahid, hem delîl û burhan in.
A yekem, ji duyem re burhaneke limmî ye.
A duyem, ji ya yekem re burhaneke innî ye.) (Nûrsî, 2014a, r. 16).

Wekî ku ji mînakan jî dixuyê Nûrsî xwestiye *Lemeatê* li ser wezna *Qewlê Sîsebanê* binivîse. Lê ji ber ku Nûrsî “safîyeyê” bi qurbana “qafîyeyê” nekiriye di gelek cîyan de vegotina *Lemeatê* neketiye wezna *Sîsebanê*. Têgih û tabîrên di *Sîsebanê* de hatine bikaranîn ji terîmînolojiya Rîsaleyên Nûr re qet ne xerîb in. Diyar e ev terîmînolojiya dînî û seqaya di hîkayetê de mîla Nûrsî kişandiye ser xwe.

3.6. Cejnên Gel ên Folklorîk

3.6.1. Newroz

Nerîta “newroz”ê, mîna roşana “hidrellez”ê roşaneke folklorî ye û wekî mijareke vekolînê di nav xebatên gelnasîyê de (Ekici, 2018, r. 193) cihê xwe girtiye.

Têgiha “newroz”ê carinan bi awayê “efsaneya Kawa”, carinan bi awayê “efsaneya Dehaq” dihê binavkirin. Taybetîya giring a newrozê ew e ku derketina kurdan wekî millet bi vê efsaneyê dest pê dike. Bi tevî vê, newroz wekî cejneke ku wateyên wê yên cuda cuda hene, li nav gelên Rojhilata Navîn û Asyaya Navîn jî tê pîrozkirin (Hikmet, 2023, r. 223).

Nevruz [Newroz] tê maneya “roja nû”. Di salê de navê du rojan e. 1) Li Îranê roja yekê meha Ferwerdînê ye, meha ewil a teqwîma li gorî rojê ku dibêjinê “Nevruz-i ‘amme”. Roja ku roj dikeve birca beran: a) Li gorî saloxdanekê, Xwedê gerdûn û mirovahî ew roj afirandiye. b) Li gorî saloxdaneke din jî, gava Cem derketiye ser textê

hukumdarîyê taca serê wî û zêr û zegerên ku bi cil û bergên wî ve bûne wisa şewq dane derdorê ku yên ew rewş dîtine, gotine: “Xusûsiyeteke vê rojê heye. Ev roj, naşibe wan rojên din”. Navê Newrozê lê kirine û peyva “şîd” ku di Pehlewîyê de tê maneya ronahîyê lê zêde kirine û navê Cem kirine Cemşîd. 2) Rojeke din a ku navê Newrozê wergirtiye, 7ê meha Ferwerdînê ye ku dibêjinê “Nevruz-i xasse”. Ev roj jî bi Cemşîd re eleqedar e. Di vê rojê de Cemşîd gazî rihsipîyên welêt kiriye, gotiye wan “Îro roja şikir û îbadetê ye ji bo Xwedê.” û xwestiye ku her sal bê dubarekirin. Şêş rojên di navbera Newroza ‘Amme û Newroza Xasse de padîşahên Îranê daxwazên feqîr û muhtacan pêk tînin (Firdevsi, 1994, r. 422).

Newroz li Rojhilata Navîn nexasim li nav kurdan wekî rojeke cejnê ya destpêka salê ye ku beharê tê pîrozkirin. Ev roj li ba kurdan wekî roja azadî û serfirazîyê tê qebûlkirin. Newrozê bi Kawayê Hesinkar dest pêkiriye, bi *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî li nav kurdan meşhûr bûye û bi rênîşandana Pîremêrd wekî çalakî hatiye pîrozkirin. Nûrsî jî di derbirîn û xweîfadekirinê de ji têgiha Newrozê sûd wergirtiye. Motîfên mîtolojîk-efsaneyî Dehaq û newroz di *Mem û Zîna* Xanî de derbas dibin. Ew di beşa 11em de behsa Newrozê dike û wî sernavekî wiha lê danîye (Xanî, 2013, r. 271):

Dastana beyana *Newroza Sultani*

Tesmîyeê mewsîmê surûr û şadimanî

Bi mersûmê qedîmê Kurdistanî

Ku wan digotê Sersal

‘Îd dikirin bi ‘îdê wisal

Ji bikaranîna tabîra *Newroza Sultani* tê fêmkirin ku Nûrsî ji Xanî îstîfade kirîye:

“Gel, bugûn *nevrûz-u sultanî*dir. Bir tebeddûlât olacak; acip işler çıkacak. Şu baharın şu güzel gününde, şu güzel çiçekli olan şu yeşil sahraya gidip bir seyran ederiz.” (Nursî, 2003c, rr. 63–64).

“Were, îro newroza sultanî ye. Dê guherînek çêbibe; dê îşên ecêb bibin. Di vê roja xweş a beharê de, em herin vê mêrga bişînahî ya bi kulîlkên xweşik seyranê bikin.”

“Bu zemherir günleri, nevrüz günleri gibi gülmeye başladı.” (Nursî, 2003a, r. 231).

(Ev rojên zemherîrê, mîna rojên newrozê dest bi kenê kirin.)

Nûrsî, ji Newroza ku wekî îd û sersala kurdan e bi erênî behs dike anku teswîb dike. Pûtepêdana alim û zanayekî wekî Nûrsî ya bi Newrozê dikare wekî bersiva pîrsa muqeder a ‘gelo pîrozkirina cejin û sersalên gelêrî mubah in yan na?’ jixweber bibersivîne.

3.7. Bawerîyên Gel ên Foklorîk

3.7.1. Xêzika Fila

Navê wê daîre yaxud çembera pîroz e ku gava yek bikeve hundirê wê, kesên din têkil nabin. Li gorî bawerîya gel, gava yek bikeve hundirê xêzika filehan, heta yekî din wê xêzikê xerab neke, ew nikare ji hundirê wê derkeve (Farqînî, 2004, r. 2010). Xêzika Fila navê têgiheke çalakîya mesîhîyan e. Ji bo afarozkirin an tecrîdkirina gunehkaran tê bikaranîn. Wekî mecaz derbasî nav edebiyat û folklora kurdan bûye. Li dora yên gunehkar an di lîstika zarokan de yên bûne pîrik wekî çemberê tê xêzkin. Heta ji derve ve neyê xerakirin ên di nav de nikarin derkevin biçin. Nûrsî jî dora hin agahîyên xwe xêz dike da ku neçin.

Xêzika Fila hem navê lîstikekê ye hem ê bawerîyekê ye. Gava zarok bi vê lîstikê dilîzin, dibin du bir. Birek direve; bira din dide ser wan. Ew dest/eta xwe li kê bidin ew di cîyê xwe de dicemide û xêzekê li dora wî xêz dikan. Heta hevalekî wî neyê pêyê xwe di wê xêzê nede, xera neke, ew serbest nabe. Bi vî awayê hebo hebo hemû tîz zeftkirin. Wextê hemû bîne zeftkirin ew lîstik xilas dibe. Îca vê carê bira din direve, vanên din didin ser wan. Lîstika Xêzika Fila bi vî awayî ye. Bawerîyeke wisa jî hebû; ku ev Xêzika Fila li dora yekî bihata xêzkin, heta yekî ji derve ve wê xêzikê jê nebira yê di navê de nikaribû derketa, eger derketa dê bibûya file. Aqilê zaroktîyê wisa bû. Carina li dora hinek zarokan Xêzika Fila xêz dikirin û dijmîn didan ku kes xera neke. Ew zarok di nava wê xêzikê de diman û digiriyan, heta diya wan an kesekî wan bihata wan derxista. Peyra hat famkirin ku ev rîtuêlêke filehan e, ji bo afarozkirina kesên gunehkar tê bikaranîn. Hinek jî dibêjin ev adet ne ya filehan, ya êzîdîyan e (Ç1).

“Hem de hakikatin etrafına bir daireyi çekmek istiyorum, tâ hakikat mahsur kalıp kaçmasın. Ben tutmazsam başkası tutsun.” (Bediüzzaman Said Nursî, 2004e, r. 122). (Hem jî dixwazim li dora heqîqetê daîreyekê xêz bikim da ku heqîqet asê bimîne nereve. Ez negrim yekî din bigre.)

“O nurun etrafında bir daire çevirmekle avlamak ve zaptetmek arzu ettim.” (Nursî, 2003c, r. 14). (Min xwest li dora wê nûrê bi xêzkirina daîreyekê nêçîra wê bikim wê zeft bikim.)

Nûrsî di xweîfadekirinê de bi gelek awayan hêmayên çanda kurdî bi kar anîne. Ev jî nimûneyek ji wan e. Li vir a giring, hilgirtin û derbazkirina van adetên e, ya nav Rîsaleyan Nûr a ku Nûrsî kiriye ye. Lewre mijara vê xebatê jî tam ev yek e.

3.7.2. Hîvgirtin

Bi qasî ku em ji çavkanîyan zanista folklorê (Ekici, 2018, r. 195) têdigihîjin bawerîyan têkildarî stêrk û gerstêrkên jî di nav mijarên folklorê de cih digirin. Di nav hemû şaxên folklorê de mijara herî zêde ku derbasî edebîyatê bûye, îtîqadên gel in. Wekî mînak ew telaqqî û bawerîyan îbtîdai yê têkildarî bawerîyan gel ku li ser hêzên tebîetê hene, bûne mijara helbestên dîne Îsewîyan (Boratav, 1969, r. 194).

Çawa ku di xebatên têkildarî folklorê kurdan de jî derbas dibe (Oner, 2019, r. 23), li gorî bawerîya Kurmancên Serhedê, gava ku heyv tê girtin, nîşane ye ku “hût”ek wê dixwe. Lewra di wê kêliya gava xelk dibîne ku heyv tê girtin, ji bo ku hût heyvê nexwe, denga derdixin, bi taybetî li tenekeyan dixin û pê ra jî wiha dibêjin: “Hûtino! Heyva Xwedê berdîn!” Xelk wisa bawer dike ku bi vê qelebalix û van denga hût ditirse û dev ji xwarina heyvê berdide.

Di folklorê de vera Xerzan de bi taybetî li aliyê Sasonê gava heyv tê girtin, hinek sîleh berdidin, hinek hene li tenekeyê dixin. Li aliyê Bişêrîyê gundîyan Êzîdî bi kevçîyan li teyîkên metal dixin. Li gorî bawerîyan bi vî awayî dikin ku heyv ji destê wî mexlûqê muzir xelas bibe (Gülltekin, 2022, rr. 90–91).

Hîvgirtin li gorî dîn û neteweyan xwedî cîyekî menewî ye. Misilman dema hîv tê girtin nimêja nafîle ya “xusûf”ê dikin. Kurdan jî berê dema hîv dihat girtin li gorî bawerîya wan da ku hîv azad bibe li tenekeyê didan û çek dîteqandin. “Gava heyv xeyrît bîtin, mirov li şehla û teneka p’det û selaweta bîne, heyv xeyrîbûna xwe t’berdet” (Gökalp, 2024, r. 75). Nûrsî bîranîneke zarokatiya xwe ya derbarê hîvgirtinê de vedibêje:

“Küçüklüğümde kamer tutuldu. Ben valideme dedim: “Neden ay böyle oldu?” Dedi: “Yılan yutmuş.” Dedim: “Daha görünüyor.” Dedi: “Yukarıda yılanlar cam gibi olup içlerinde bulunan şeyi gösterirler.” Bu çocukluk hatırasını çok zaman tahattur

ediyordum. Ve der idim ki bu kadar hakikatsiz bir hurafe, validem gibi ciddî zatların lisanında nasıl geziyor? diye düşünürdüm. Tâ, felekiyat fennini mütalaa ettiğim vakit gördüm ki, validem gibi öyle diyenler bir teşbihi hakikat telâkki etmişler.” (2004c, r. 118). (Di biçûkahîya min de hîv hat girtin. Min ji dayîka xwe re got: “Hîv çima wiha bû?” Got: “Mar ew xwarîye.” Min got: “Hê jî dixuyê.” Got: “Li jorê mar wekî camê ne tişta di nava xwe de nîşan didin.” Ev bîranîna min a zarokatîyê zehfê caran dihat bîra min. Ê min digot ku xurafeyeke wiha ji rastîyê dûr, çawa li zimanê kesên giran ên wekî diya min digere? û lê difikirîm. Heta min fenna felekîyatê mitale kir dît ku, ên wekî diya min dibêjin, teşbîheke wekî heqîqetê telaqî kirine.)

3.8. Edetên Eşîrtîyê

Nûrsî adet û nerîta gelê kurd û eşîrên wê wekî pîvanên merdîtî û mêrxasîyê nîşan daye. Gava mijar hatiye ser adetên kurdan yekser behsa wan kiriye. Bi behskirinê nesekiniye ew wekî helwesteke rast û durist peşkeş jî kirine. Ev nimûneya li jêr yek ji wan e:

“Medar-i ibret bir hikâye: Bedevî aşiretlerinden Hasenan aşiretinin birbirine düşman iki kabilesi varmış. Birbirinden, belki elli adamdan fazla öldürdükleri halde, Sipkan veya Hayderan aşireti gibi bir kabile karşılarna çıktığı vakit, o iki düşman taife, eski adaveti unutup, omuz omuza verip, o haricî aşireti def edinceye kadar dahilî adaveti hatırlarına getirmezlerdi.” (Bediüzzaman Said Nursî, 2004d, r. 308).

(Hîkayeyeke biîbret: Du qebîleyên koçer ên neyarên hev ên ji eşîra Hesanan hebûne. Digel ku ji hev belkî pêncî mêrî zêdetir kuştibûn jî, gava qebîleyeke ji eşîra Sibkan an Heyderan derdiket himberî wan, ew her du taîfeyên neyar, neyartîya berê ji bîr dikirin, mil didan hev, heta wê eşîra biyanî biqewirandana neyartî nedianîn bîra xwe.)

Gava Nûrsî şîretan li kurdan dike dibêje wan sê neyarên me hene, feqîrî, cahilî û keşmekêşî ango îxtîlaf. Disa dibêje divê em bi sûrên elmasî bi van neyaran re şer bikin, ew çi ne?: yekîtiya millî, se‘ya însanî û hezkirina millî (2004a, r. 25). Mînaka Nûrsî daye ji bo rêbaza yekrêzîyê ye. Gava lazim be divê mirov li arîşeyên navxweyî asê nemine.

3.9. Çanda Foklorîk a Medreseyên Kurdistan

Di medreseyên kurdan de wekî nîşaneyê edebê hin rêbazên derbirînê hene. Wekî mînak, dema feqî xîtabî seydayê xwe dike ji dêvla cînavka kesê duyem kesê sêyem bi kar tîne. Digel ku bi seydayê xwe re diştexîle di xîtabê de dibêje, “seyda wiha gotibû” ev yek nîşaneyê hurmetê tê qebûlkirin. Dîsa di dema dersdanê yan dîyaloga di nav feqîyan de gava behsa uzvên cinsî tê kirin navê wan ê erebî tê gotin, ev yek jî ji nîşaneyê edebê tê qebûlkirin.

3.9.1. Miftuhane

Miftuhane, bêjeke bi zimanê ‘erebî ye, tê wateya vekirinê. Dema xwendevanek pirtûkekê xelas dike berîya derbasî pirtûkeke din bibe, ji bo hevalê xwe yê xwendinê hinek pêxwarin amade dike û bi hev re dixûn. Di çanda medresê de navê vê xwarênê Meftûhane ye (Ertekin, d.n.).

Karê feqîyên medreseyan xwendin e. Zemanê wan bol e, lewra ew bi rehetî dikarin berhemên hunerî bidin. Rojên betlaneyan, êvara îne, dema listik, henek û yariyên telebeyan e. Ehlê medreseyê çandê xwe ya pir xerîb heye. Bi taybetî ji edebîyata mîzahê ango qerf û henek zaf bi pêş ve çûye di nav wan de (Meretowar, 2007, r. 29). Feqî miftuhaneyê wekî seramonîyekê bi kar tînin. Nûrsî jî dibêje miftuhane adeteke medreseyên kurdan e:

“Memleketimizde medrese talebelerinden birisi bir kitabı bitirse veya başlasa, bir tatlı veya yemek, meftuhane veya mahtumane diye vermek âdettir. Aynen bu kaideyi Kâtib Osman’ın özümünde gördük. Onun yazdığı Asâ-yı Musa’nın tashihinde bitirdiğim aynı vakitte mahtumanesi olarak bu özümün gelmesi, tatlı bir lâîfe ve şîrin bir hatıra-i hayat-ı medresiye oldu.” (Nursî, 2003a, r. 128). (Li welatê me gava feqîyekî medreseyê kitêbek xilas dikir yan dest bi kitêbekê dikir, adet bû ku şîranîyek an xwarinekê wekî miftuhane yan mextumane bida. Me eynî adet di tirîyê Katib Osman de dît. Bi xilaskirina teshîha *Asayê Mûsa* ya ku wî nivîsiye wekî mextûmaneyê hatina tirî, bû wekî letîfeyeke şîrîn û bîranîneke şîrîn a heyata medreseyê.)

Mele Ehmed Yalar di berhema xwe ya bi navê *Dîwana ‘Îşqê* de bi vî awayî behsa miftûhaneyê dike:

“Bona feqîyan ku bûye ‘adet
Der xitmê kîtab didin ziyafet

Ew xasê feqîyy û hem melan e
Ismê wî bizane Meftûhane.” (2022, r. 113).

Ev adeta medreseyan kurdan qurekêşan jî yek ji van e. Di dema miftuhaneyan de ji bo parvekirina pêxwarinan qure tê kişandin. Îcar feqîyan zîrek di qurekişandinê de wisa li hev dianîn ku qure li wan an li hevalê li kêleka wan bikeve didin destpêkirin. Qure li kê bikeve pêşî ew ji nav peşkan a bi dilê xwe dikare hilbijêre.

3.9.2. Tayîna Feqîyan û Bêminetî

Zemanê berê feqîyan medreseyan kurdan, rojê du caran diçûn nav malên gundîyan û ji xwe re xwarin dianîn. Ji bo neheqî li hin feqîyan nebe, ji her du-sê mehan carekê ji nû ve wan peşk davêt ka dê kîjan feqî biçe kîjan malê û ratibê (tayîna xwarinê) bîne. Wî feqîyê ku mala xwe ya tayînê dewrî hevalê din fikir, agahdarîya derbareyê kûçik û keçikên malê jî dida hevalê xwe (Newayî, 2007, rr. 31–32).

Nûrsî di berhemên xwe de cih dide adet û toreya welatê xwe:

“Ben gençlik zamanında bizim memlekette gördüğüm eski medresenin aynı vaziyetini görüyorum. Çünkü, vilayat-ı şarkiyede eski âdet medrese talebelerinin bir kısmının tayinatları dışarıdan geliyordu. Ve bazı medreseler, içinde pişiriyorlardı. Ve daha kaç cihette bu çilehaneye benziyorlardı.” (Bediüzzaman Said Nursî, 2004c, r. 318).

(Ez eynî rewşa medreseya kevin dibînim ku min di ciwaniya xwe de li welatê xwe dîtibû. Lewre, li wîlayetên şerqê xwarin û vexwarina hinek telebeyên medreseyan ên li ser usûla kevin ji derve ve dihat. Ê hinek medreseyan jî li hundirê medreseyan çêdibû. Ê êdî bi gelek awayan dişibiya vê çilexaneyê.)

Nûrsî, ji hêlekê ve hesreta welatê xwe bi lêv dike, ji hêla din ve bi awayekî ji awayan berdevkîya çanda milletê xwe dike. Ne tesadufî ye ku navê mal û cîyên xwegirtîyên Nûrsî lê dimînin wekî “medrese” tên binavkirin û jiyana kesên lê dimînin dişibe ya feqîyan.

3.10. Wergirtina Nûrsî ya Cil û Bergên Kurdî yên Folkorîk

Çawa ku pispor destnîşan dikin (Ekici, 2018:208), cil û bergên gelan jî wekî nasnameya wan a neteweyî cihê xwe di nav zanista folklorê de digire. Lêkolîna li ser

cil û bergên herêmî, karekî bikulfet e. Li welatê Fransayê, wan gundîyên ku di rojên bazar û roşanên dînî yên Îsewîyan de bi cil û bergên xwe bûn, dîmenên pitorsk (kartpostal) temîn dikirin. Lewra wênesaz û desinator (hunermendên ku li ser karê modelan dixebitin) li ber curerengîniya xwegirêdana wan hijmetkar diman. Heta wisa bû ku di sedsala 18em de qîyafetên gundîyan bûne mode (Boratav, 1969, r. 198).

Kinc, cizme û xencera Seîdê Kurdî û birazîyê wî gelek bala şênîyên Stenbolê û Ewrûpîyan kişandîye. Rojnameyekê ligel nivîseke dirêj wêneyê komê kurd jî weşandîye (Alakom, 2024, r. 21).

Ji fotografên Nûrsî dîyar dibe ku wî ji wextê ciwanîya xwe heta salên 1920î cilûbergên folklorîk ku nasnameya neteweya kurdan nîşan didin li xwe kirine. Xencera wî di ber wî de, gîzme di lingên wî de û şal û şapik lê bûye. Zemanê ku çûye Stenbolê jî, wî ev kincên xwe yên millî bi heman rengî li xwe kirine (Yıldız, 2024, r. 69).

Bedîuzzaman Seîdê Nûrsî di ciwanîya xwe de zehf ji heybet û ihtîşamê hez dikir. Erê cil û bergên kurdî li xwe dikirin lêbelê di wan de jî heta jê dihat ji milê dîtbarî ve mubalexe dikir. Bedîuzzaman Seîdê Nûrsî bi xwe jî behsa wergirtina cil û bergên xwe dike:

“Şiklê min ê xerîb... Ez bi van cil û bergên xwe yên dijber îlan dikim ku ez ji meqsedên dunyewî berê xwe ba didim û lêborîna xwe dixwazim ji ber ku li gorî adetên bajêr tevnagerim û hal û hereketên min ne wekî yên xelkê ne û dil û derveyê min wekî hev e, ez siruştî me û ji miliyeta xwe hez dikim.” (Bedîuzzaman Seîdê Nûrsî, 2012, r. 49).

“Kaplan postuna benzeyen elbisem gibi üslûb-u beyanım da zamanın modasına muhaliftir.” (Bedîüzzaman Said Nursî, 2004a, r. 11). (Uslûba min jî wekî cil û bergên min ên dişibin postê pilingan muxalîfê modeya zemên e.)

Gelek kesan behsa wê wergirtina Nûrsî ya ku ew dişibîne postê pilingan kiriye. Zinar Silopî (Kadri Cemilpaşa) di berhema xwe ya bi navê *Doza Kurdistan* de wiha dibêje:

“Bahusus Nur Talebeleri üstadı meşhur Molla Said’ın yakışıklı, babayiğit tavrı ile Kürtlere mahsus giydiği şal û şapik elbisesi ve koloz, desmalî ile başı yükseklerde dolaşmasını temaşadan pek çok zevklenirdim.” (Cemilpaşa, 2014, r. 36). (Nexasim ustadê Telebeyên Rîsaleyên Nûr Mele Seîdê Meşhûr bi şemla xwe ya lihevhatî û

babaegît, bi cil û bergên kurdî şal û şapik lixwekirî, bi koloz û desmal, bi serbilindî digeriya, min bi heşmetheyranî ew temaşe dikir.)

Gıyasettin Emre: “O zaman Üstad’ın giysisi Kürt ağalarının giysisi şeklindedir.” (Emre, 2006, r. 197). (Wê demê cil û bergên Ustad wekî yên axayên kurdan bûn.)

Abdurrahman Eksik, ji koçerekî Cizîrî ev bîranîn bihîstîye:

“Molla Said-i Meşhur Cezire'ye geldiği zaman ben de onu gördüm. Kiyafeti şal-şapıklı idi. Mahallî kıyafetin “şapik” tabir ettikleri ceketinin kol ağızları hem geniş hem bir metreden fazla koldan uzundu. Bu kol ağızlarına “puçuk” veya “kılçık” denilir. Bir defa gördüm; Molla Said-i Meşhur abdest aldı ve ceketinin kol ağızlarının uzun puçuklerini tekrar koluna sarmak yerine, sağ tarafinkini omuzunun üstüne attı, Sol tarafinkini ise arkasından süründürerek yürüdü” (Badıllı, 1990, r. 91). (Mele Seîdê Meşhûr gava hatibû Cizîrê min ew dît. Cil û bergên wî şal û şapik bûn. Li herêmê ya ku dibêjinê “şapik” saqoyekî defdetikên wî fireh in û ji metreyekê zêdetir ji milan dirêjtirbûn. Ji van defdetikan re “puçuk” [uçuk] an jî “kilçik” tê gotin. Min carekê dît: Mele Seîdê Meşhûr destnimêj girt û uçikên deftedetikên xwe ji dêvla dîsa li milê xwe bilefîne, uçikê milê rastê avêt ser milê xwe yê çepê li duv xwe kaş kir û çû.

Nazmi Ören di bîranînên xwe yên di sala 1952yê de yên di rojnameya *Dunyayê* de weşandîye, wergirtina Bediuzzaman şayesandîye. Ören serbazekî cendirmeyan e, di nav heyeta Erzurûmê de ye, Bediuzzaman jî ji Stenbolê tevlî nav vê heyetê dibe ya ku li gel Sultan Mehmed Reşad geştê Rûmelî dikin, diçin Kosovayê. Nezmi Ören Nûrsî û cil û bergên wî wiha teswîr dike:

O [Molla Said], otuz beş yaşında görünür kırk beşlik bir adamdı. Başında beyaz uzun bir külahı vardı. Külahın alt kısmına siyah ipek postunun kısa saçakları yüzüne sarkıyordu. Siird veya Van el tezgahlarında o havaliye mahsus bir nevi keçî kılından dokunan alacalı bulacalı kumaşlardan pike elbisesi vardı. Her paçasına iki bacak girebilecek genişlikte olan fakat kırmızı uçurluğu açıkta bulunan bir şalvar giymiş kolağızları yırtmaçlı, göğsü açık, kırmızı işleğinin üstüne yine yine kareli ve renkli şalvarının kumaşından kolsuz bir çepken geçirmişti. Ayaklarında çizmeler vardı. Şalvar paçalarının uçlarına çizmelerin içine sokulmuş artanı çizmelerin üstüne dökülmüştü. Bıyıkları kısa, gözleri parlak, boyu külahlı olduğu zaman çok uzun

kûlahsız olduđu zaman orta idi. Beyaz tenli, yakışıklı, heybetli bir gençti. Elinde altın savatlı, çerkes yapması kamçısını hiç düşürmezdi. Gerçi İstanbul’da Kürt elbisesi vardı. Fakat böyle gösterişli, böyle mübalağalı yoktu (Akgündüz, 2013, r. 103). Ev şayesandin wiha didome, Akgündüz ev der neqil nekiriye: Daima Kürdçe konuşmak isterdi. Türkçe de konuşabilirdi... Türkçe okuyup yazdığını hiç görmedim. Geniş yapraklı Arapça risaleler okuduğunu gördüm... (Nur, 2022).

(Ew [Mele Seîd], zilamekî di çil û penc salîya xwe de wekî yekî sî û pênc salî xuya dikir. Li serê wî kumekî spî yê dirêj [kumê kulavî] hebû. Rîşîyên kin yê postê reş ê hevrişim ê ku li jêra kum girêdabû bi ser rûyê wî ve berjêr dibûn. Lîbaseke wî yê pîke hebû. Ev lîbasê birdobeleke ê ji mûya bizinan ê ku li Sêrtê yan li Wanê bi dezgehên destan hatibûn çêkirin. Şalekî ku her hêleke wî du ran bi rihetî dikaribûn biketanê lê cîyê şimara wî ya sor li derve li xwe kiribû. Di ser kurtikê sor ê deftetikê wî çiriyayî, depa singê wî vekirî de dîsa ji qumaşê şalê wî yê rengîn şapikekî bêmil ê damakirî di ser de li xwe kiribû. Di nigê wî de cizme hebû. Deftetikên şal ji jêr ve hinek xistibû nava cizmê, yê mayî bi ser cizmê ve berdabû. Simbêlên wî kin, çavên wî bireqas, bejna wî bi kumê kulavî zehf dirêj dixuya, gava bêkum bû weset bû. Xortekî rengsipî, qeşeng û bi heybet bû. Qamçiyê xwe yê avzêrkirî, yê destxetê Çerkezan qet ji destê xwe danetanî.

Her tim dixwest bi kurdî bipeyive. Bi tirkî jî dikaribû bipeyive... Min hîç nedidît ku bi tirkî dixwîne û dinivîse. Min didît ku rîsaleyên erebî yên bergfireh dixwend. Tevî ku li Stenbolê cilûbergên kurdî hebûn, lêbelê yên wiha hijmetkar û bi mubalexe nîn bûn.)

BEŞA ÇAREM

4. ZIMANÊ KURDÎ DI BERHEMÊN BEDÎUZZEMAN SEÎDÊ NÛRSÎ DE

Ziman amûreke ragihandinê ya hemû giyaneweran e, lê mirov wê karîgertir bi kar tînin. Dema behs ziman e şop heta destpêka mirovahîyê diçe. Hûn li rastîya wî binihêrin ev meseleya ziman heta qada Xwedê diçe. Lewre wehîy jî awayeke axaftinê ye, ango axaftin e. Mûsa Pêxember kelîmullah (ê ku bi Xwedê re diştexile) e, Îsa Pêxember kelamullah (gotinek ji Xwedê) e. Yekemîn ayeta Încîla Yuhanna bi “Pêşî peyv hebû” dest pê dike. Yekemîn ayeta Qur’anê “Îqre” ye, ango bixwîne. Ji xwe navê Qur’anê jî ji xwendinê tê. Herwiha Qur’an qîmetê dide “cîhêrengiya zimanan”. Ev zimanê heqîqî bûn. Îcar zimanê mecazî jî hene, mesela: Zimanê hal, zimanê bedenê, zimanê şîrîn, zimanê ezopî, zimanê edebîyatê, zimanê dagirkeran, zimanê mezlûman, zimanê çukan û hwd.

4.1. Ziman û Zimanê Zikmakî

Ziman, qedera însan e. Tu komeke mirovan nîne ku ziman dernexistibe holê. Îro em dibinin ku ziman bi dînan re, bi nasnameyan re, bi perwerdehîyê re, bi mejî re, bi awayên danûsitandinê re, bi edebîyatê re û bi diyardeyên çandê yên din re di nava têkilîyê de ye. Axirî, cîyê ku mirov lê hebin ziman jî heye (Kerimoğlu, 2014, r. IV). “Ziman navgîna ragihandinê ye. Mirov bi rêya dengên hest û ramanên xwe digihînin hev (Tan, 2011, r. 21). Li gorî Tewfîq Wehbî ziman, “Pişandinê bîrmane be yarmeyeyî kelîmewe. Ziman şîtêk e ebêjrê û esûnûsrê”. Yanî ziman, bîrên me nişan dide, tê gotin û nivîsîn (Amêdî, 2012, r. 15). Li gorî Qanadê Kurdo, “Bê ziman, civateke mirovan nikare bijî. Bi arîkarîya ziman mirov dê hev fêm bikin. Ev girêdan û hevbendîya mirovan di jînê de û di xebatê de dê bi arîkarîya ziman bigihîje serî. Tu millet, tu xelk û tu komeleyên mirovan bê ziman nabin” (Amêdî, 2012, r. 15). Her wiha “ziman di avakirina hizra welatperwerîyê de cihekî giring digire. Lewra gelek caran sînorên welatan jî li gorî axêverên zimên diyar dibin û bi vî awayî ziman dibe diyardeyeke herî giring a ku neteweyekê ji yên din cuda dike” (Seyari, 2019, r. 66).

Ji ber ku zimanê Nûrsî yê zikmakî û yê ku pê berhem dane du zimanên ji hev cihê ne, tesîra zimên bi awayekî din teyîsîye derbirîna wî. Wekî di vê xebatê de jî

dikare bê dîtin, hevok û ristesazîya nivîsaran duqorî ye; digel ku bi şikil û şemala xwe bi tirkî ne lê di gelek ciyan de elfazên kurdî yan mantelîteya kurdî tê dîtin.

4.2. Seîdê Nûrsî û Zimanê kurdî

Ji devê şagirtê Nûrsî, Hulusi Yahyagil: “Sair zamanlardaki ziyaretlerimde defalarca Üstaddan duyardım ki: ‘Kardeşim! Hakikat lisan-ı maderzadem olan Kürtçe olarak kalbime gelir. Sonra ben Arapça veya Türkçeye çevirerek yazarım.’” (Badıllı, 1990, r. 36). (Di demên cihê de gava dihatim ziyareta wî min ji Ustad seh dikir: “Birayê min! Heqîqet bi zimanê min ê maderzayî ku kurdî ye tê dilê min. Piştî wî ez wî werdigerînim erebî û tirkî wisa dinivîsim.) Li gorî vê, mirov dikare bêje Rîsaleyên Nûr bi awayekî, wergerên ji kurdî ne.

Gava mirov li berhemên Nûrsî dinêre hem êşkere hem sergirtî tesîra kurdî dibîne. Seîdê Nûrsî di berhemeke xwe de wiha dibêje: “Ben Kürçte düşünürüm Arapça ve Türkçe yazarım.” (2004a, r. 80), ev hevok panoramayek e ji bo beşa vê xebata me. Lewra wî bi xwe îtîraf kiriye ku berhemên wî bi paşxaneyê kurdî hatine nivîsîn. Paşê di binbîrê de wate hatine wergerandin û cilûbergên zimanên din li xwe kirine. Piştî ku wate bi zimanekî din derdikevin ser kaxezê bivênevê tem û bêhna zimanê resen ku ew jî kurdî ye ji hevokan tê. Nûrsî -hema bêje- hemû berhemên xwe bi tirkî nivîsîne lêbelê ew bi xwe dibêje, ez bi kurdî difikirim û bi tirkî û erebî dinivîsim (2004a, r. 80). “Tirkîya min gelek kêr û muşewêş e” (2004e, r. 96). Di ciyekî dî de jî vê taybetîya xwe wiha tîne ziman: “Qederê, tirkî hindik daye min, zimanê min ji dilê min baş fêm nake da ku baş wergerîne” (2004a, r. 10). “Kurdekî tirkînezan ê ummî û teba ango azad (Nûrsî behsa xwe dike), ancax ewçend bikaribe merama xwe îfade bike” (2004a, r. 185). Ji ber ku li çiyayên bilind ên ku jê ra “Dibistana Kurdî” tê gotin mezin bûme min nekarî hînî terzîtiya eletirkî bibim (2004e, r. 71). Lewra ez bi dirûnkerîya eletirkî nizanim da ku bo van wateyan kirasekî qenc jêkim û çêkim û bişkovan pêvekim (2004a, r. 11).

Li gorî Nûrsî zimanê zikmakî:

Nûrsî, li ser navê zimanê zikmakî ku wê dişibîne fêkîyê cenetê, gazinan ji kurdan dike: “Hem de ‘lisan-ı maderzad’ denilen, eşia-i hissiyat-ı milliyenin mâkesi ve semerat-ı edebin şeceresi ve âb-ı hayat-ı maarifin cedavili ve kıymet ve tekemmülünüzün mizan-ı itidali ve doğrudan doğruya herkesin vicdanına karşı menfez

açmakla hayt-ı şuaı gibi tesirâtı ilka edici (ihmalinizle gayet müşevveş ve bazı dalları aşılانmış olan) lisanınız, şecere-i tuba gibi bir şecerenin tecellisine müstaid iken, böyle kurumuş ve perişan kalmış ve medeniyet lisanı olan edebiyattan nakıs kalmış olduğundan, lisan-ı teessüfle lisanınız sizden hamiyet-i milliyeye arz-ı şikayet ediyor.

İnsanda kaderin sikkesi lisandır. İnsaniyetin sureti ise sahife-i lisanda nakş-ı beyan tersim ediyor. Lisan-ı maderzad ise tabii olduğundan, elfaz davet etmeksizin zihne geliyor. Alış-veriş yalnız mana ile kaldığından zihin çatallaşmaz ve o lisana giren maarif “nakşun ale’l-hacer” gibi baki kalır. Ve o ziyy-i lisan-ı millî ile görünen her ne olur ise menus olur. İşte hamiyet-i millînin bir misalini size takdim ediyorum ki, o da Mutkili Halil Hayalî Efendi’dir ki hamiyet-i millînin her şubesinde olduğu gibi, bu şube-i lisan meydanında “kasb-ı sebkî” ihraz eylemiş. Ve lisanımızın esası olan elifba ve sarf ve nahvini vücuda getirmiş. Ve hattâ diyebilirim ki: Asr-ı hamiyet ve gayret ve fedakârlık ve himayet-i zuafa imtizac ederek vücud-u manevisini teşkil etmiştir.” (2004a, r. 191).

(Hem jî ya ku “zimanê maderzayî” tê gotin; ew zimanê we yê ku teyisîngeha tîrêjên hissên millî ye û dara berhemên edebî ye û cihokên ava jiyanê ya perwerdehiyê ye û pîvana edaletê ya qîmet û kamilbûyîna we ye û yê ku rasterast li pêş wijdana her kesî şibakeyekê vedike û weke tîrêjan, bandoran bi cih dike (lê ji ber îhmalkirina we gelek tevlihev bûye û hinek şaxên wê hatine tamandin) digel ku ev ziman ji ajdana dareke mîna dara tubayê re misaîd bû; wiha hişk bûye, perîşan maye û ji edebiyata ku zimanê medeniyetê ye bêpar maye. Ji ber van sedeman zimanê we, bi zimanekî heyflêanîn ji welatparêziyê re giliya we dike.

Ziman mora qederê ye li mirovan. Heçî sûretê mirovahiyê ye, di reng û rûyê zimên de xweşikahiya xwe dide der. Ji ber ku zimanê maderzayî siruştî ye, bêtî ku lefz bîn vexwendin tîn bîra mirov. Ji ber ku danûsitandin tenê bi maneyê tê kirin, di nav duriyanê de heyirî namîne û agahiyên dikevin wî zimanî mîna “neqşê ale’l-hacer”¹⁹ mayende dimînin. Ê her çi tiştên ku bi wî kirasê zimanê millî bixuyên henûn (dib)in. Va ye mîna keke welatparêziyê pêşkêşî we dikim ku; ew jî Mîrze Xelîl Xeyalîyê Motkiyî ye ku wekî di her beşa welatparêziyê de, di warê ziman de jî pêşkêşî bi dest xistiye. Ê alfabe, serf û nehwa ku esasên zimanê me ne, anîye pê. Ê heta ez

¹⁹ Nexşên li ser kevîr

dikarim bibêjim ku: Esra hemiyet, xîret, fedakarî û parastina zeîfan gihîstandiye hev û wucûda wî ya manewî çêkiriye.) (Bediuzzaman Seîdê Nûrsî, 2012, rr. 62–63).

Nûrsî ji ber vê fikra xwe ya derbarê zimanê zikmakî ye ku di seranserê jiyana xwe de ji bo vekirina dibistan û zanîngehan li nav kurdan bide vekirin xebitîye da ku kurd bikaribin bi zimanê xwe perwerde bibin. Projeya wî ya Medresetuzzehrayê delîla vê yekê ye.

4.3. Projeya Wî ya Medresetu'z-Zehrayê

Nûrsî cara ewil bi mebesta ku li nav bajarên kurdan daruttelîm²⁰/mektebên ku di wan de kurdî jî bîn tadrîskirin bide vekirin 18ê Mijdara 1907ê diçe Stenbolê. Dawîya sedsala 19em Dewleta Osmanî jî wekî gelek dewletên dinyayê û yên Ewropayê kebîbû nav hewldana pêngava pêşketinê lewma gelek gringî dida perwerdehiyê. Bi vê mebestê li Rumelî, Anadolu û Wîlayetên Şerqê dibistanên Daruttelîm, Ruştîye û Îdadîye vedikirin. Li gorî mufredata ku di part makezagona 1876ê di van dibistanan de zimanê perwerdehiyê bi tirkî bû. Bi kurdî perwerdehi nedihat dayîn (Demir, 2017). Lewma Nûrsî dixwest li nav kurdan hinek Daruttelîmên ku kurdî jî di wan de hebe bide vekirin.

Ji gotina Nûrsî ku dibêje, “bi navê Medresetuzzehra ya xwîşmaka Zanîngeha Ezherê ya ku darulfunûnê di hundirîne” tê fêmkirin ku Nûrsî zanîngeheke wekî ya Ezherê ku dibistanên navendî û lîseyê jî di bunyeya xwe de bihewîne daxwaz dikir. Herwiha dê darulmuellimîn/fequlteyên ku mamosteyan digihînin jî hebûna (Menek, 2013).

Nûrsî zêde qedir dida vê projeya perwerdehi û hindekarîyê. Berî biçê Stenbolê bi heşt salan li ser fizîbîlîteya wê xebitîye. Di van mekteban de dersên dînî û yên fennî digel hev dê bihata xwendin. Dê rewşa civakê ya sosyal, etnîkî û olî li ber çavan bihata girtin, li gorî wî dê hindekarî û perwerdehi bi sê zimanan; erebî, tirkî û kurdî bihata dayîn. Dê mamosteyên wê ji seyda û alimên kurdan bihata peyda kirin û pêdivîyên wan ji aliyê hukûmetê ve bihata temînkirin. Wekî sê şaxan dê li sê cîyên jeostratejîk; yek

²⁰ Daruttelîm: Navê dibistana zarokan e. Di dewleta Osmanî de gelek dibistanên zarokan hebûn, ên bi navê “sıbyan mektebi” (mekteba sebîyan), “muallimhane” (muelîmxane), “darüttalim” (mala perwerdehiyê), “darülilm” (mala ilmê), “mektep”, “mahalle mektebi” (mekteba taxê) û “mektephane” (mektepxane). Ev dibistanên wekî “bölge yatılı okulu” (dibistana şevînî ya herêmî) bûn, hinek ji wan jî aliyê weqfan ve hinek jî bi îmkânên gel dihatin idarekirin (Gökmen, 2022).

jê li Wanê ya ku navenda eşîrên Sibkan û Heyderan e, yek jê li Beytuşşebabê ya ku navenda eşîrên Ertoşîyan e, yek jê jî li navbera Motkan, Belkan û Sasonê bihata vekirin (Bediüzzaman Said Nursî, 2004a, rr. 507-508).

Gava Nûrsî diçe Stenbolê du mehan li mala Ferîk Ahmed Paşa dimîne. Piştî wî dixwaze ji bonî projeya xwe bi Sultan Abdulhemîdê IIem re dîdarekê pêk bîne lê bi ser nakeve. Li ser vê yekê vê carê daxwaznameya xwe dide Mabeyna Humayûnê²¹. Bersiveke demildest wernagire. Li ser navê Abdulhemîd nazirê zeptîyeyê Şefîq Paşa dikeve dewrê, Nûrsî vê diyalogê wiha vedibêje:

Nazirê Zeptiyeyê got: Silavên Padîşeh ji te re hene, hezar qurûş jî mîaş ji te re girêdaye. Piştî dê bike bîst-sî lîre.

Min bersivand: Ez ne parsekê mîaş im. Ku hezar lîre be jî ez nikarim qebûl bikim. Ez ne ji bo xwe hatime, ez ji bo gelê xwe hatim. Jixwe ev tişt hûn dixwazin bidin min bertîl e û mafê devgirêdanê ye.

Nazir: Tu îradeyê red dikî. Îrade nayê redkirin.

Min weha bersivand: Ez red dikim, ji bo ku Padîşah bixeyide û gazî min bike. Da ku ez jî rastiye bibêjim.

Nazir: Encama wê xeter e!..

Min bersivand: Ku encama wê behr be, qebreke fireh e. Ku bêm îdamkirin, ez ê di dilê miletekê de bijîm. Jixwe dema hatim Stenbolê, min heyata xwe bertîl anîbû, hûn çî dîkin bikin!..

Vê jî ji dil dibêjim: Ez dixwazim gelê xwe bîlfiil îqaz bikim ku girêdana bi dewletê ve ji bo xizmetê ye, ne ji bo wergirtina mîaş e. Jixwe xizmeta zilamekî wekî min ji gel û dewletê re bi nesîhetê ye. Ew jî bi tesîreke xweşik e. Ew jî ji fedîlê dile xwe ye. Ew jî bi bêxerezîyê, ew jî bi bêbergîdanê, ew jî bi terkirina berjewendiya xwe ya şexsî ye. Loma ez ji wergirtina mîaş mazûr im.

Nazir: Ew mexseda te ya ku li Kurdistanê perwerdehî belav bibe, Meclîsa Mebûsan hilgirtiye dest, li ser dixebite.

²¹ Pêvek- 2: Daxwaznameya ku daye Mabeynê.

Min bersivand: Gelo ev çi adet e ku hûn perwerdehiyê bi paş ve didin û miaş tînin pêş? Hûn berjewendiya min a şexsî tercîhî berjewendiya milletê ya umûmî dikin.

Nazir hêrs bû...

Min got: Ez azad jiyame. Ez li serê çiyayên Kurdistanê yên ku qada azadiya teqez in mezin bûme. Hêrsbûn min natirsîne, beredayî xwe newestînin. Min sirgûn bikin, Fîzan be jî Yemen be jî ez qayil im. Hûn jî dê ji pînedûzî û pînekari bîfilitin. Ez jî dê ji êşandina ketina ji bilindahiyên xelas bibim.

Nazir: Tu dixwazî bibêjî çi?

Min weha bersivand: We perdeyeke bi navê nîzamê ya qandî pelê çixareyê tenik li pêşiya ew çend coşîna fikir û hestiyariyê kişandiye ser her kesî. Her kes di bin de, ji ber pest û tadehiya we, weke miriyên dimeşin, dinalin. Ez xeşîm bûm, neketim binî, li ser ketim. Mîna şiklê wergirtina min, exlaqê min jî giran bû. Carek li mabeyna serayê çiriya. Li Şîşliyê berê min kete mala ermeniyekî, li wê derê çiriya. Ez çûm Xana Şekercî li wir jî çiriya. Ez ketim tîmarxaneyê, vêga jî ez ketime bin çavdêriyê.

Welhasil: Hûn jî nikarin ew çend pînekariyê bikin. Ez jî diêşim.

قَدْ اتَّسَعَ الْخَرْقُ عَلَى الرَّاقِعِ²²

Hem jî dema ez li Kurdistanê bûm min digot qey hûn qenc in. Vê rewşê ez baş fêrî sîrrên we kirim. Bi taybet, tîmarxaneyê ev nivîsar ji min re baş îzah kirin. Hem jî ji bo van bûyeran ez sipasiya we dikim. Ji ber ku ez li şûna xerabiyê bi başî difikirîm (2012, rr. 55-57).

Nûrsî piştî salan di vê behsê de dê wiha bibêje, “Gelî kurdan! Min tîmarxaney qebûl kir. Da ku kurdayetîyê lekedar nekim min îradeya padîşah, meaş û îhsana şehane qebûl nekir.” (Bediüzzaman Said Nursî, 2004a, r. 35).

Eger jînenîgarîya Nûrsî bê şopandin dê bê dîtin ku wî tu carî dev ji vê projeyê bernedaye. Dûvre ev proje bi navê Medresetu’z-Zehrayê vediguhere daxwaza avakirina zanîngehê. Nûrsî, di dawîya umrê xwe de nameyekê ji alîgirê serokwezîr

²² Ciyê qelaştî ji ciyê pîne firehtir bû.

Tewfîk Îlîrî û wekîlan re dişîne, bi kurtasî wiha dibêje: Ev e pêncî û pênc sal in ji bonî vekirina Zanîngeha Şerqê ya bi navê Medresetu'z-Zehrayê xebitîm, da ku yekê li Wanê, yekê li Diyarbekirê û yekê li Bedlîsê qet neb yekê li Wanê bidim vekirin hatim Stenbolê. Hurriyet çêbû, ew mesele jî bi paş ket. Piştî wî di wextê Îttîhadçîyan de bi munasebeta seyaheta Sultan Reşad a Rûmelîyê ez çûm Kosovayê. Min li wê derê hem ji Îttîhadçîyan hem ji Sultan Reşad re got: Şerq ji Darulfunûnek wiha re bîhtir muhtac e û di hukmê navenda alema Îslamê de ye. Wê demê wad dane min. Piştî wî, herba Balkanan derket, cîyê Darulfunûnê hat îstîlakirin. Min jî got: Nexwe wî bîst hezar lîrayên zêr bidin Darulfunûna Şerqê. Qebûl kirin. Ez jî çûm Wanê. Bi hezar lîrayî li kêleka behra Wanê li Artemîtê piştî ku me temelê wê avêt Herba Umûmî derket. Dîsa bi paş ket.

Gava ji esaretê xelas bûm hatim Stenbolê. Ji ber xizmeta min rayedaran ez vexwendim Ankarayê. Ez çûm. Piştî wî min ji wan re got: Di hemû jiyana xwe de li dûv vê Darulfunûnê me. Sultan Reşad û Îttîhadçîyan bîst hezar zêr dan, hûn jî ewçend deynin serî. Wan biryara sed û pêncî hezar banknotî dan. Min bi mebûsan da îmzekirin²³ (Nûrsî, 2003a, rr. 430-31). Nûrsî bêyî ku li hêvîya encama vê teklîfê bisekine ji Ankarayê vediqete. Wisa dixuyê ku bi cîanîna vê teklîfê zêde ne bawer e. Jixwe ev teklîf piştî du sal û nîvê (12/12/1925) dîsa ji alîyê Meclîsê bi paş ve tê kişandin û betalkirin (Badıllı, 1990, r. 451).

Nûrsî, piştî Ankarayê rasterast neçûye Wanê, ji salekê zêdetir li Stenbolê maye, çend kitêbên xwe dane çapê û pêwendîya wî bi derdorên kurd re çêbûye (Zînar, 2022, rr. 266-267). Nûrsî piştî weşanên xwe yên derbarê bawerîya bi Xwedê û axretê de yên li Ankara û Stenbolê dan çapê, ji bo xebatên avakirina Medreseya Zehrayê tê Wanê. Li wir, ji ber xebat û rewşa wî ya dawî ya li Ankara û Stenbolê di riya vegeerê de jî li Wanê jî ji alîyê îstîxbaratê ve tê şopandin û rewşa wî wekî rapor tê nivîsandin (Zînar, 2022, rr. 266-267). Nûrsî li wir jî rehet bernadin û bi hinceta dibe ku li vir tevgereke civakî bide destpêkirin, tevî gelek şêx, axa, malmezin û malbatan sirgunî Anadolîyê dikan.

²³ Teklîfa qanûnê ev e: 02/02/1339 roja Çarşemê (2yê Adarê sala 1923yê) ji alîyê mebûsê Kayseriyê Alim Efendî û 166 hevalên wî ve pêşkêşî Meclîsê hatiye kirin. Metnê teklîfê wiha ye: “2- Teklîfa qanûnê ya Alim Efendî û 166 hevalên wî ji bo li Wanê vekirina medreseyeke bi navê Meresetu'z-Zehrayê (2/671) (Badıllı, 1990, r. 450).

4.4. Mantelîteya Kurdî di Rîsaleyên Nûr de

Çawa ku berê jî ji devê Nûrsî hatibû îfadekirin, ew bi kurdî difikirî û bi tirkî û erebî dinivîsand, bi gotineke rasttir, dida nivîsandin. Erê Nûrsî têr ne hakimê zimanê tirkî û mantelîteya wê bû lê gelek caran di îfadekirinê de mantelîteya tirkî jî têra wî nedikir. Li gorî xwe tabîr û têgih dişkandin û ji nû ve ava dikirin. Ji ber ku derdekî Nûrsî yê xweîfadekirinê hebû. Nûrsî dibêje, Ustadê we ne bêxeta ye. Ew bêxeta zenkirin xeta ye. Xetayên ku Nûrsî behsa wan dike ne îlhamên sunûhatî ne. Di îfadekirin û şirovekirina wan îlhaman de ye, bi gotina wî: “Di tefsîlat û teferuatan de carina zêhna min a perişan tevî dibe, kêr dimîne, xeta çêdibe.” (Nursî 2002, r. 128). Di berhemên Nûrsî de mînakên bikaranîna mantelîteya kurdî gelek zêde ne. Ji ber ku dê ji qewareya vê xebatê re giran werin, dê ji wan mînakan bijarteyek li vê derê bê destnîşankirin:

“Kemali zuhurundan... Evet şiddeti zuhurdan *görünmemek* derecesine gelenler vardır. Cırmı şems gibi.” (Ji kemilîna xuyabûnê... Belê yê ji ber pir zêde xuyakirinê tîrê dereceya nedîtinê hene. Wekî cirmê rojê) (Bediüzzaman Said Nursî, 2004e, r. 101). Li gorî mantelîteya tirkî diviyabû bigota “şiddeti zuhurundan *görünmez* derecesine ulaşanlar vardır.” Li vê derê Nûrsî ji bo derbirîneke tekûz a maneyê, mantelîteya kurdî bi kar anîye. Di hevokê de tiştê dixwaze bide îfadekirin; ne ku veşartî ye, li ber çawa ye lê tu wî nabînî, yanî nahêle tu wî bibînî.

“Onunla, uçar gibi, bir senelik *bir* yolu, bir günde *kesersin*. (Nursî, 2003a, r. 38). (Bi wî, wekî bifirî, rêyeke salekê, di rojekê de dibirî.) Li gorî mantelîteya tirkî diviya bigota, “bir günde yol alırsın.” Di kurdî de têgeha “kurtebir” heye, Nûrsî ji wê sûd wergirtiye.

“Hem anlarsın ki, insan, *ipi boğazına sarılıp*, istediği yerde otlamak için başıboş *bırakılmamıştır* (Nursî, 2003c, r. 85). (Hem tu fêrî dikî ku, însan, benê wî li stuyê wî hatiye pêçan û ji bo cîyê lê bixwaze biçêre serberdayî nehatiye berdan.) Li gorî mantelîteya tirkî diviyabû bigota, “yulari boynuna dolayip” bihata gotin, lê li gorî mantelîteya kurdî, benê wî li stuyê wî hatiye pêçan bi kar anîye.

“Ayıp olmasın, batın ve fercin hizmetine mi münhasırdır?” (Nursî, 2003c, r. 137). “Bila eyb neyê, ma qey ev bi xizmeta zik û ferç [uzvê tenasulê] dorsînor e?). *Bila*

eyb neyê, biwêjeke kurdî ye. Nûrsî wekî mantelîte jê îstîfade kiriye. Li gorî mantelîteya tirkî diviyabû bigota, “ayıptır söylenmesi”, lê wisa negotiye.

“*Ve tek başıyla* bütün dünyaya meydan okuması,” (Nursî, 2003a, r. 133). (Û bi tena serê xwe ji hemû dinyayê re meydan xwendin,) Li gorî mantelîteya tirkî diviyabû bigota, “tek başına”, Nûrsî li gorî mantelîteya kurdî gotiye “bi tena serê xwe”.

“*O yeşil sema* perdesi arkasında,” (Li pişt wê perdeya *kesk* a asîman,). Bi tirkî “mavi gökyüzü”, yanî *asîmanê şîn*, tê gotin) (Bediüzzaman Said Nursî, 2004d, r. 24). Piranîya kurdên bakur navê rengên şîn û kesk tevî hev dikin. Sedema vê yekê jî, ji ber ku kurd ji gîlûgiya re dibêjin şînahî, ne li gorî rengê wê li gorî şînbûna wê, wê bi nav dikin, ev yek jî dibe sedema ku navê rengê şîn û kesk gelek caran di şûna hev de bên bikarbînin. Diyar e, Nûrsî jî heman tevîhevî kiriye.

“Hiçbir *şüphe* getirmez ki;” (Bediüzzaman Said Nursî, 2004b, r. 224). (Qet *gumanekê* bi xwe re *nayne*). Bi tirkî “şüphe etmek” yanî guman kirin tê gotin. Lê Nûrsî mantelîteya kurdî bi kar anîye.

“Kur’an onu *helal* etmemiş.” (Bediüzzaman Said Nursî, 2004d, r. 74). (Qur’anê ew *helal* *nekirîye*). Li gorî mantelîteya tirkî diviyabû bigota “Kur’an onu bağışlamamış” yanî “Qur’anê ew efû nekiriye”. Di kurdî de tabîra *helal* *kirin* û *fêhil* *kirin* an nekirin heye. Nûrsî ev mantelîte bi kar anîye.

“*Onların üstünde* haktır.” (Bediüzzaman Said Nursî, 2004d, r. 404). (Heq e *li ser wan*). Bi tirkî “Onların borcudur” yanî “deynê wan e”, tê gotin. Nûrsî mantelîteya kurdî bi kar anîye.

“*Senden* soruyorum.” (Bediüzzaman Said Nursî, 2004d, r. 479). (*Ji te* dipirsim). Bi tirkî “Sana soruyorum” tê gotin.

“Dedim: “Neden *daha* görünüyor?” (Bediüzzaman Said Nursî, 2004e, r. 25). (Min got: “Çima hê jî dixweyê?”) Bi tirkî, “Neden *hala* görünüyor?” tê gotin.

“*Boynunu kaldırmış*, el ile istikbale işaret edip, yüksek ses ile ilan ediyor ki:”. (Bediüzzaman Said Nursî, 2004e, rr. 34–35). (*Stûyê xwe hildaye*, bi destan îstîqbalê nişan dide û bi dengê bilind îlan dike ku:). Îdîyomeke weke “boynunu kaldırmış” ne di tirkî de ne jî di kurdî de naxûyê. Dibe ku Nursî dijberîya îdîyoma kurdî ya “stûxarîyê” a bi maneya zelîlî û heqîrîyê bi kar anîbe.

“*Van Denizi.*” (Bediüzzaman Said Nursî, 2004e, r. 65). (Behra Wanê). Bi tirkî “*Van Gölü*” dibêjinê, lêbelê kurd dibêjinê *Behra Wanê*.

“*Parmağını maksad üzerine bırakmak*” (Bediüzzaman Said Nursî, 2004e, r. 80). (Tilî danîna ser mexsedê). Bi tirkî “*Meseleye parmak basmak*” tê gotin.

“*Mesele uzunlaşır; kısa fehimler kavramaz.*” (Nursî, 2005, r. 101). (Mesele *dûvedirêj* dibe; fêmên kê mênên tînahîjîn.) Bi tirkî, “*Mesele uzar*” tê gotin.

“*İmanı tahkikî olanın imanını genişlendirir.*” (Nursî, 2003c, r. 731). (Ên ku îmana wan tehqîqî ye îmana wan *berfireh* dike.) Bi tirkî, “*imanını güçlendirir*” tê gotin. Di vir de rêbazêke gramera kurdî tê dîtin. Di kurdî de lekerên ne gerguhêz bi alîkarîya ‘-andin’ê tînahîjînkirin. Nûrsî jî ji bo lêkerê aktîv bike vê qaîdeya kurdî di tirkî de tatbîq kiriye.

“*Ey nefis! Böyle ebleh olmamak istersen; Allah namına ver*” (Nursî, 2003c, r. 13). (Ey nefis! Ku tu *naxwazî* wiha ebleh *bibî*; li ser navê Xwedê bide.” Li gorî tirkî divîyabû wiha bigota, “*Böyle ebleh olmak istemezsen*”. Lê wekî di mînakên derbasbûyî de hat dîtin, di vir de jî Nûrsî li gorî mantelîteya kurdî tevgeriyaye.

“*Mahlûkat ne yerden geliyorlar ve ne yere gidecekler*” (Nursî 2005, r. 244). (Bûnewer *ji ku derê ve tînahîjînkirin û dê bi ku ve biçin.*) Divîyabû bigota “*Mahlukat nereden geliyor nereye gidecek*”. Lê Nûrsî li gorî mantelîteya tirkî gotiye, “*Bûnewer ji ku derê ve tînahîjînkirin û dê bi ku ve biçin.*”

“*Beni vartaya yuvarlandırıyor.*” (Nursî, 2003c, r. 196). (Min *gêrî* xetereyê dike.) Di tirkî de ev îfade wiha tê gotin, “*Beni vartaya yuvarlıyor.*” “*Sefalet derelerinin esfel-i safîlînine insanı tekerlendiren; ve âlem-i İslâmiyet’i zillet ve sefalet düştürttüren ve ağraz ve husumeti uyandıran; ve İslâmiyeti zehirlediren... istbdaddır.*” (İctimaî Dersler, 82-83). “*A ku insan gêr dike esfelesafîlîna gelîyên sefaletê; û alema İslamê dadixîne nav zillet û sefaletê û xerez û hisûmetê hêşyar dike; û İslamîyetê jehrî dike... istîbdad e.*” Di tirkî de ev tabîrên destnîşankirî wiha tînahîjînkirin; “*yuvarlıyor*”, “*tekerliyen*” û “*zehirleyen*”, tabîra tekerlendiren/tekerleyen bi wî awayî di tirkî de jî nayê emilandin, Nûrsî li wateyê anîye.

Di kurdî de lêkerên negerguhêz bi “-andin”ê dibin gerguhêz. Mîrov dikare bêje ev taybetmendîya gramatîk a kurdî tesîr li tirkîya Nûrsî kirîye. Eger di du zimanên cîran de çi ji alî wateyê çi ji alîyê qalib şîbînek hebe, axêver wê şîbînek bi kar tîne. Her

wiha dema mirov hînî zimanekî dibe, taybetmendîyên zimanê ku baştir dizane derbasî zimanê din dike û wisa bi kar tîne. Li vir "yuvarlandırma" û "tekerlendirme" û "zehirlendirme" wisa dixuyê.

"Yirmi sene evvel beni Ankara'da *aşılادılar*, şimdiye kadar o aşî yeri ara sıra *işliyor*, rahatsızlık veriyor. *Bu da öyle olmasın diye hatırıma geldi*, sizde nasıl?" (Nursî, 2005, r. 375). (Bîst sal berê li Enqereyê ez *aşî kirim*, heta niha cîyê wê aşîyê carcaran *dişixule*. *Wisa hate bîra min, ev jî ne wisa be, ê we çawa ye?*) Divîya wiha bigota, "Yirmi sene önce *bana* Ankara'da *aşî yaptılar*, şimdiye kadar o aşî yeri ara sıra *ağrıyor*, rahatsızlık veriyor. *Bu da öyle olabilir mi diye aklıma geldi*, sizde nasıldır?" Birînên ku baş nabin an xwe nû dikin kurd ji wan re dibêjin "dişuxule" an "diaxive".

"Fakat ben o cübbe ile namaz kıldığım için mezhebimizce şiddetli temizlik şart olduğundan *yaş* yere konulmasın veya *yaş eller yapışmasın*. (Nursî, 2005, rr. 343–87). (Lêbelê ji ber ku ez bi wî cubbeyî nimêj dikim lewre mezhebê me paqijîyeke zêde dixwaze divê neyê danin cîyekî *şil* an jî *desten şil pê nebin*.) Divîyabû ji dêvla peyva "yaş"ê "ıslak" bi kar bianîya.

"Ve bana, şahsıma karşı ziyade hüsn-ü zan edenleri men'edip *hatırlarını* çok defa *kırıyorum*. (Şualar, 138). (Û gelek caran kesên zêde husnu zenê ji şexsê min re nişan didin men'a wan ji vê yekê dikim û *xatirê wan dişkênim*.) Divîyabû li şûna "hatırlarını" bigota "gönüllerini kırıyorum", lewre mantelîteya tirkî wisan e. A rast di kurdî de jî "xatir şikandin" nîne lê "xatir girtin" heye, dibe ku Nûrsî bi wê hişmendîyê wiha bi kar anîbe.

"Bu fikra, *başımın yanında* asılı duruyor." (Nursî, 2003a, r. 147). (Ev fiqre, *li ber serê min* daleqandî dimîne.) Divîyabû li gorî mantelîteya tirkî bigota, "*başucumda* asılı duruyor". Rasterast mantelîteya kurdî bi kar anîye.

"Çünkü o, *kendi kafasıyle konuşmamış*; eskiden beri hocalardan işittiği şeyleri, lüzumsuz münakaşa ile söylemiş." (Nursî, 2003a, r. 155). (Ji ber ku wî, *ne ji serê xwe xeber daye*; tiştên ji berê ve ji seydayan seh kiriye, di nav nîqaşê beyhude de gotibe,) Divîyabû wiha bigota, "kafasına göre söylememiş".

Benden aldığın dersi, elmas derecesinden *şişe* derecesine indirmemektir (Nursî, 2002, r. 12). (Dersa ku te ji min wergirtiye, ji asta elmastê danexistina asta *şûşeyê* ye.) Divîyabû li şûna peyva "şişe"yê "cam parçası" bi kar bianîya. Di kurdî de

şûşe hem di maneya heqîqî de wekî “şûşeya çayê” û hem bi maneya mecazî jî tê bikaranîn, wekî “şûşa dil”: Şûşa dilê min şikand. Şûşa dil ku şikestê dî cebar nabe.

“*Adet-i Îslamiye nasıl gelmiş*, o daha efdaldır.” (Nursî, 2002, r. 30). (Adetê Îslamê bi çî awayî hatiye, a bi xêrtir ew e.) Di tirkî de, “Îslami gelenek hangi yöndedir” (Kevneşopîya Îslamê bi çî awayî ye) tê gotin.

Bi vê xebatê hat dîtin ku mînakên bikaranîna mantelîteya kurdî ên ku Nûrsî bi kar anîne gelek in; a sereke sedeqeta wî ya li hemberî maneya lefzê ye, ya ku bi îlhama sunûhatî jê re dihat, lewre bi kurdî bû. Yeke din ne hakimbûna wî ya li îdyom û çanda tirkî ye, wekî li pêş hatibû îfadekirin ku Nûrsî li xwe mikur dihat digot, tirkîya min qels e, serf û nehwa wê nizanim, tevî wê dilê min bi teshîha kesên din jî ne rihet e (Bediüzzaman Said Nursî, 2004a, r. 80). Helbet yek jê jî unsîyet û helawet û hêsanîya zimanê wî yê maderzadî ye.

4.5. Peyvên Kurdî yên di Berhemên Nûrsî de

Di kurdî de ji alîyê sazûnê ve mirov dikare peyvan bi giştî li ser du beşan dabeş bike; peyvên xwerû û yên nexwerû (Tan, 2011, rr. 63–64). Ên nexwerû jî di nav xwe de dibin çend beş. Nûrsî di berhemên xwe de hemû cureyên pêyvên kurdî bi kar anîne. Ji ber pîrbûna wan peyvan em ê tenê ji her cureyekê çend mînakên bidin.

Di vê navê de gelek peyvên erebî û farisî yên ketine nav kurdî hene, wekî mînak peyvên durr, hût, gubar/xubar û hayme/xeyme/xîbet digel ku erebî ne jî ketine nav kurdî. Mînak: Di nav kurdan de, Dirrê/Durrê wekî navê jinan tê bikaranîn. Hût, di çîrokên kurdan de tê bikaranîn wekî *Hûtê Heftserî*. Xubar di maneya tozê de tê bikaranîn, wek genîmê xubar hatiye çandin, mebest jê ew genîmê di payîza pêşî de hatiye çandin ya ku hê baran nehatiye û erd hê bi toz û xubar e. Xeyme/xîbet/xîvet di stranên kurdî de heye: “Çadira Bavê Lalo/Xîvetê Bavê Lalo”²⁴. Her wiha gelek peyvên farisî û kurdî yên mişterek jî hene, wekî: perwer, amade, nam, azad û hwd. Dîsa gelek peyvên dariştî yên qismek ji wan kurdî ne hene.

Nûrsî di dariştina payvan de çawa ji hêmanên kurdî bi alîkarîya qertafên peyvîsaz ên kurdî pêyvên pêkhatî çêdike, her wisa carinan ji hêmanên kurdî bi alîkarîya

²⁴ bnr. https://www.youtube.com/watch?v=_Q46Tqaa2is Jêgirtin: 20.02.2025.

qertafên tirkî yê peyvsaz jî peyvan çêdike. Carinan jî bi hêmanên erebî û kurdî û bi qertafên peyvsaz ên tirkî peyv dariştine:

4.5.1. Peyvên Kurdî yê Xwerû

Peyvên xwerû ji hêmanekê pêk tên. Qertafan wernagirin. Gava ji hev bîn xistin maneya xwe wenda dîkin. “Peyvên sade wekî morfemên serbixwe (*free morphemes*) tên binavkirin. Lewra ev morfem bi serê xwe ne û li rex van morfeman tu morfemên din ên dariştinê tunene. Eger gireyeke kêşanê (pêşgir, navgir, paşgir) li peyveke sade zêde bibe jî ev rewş taybetîya wê ya sadebûnê naguherîne. Lewra gireyên kêşanê, ne morfemên serbest, morfemên bendî (*bound morpheme*) ne” (Seyari & Aktaş, 2023, r. 31).

Ji nav Rîsaleyan mînakên peyvên xwerû ên kurdî û yê ketine nav kurdî: Erzan (Nursî, 2004a, r. 82). Bes (Nursî, 2004a, r. 83). Azad (Nursî, 2004a, r. 84). Tîrş: (Nursî, 2004a, r. 97). Gêda (Nursî, 2004a, r. 107). Gubar (Nursî, 2004a, r. 107). Rahne (Nursî, 2004a, r. 257). Çarh (Nursî, 2004a, r. 398). Kâr (Nursî, 2004a, r. 401). Râz (Nursî, 2004a, r. 457). Peyda (Nursî, 2004a, r. 377). Pişe (Nursî, 2004a, r. 424). Ger (Nursî, 2004a, r. 429). Kâh (Nursî, 2004a, r. 429). Fistan (Nursî, 2004a, r. 448). Râz (Nursî, 2004a, r. 457). Dûrr (Nursî, 2004a, r. 472). Penah (Nursî, 2004a, r. 472). Dem (Nursî, 2004a, r. 480). Sako (Nursî, 2004b, r. 80). Nam: (Nursî, 2004b, r. 226). Şah (Nursî, 2004b, r. 283). Bâr (Nursî, 2004b, r. 227). Pâre (Nursî, 2004b, r. 338). Mîh (Nursî, 2004b, r. 352). Vird (Nursî, 2004b, r. 371). Deyn (Nursî, 2004b, r. 138). Bend (Nursî, 2004c, r. 50). Hut (Nursî, 2004c, r. 65). Ferş (Nursî, 2004c, r. 66). Dûr (Nursî, 2004c, r. 164). Endam (Nursî, 2004c, r. 71).

4.5.2. Peyvên Kurdî yê Nexwerû

Peyvên kurdî yê nexwerû ew cure peyv in ku ji çend hêmanan pêk hatine. Ew hêmanên ku wan peyvan pêk tînin hin caran peyvên serbixwe ne, hin caran peyveke serbixwe û qertafek tene ba hev û peyveke nû pêk tînin. Her wiha carinan jî qertafên pêşî yan paşîya peyvekê û peyveke nû pêk tînin. Gelek caran jî peyvek hem pêşgirê hem jî paşgirê werdigire (Tan, 2011, r. 63). Peyvên nexwerû jî di navbera xwe de dibin du beş: Peyvên pêkhatî û yê dariştî.

4.5.2.1. Peyvên Pêkhatî

Peyvên pêkhatî ji çend hêmanên serbixwe pêk tên. Ji nav Rîsaleyan mînakên peyvên pêkhatî ên kurdî û yên ketine nav kurdî: Peşkeş (Nursî, 2004a, r. 26). Serpuş (Nursî, 2004a, r. 33). Hayme-nişîn (Nursî, 2004a, r. 102). Hodgâm (Nursî, 2004a, r. 60). Bedbaht (Nursî, 2004a, r. 43). Şabaş (Nursî, 2004a, r. 136). Zarardîde (Nursî, 2004a, r. 158). Safdil (Nursî, 2004a, r. 159). Kâselis (Nursî, 2004a, r. 198). Hodperest (Nursî, 2004a, r. 289). Destgâh (Nursî, 2004a, r. 298). Secdegâh (Nursî, 2004a, r. 377). Yekta (Nursî, 2004a, r. 392). Şehbaz (Nursî, 2004a, r. 452). Biraderzade (Nursî, 2004b, r. 20). Unsuriyetpêver (Nursî, 2004b, r. 66). Hunhar (Nursî, 2004b, r. 123). Serfîraz (Nursî, 2004b, r. 274). Yek-vücut (Nursî, 2004b, r. 537). Serkeşane (Nursî, 2004b, r. 459). Dilşad (Nursî, 2004b, r. 433). Şakird (Nursî, 2004b, r. 352). Endişedar (Nursî, 2004b, r. 342). Serfîraz (Nursî, 2004b, r. 274). Nâhoş (Nursî, 2004b, r. 78). Bedbaht (Nursî, 2004a, r. 43). Berdevam (Nursî, 2004a, r. 29). Îfratpêver (Nursî, 2004a, r. 168). Adaletname-i şeriat (Nursî, 2004a, r. 175). Zarardîde (Nursî, 2004a, r. 179). Peşkeş (Nursî, 2004a, r. 217). Hakperest (Nursî, 2004a, r. 235). Serfûr (Nursî, 2004a, r. 254). Hodbîn (Nursî, 2004a, r. 268). Âlempesend (Nursî, 2004a, r. 270). Hüdaperest (Nursî, 2004a, r. 289). Asilzade (Nursî, 2004c, r. 26). Serfîraz (Nursî, 2004c, r. 44).

4.5.2.2. Peyvên Dariştî

Peyvên dariştî bi alîkarîya qertafên peyvîsaz pêk tên. “Peyvên dariştî ew peyv in ku herî kêr morfemeke dariştinê li wan zêde bûye. Ew peyv bi rêya bigerbûnê (*affixation*) pêk tên û bi giştî bi rêya pêşgir, navgir û paşgiran saz dibin” (Seyari & Aktaş 2023, r. 31).

Ji nav Rîsaleyan mînakên peyvên dariştî ên kurdî û yên ketine nav kurdî: Lekedar (Nursî, 2004a, r. 13). Ateşbar: (Nursî, 2004a, r. 13). Peşkeş (Nursî, 2004a, r. 31). Hodserane (Nursî, 2004a, r. 33). Serpuş (Nursî, 2004a, r. 33). Merdane (Nursî, 2004a, r. 97). Pinedüzlük (Nursî, 2004a, r. 187). . Nâmeşru (Nursî, 2004a, r. 195). Bîhemta (Nursî, 2004a, r. 201). Namdar (Nursî, 2004a, r. 411). Biçare (Nursî, 2004b, r. 20). Nâdan (Nursî, 2004b, r. 133). Basîrane (Nursî, 2004b, r. 46). Payidar (Nursî, 2004b, r. 227). Şûristan (Nursî, 2004c, r. 30). Serkeşlik (Nursî, 2004c, r. 69). Nazenin (Nursî, 2004c, r. 122). Cilveger (Nursî, 2004c, r. 137). Merdane (Nursî, 2004a, r. 97). Bîinsaf (Nursî, 2004a, r. 116). Bende (Nursî, 2004a, r. 125). Dağdar (Nursî, 2004a, r. 160). Lekedar (Nursî, 2004a 160). bîkarar (Nursî, 2004a, r. 163). Hissedar (Nursî,

2004a, r. 243). Secdegâh (Nursî, 2004a, r. 377). Hüşdar (Nursî, 2004a, r. 454). Bîgüman (Nursî, 2004a, r. 466). Bitaraf (Nursî, 2004a, r. 467). Meyvedar (Nursî, 2004a, r. 483). Bîtaraf (Nursî, 2004a, r. 485). Bîvesvese (Nursî, 2004a, r. 485). Destgâh (Nursî, 2004b, r. 294). Endişedar (Nursî, 2004b, r. 342). Manidar (Nursî, 2004b, r. 464). Vabeste: Nursî, 2004b, r. 534). Sayeban Nursî, 2004c, r. 6).

ENCAM

Bediuzzaman Seîdê Nûrsîyê Kurdî şexsiyetekî rengîn ê pirhêlî ye. Heyateke derasayî borandiye. Bi gotina wî, wekî li ser minareyê be yan di binê bîrê de be jiyaye. Yanî heyateke ji rêzê neborandîye, di nav îfrat û tefrîtê de lewlibîye. Ev rewşa wî teyîsîye nav berhemên wî jî. Uslûba wî giran e. Xwedî lîteratûreke cihêwaz e. Di derbirîna meseleyên hişk de ji bo hêskirîna û têgihiştîneke baştir ji çanda kurdî jî îstîfade kiriye. Mijara vê xebatê jî ev hêla berhemên wî bû. Çanda kurdî çi mîqdar di wan de bi cî bûbû? Divê bê gotin, bi vê xebatê hat dîtin ji texmîna ku dihat kirin zêdetir çanda kurdî di berhemên Nûrsî de cî girtiye û rola xwe lîstîye. Ev yek bi mînakên hat destnîşankirin.

Di destpêka nivîskariya xwe de Nûrsî du berhemên xwe; *Munazarat* û *Muhakematê* wekî ku kurd bin bi nav dike. Bi vê xebatê hat dîtin ku ji aliyê çand û zimanê kurdî ve berhemên wî yên mayîn jî ne zehf kêrî *Munazarat* û *Muhakematê* ne. Herçiqas di berhemên Nûrsî yên dawî de ji milê termînolojîyê ve hinek sadebûn hebe jî dîsa ji tesîra çand û zimanê kurdî ne xalî ye.

Di nav 130 perçe berhemên Nûrsî de bi dehan jêgirtinên ji berhemên klasîkên kurdî hene. Wekî di xebatê de jî bi mînakên hatin destnîşankirin di nav berhemên Nûrsî û *Dîwana* Mele Ehmedê Cizîrî, kulîyata Ehmedê Xanî û ya Mele Xelîlê Sêrtî de peywedîyên navdeqîtiyê gelek in. Herçiqas hinek ji wan têkilîyan bi muşterekîya ayet û hedîsan bin jî di bikaranîna têgih û terîmînolojîyê de bi mirov didide hisandin ku Nûrsî ji şairên kurd ên klasîk sûd wergirtiye.

Diyar bû ku Nûrsî ji çand û kelepura kurdî baş haydar e. Mesela çi bi binavkirin be çi bi telmîhî be behsa sê destanên kurdî dike; Destana Kawayê Hesinkar, Destana Şerê Newala Sîsebanê û Destana Kela Dimdimê ya Xanê Çengzêrîn. Dîsa gelek mînak hene ku Nûrsî ji dîroka kurdan haydar e. Gava behsa pêşdarîya wan a serdema Keyanî û Sûmerîyan dike, Selaheddînê Kurdî rol-model nişan dide. Şopandina rêya Xelîl Xeyalîyê Motkî tewsîye dike.

Nûrsî digel ku 34 salên dawîya umrê xwe li xerîbî û sirgûnîyê borandiye jî çanda gelêrî ya folklorîk ji bîr nekiriye. Di nav nivîsarên xwe de cî daye van adet û hêmayên ji çanda folklorîk a kurdan:

Cejnên Gel ên Folklorîk, Bawerîyên Gel ên Foklorîk, Newroz, Miftuhane, Xêzika Fila, Hîvgirtin, Pêkenî, Nîfir, Xwîşk û Biratîya Axretê, Gotinên Pêşîyan, Îdyomên Kurdî, Derbûmeseleyên kurdî û hwd. Herwiha di jana xwe ya xerîbîyê de gelek caran rîayetî van adetan kiriye; cil û bergên kurdî her li xwe kiriye, miftûhaney pêk anîye, birayên axretê ji xwe re çêkirine, bi mecazî be jî xêzika filan bi kar anîye...

Nûrsî di jegirtinên xwe de bi çanda kurdî û berhemên edebiyata klasîk nesekîniye, wî her wiha alimên kurdan ên mîna Mela, Xanî û Sêrtî wekî referans jî qebûl kirine. Danasîn û dahurîna karakterên kurdan kiriye. Şîret û qewîtî li kurdan kirine.

Nûrsî, di nivîsarên xwe de bi gelek awayan zimanê kurdî bi kar anîye. Carinan rasterast kurdî bi kar anîye. Carinan mantelîteya wê bi kar anîye. Carinan jî peyvên kurdî wekî amûra derbirînê emilandine. Di hinek cîyan de jî bi peyvên tirkî û erebî ravekên kurdî bi kar anîne û hwd.

ÇAVKANÎ

- Açıkgenç, A. (2018). "Said Nursi." *TDV İslam Ansiklopedisi* 35:565–72.
- Adak, A., Acar, H., & Aykaç, Y. (2017). Bîbliyografyaya Melayê Cizîrî. *Mukaddime* 8(issn:1309-6087):171–99.
- Adak, R. (2024). *Şiyarkirina Gelê Kurd Di Hizrên Seîdê Kurdî De*. İstanbul: Nûbihar.
- Akgündüz, A. (2013). *Arşiv Belgeleri Işığında Bediüzzaman Said Nursi ve İlmî Şahsiyeti*. İstanbul: OsmanlıAraştırmalarıVakfı.
- Aksu, M. (2003). *Bediüzzaman'ın Van Hayatı ve Hayalindeki Üniversite*. Şanlıurfa:
- Aktaş, M. (2008). Bediüzzaman Said'i Kurdi: Kürtlerin Gandisi. <https://Kurdians.Blogspot.Com/2008/04/Bediuzzaman-Saidi-Kurd-Krtlerin-Gandisi.Html>.
- Aktulum, K. (2000). *Metinler Arası İlişkiler*. Ankara: Öteki Yayınları.
- Aktulum, K. (2002). *Kopuk Yazı Kopuk Yapıt*. Ankara: ÖtekiYayınları.
- Anon. (2012a). "Munazarat Sempozyumu: 1 ." in *Milliyet Fikri ve Kürt Meselesi*. Ankara: Merak.
- Anon. (2012b). "Said Nursi'nin Eğitim Felsefesi Medresetüzzahra." Van: Merak Yayınları.
- Aslan, M. (2020). "Folklor û Ziman Kovara Akademîk û Navnetewî Ya Xebatên Kurdî." *October*, 192–94.
- Aydeniz, H. (2013). *Eski Said'in Ehemmiyetli Talebesi Hamza*. İstanbul: Kent Işıkları.
- Aydinkaya, F. (2020). *Bediüzzaman'ın Hançeri*. İstanbul: Avesta Yayınları.
- Aytemur, H. S. (2015). *Risale-i Nur'da Yapılan Tahrifat*. İstanbul: Hîvdalİletişim.
- Badıllı, A. (1990). *Bediüzzaman Said-i Nursî Mufasssal Tarihçe-î Hayatı*. Timaş Yay. İstanbul: Timaş Yayınları.
- Bazîdî, M. M. (2010). *Cami'ya Risaleyan û Hîkayetan Bi Zimanê Kurmancî. Amadekar: Ziya Avcî*. Dıyrbakır: Lis.
- Bediuzzaman Seîd en-Nûrsî. (1992). *Ji Silsîleya Rîsaleê Nûr Peyvên Biçûk Tercume: Abdulkadir Badillî*. İstanbul: Envâr Neşriyat.

- Beki, N. (1999). *Kur'an İlimleri ve Tefsir Açısından Bediüzzaman Said Nursi'nin Eserleri*. İstanbul: TimaşYayınları.
- Berk, B. (1975). *Türtiye'de Nurculuk Davası*. İstanbul: Yani AsyaYayınları.
- Bilgi, A. (2021). "Hüsrev Altınbaşak'ın 'Bediüzzaman'ın Mezarı Isparta'da Olmalı' Telgrafi Kaynak: Hüsrev Altınbaşak'ın 'Bediüzzaman'ın Mezarı Isparta'da Olmalı' Telgrafi ." *Risale Haber*.
- Borak, M. (2005). *Ferhenga Biwêjan* . İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Boratav, P. N. (1969). *100 Soruda Türk Halk Edebiyatı*. İstanbul: Gerçek Yayıncılık.
- Çalışan, M. (2012). *Asrı Güzelleştiren Adam Bediüzzaman Hayatı ve Mefkuresi*. İstanbul: Diya Kitap.
- Celil, O., & Celil, C. (2013). *Zargotina Kurda I*. Amed: Aram.
- Cemilpaşa, E. (Zınar Sılopi). (2014). *Doza Kurdistan Kürdistan Davası Kürt Milletinin 60 Seneden Beri Esaretten Kurtuluş Savaşı Hatıratı* . İstanbul: Avesta.
- Çixsi, M. İ. (2016). *Bedîê Esrê Jînameya Bediuzzeman*. İstanbul: Nûbihar.
- Cizîrî, M. (2004). *Dîwan. Transkrîpsiyon: Arif Zêrevan*. Stukholm: Nefel.
- Cizîrî, M. (2006). *Şîroveya Dîwana Melayê Cizîrî. Şîrove:Celalettin Yöyler*. Stenbol: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Çobanoğlu, Ö. (2012). *Halk Edebiyatına Giriş I*. Eskişehir: Anadolu Üniversitesi Yayını.
- Demir, A. (2012). *Qewlê Newala Sîsebanê Amadekar û Tîpguhêz*. İstanbul: Nûbihar.
- Demir, A. (2017). "Münazarat Sempozyumu (Milliyet Fikri ve Kürt Meselesi)." in *Bediüzzaman Said-i Nursi'nin Eğitim Modelinde Kürt Dilinin Yeri ve Önemi*. Ankara: Merak Yayınları.
- Demir, N. (2011). "Dil Kültürü." P. 3 in *Türkçe Sözlü Anlatım*, edited by Ş. D. Belet. Eskişehir: T.C. Anadolu Üniversitesi Yayını.
- Devellioğlu, F. (2006). *Osmanlıca -Türkçe Ansiklopedik Luğat* . Ankara: Türkiye İş bankası Kültür Yayınları.
- Doskî, Î. T. (2024). "Nûbihar." *Munacata Bediuzzeman*, 27.

- Doskî, T. Î. (2005). *Cewahîru'l-Meanî Fî Şerhî Dîwanî Ehmed El-Xanî*. Duhok: Dar Spîrêz Litebae Wenneşir.
- Durre, A. (2002). *Şerha Dîwana Ehmedê Xanî Felsefe û Jiyana Wî*. İstanbul: Avesta.
- Edib, E. (2011). *Risale-i Nur Müellifi Said Nur Hayatı-Eserleri-Mesleği Haz. Fahrettin Gün*. İstanbul: Beyan Yayınları.
- Eichenbaum, B. (1994). *Edebiyat Kuramı Rus Biçimciliği. Wer. :Sedat Umran*. Ankar: Yaba Yayıncılık.
- Ekici, M. (2018). *Halk Bilgisi (Folklor) Derleme ve İnceleme Yöntemleri*. Ankara: Geleneksel Yayıncılık.
- el-Cewherî, M. (2006). *Muqeddîmetu Fî Diraseti't-Turasi'-Şe'ibiyyî El-Misrîy*. <https://eleam.univ.ouargla.dz>.
- el-Cezerî, Ş. E. (d.n.). *Dîwan Eş-Şeyx El-Cezerî*. Misir: Daru'l-Kutub el-Erebî.
- Emre, G. (2006). *Makalat Medreseden Meclis'e Meclis'en Yassıada'ya*. İstanbul: KentYayınları.
- Epözdemir, Ş. (2015). *Medreseyên Kurdistanê*. İstanbul: Nûbihar.
- Eratilla, M. (2023). *Bediüzzaman'ın Şark Yıldızları*. Şanlıurfa: Hiçbişey.
- Ergün, Z. (2017). *Nêrît û Helbest Nêrîta Neteweyî Di Helbesta Nû Ya Kurdî De*. İstanbul: Nûbihar.
- Ertekin, M. Z. (2018). Hevpeyvîn digel Melayê Cizîrî. *Nûbihar Kovara Çandî Hunerî Edebî. Nûbihar*, 42–51.
- Ertekin, N. (d.n.). *Mela Ehmed Yaylar û Miftuhaneya Wî. (Gotara Neçapkirî)*.
- Ez-Zivingî, E. B. E. M. M. E. B. (2013). *El-'Eqdu'l-Cewherî Fî Şerhî Dîwan Eş-Şeyx El-Cezerî*. İstanbul: Nûbihar.
- Farqînî, Z. (2004). *Ferhenga Kurdî - Tirkî*. İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Firdevsi. (1994). *Şehname I Tercüme: Necatî Lugal*. İstanbul: MEB Yayınları.
- Gökalp, S. (2024). Efsaneyên Li Herêma Hekariyê. *Nûbihar Kovara Çandî Hunerî Edebî*, November, 74–77.

- Gökçe, G. (2015). Molla Halil Es-Si'irdî, Hayatı, Eserleri ve Tekfir Problemine Bakışı. *Harran Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, July.
- Gökmen, E. (2022). II. Abdülhamid Döneminde İptidai Mekteplerinin Yaygınlaştırılması: Manisa Köyleri Örneği (1893-1896). *Manisa Celal Bayar Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi* 20:77–98.
- Gözeten, İ. (2015). Mele Xelîlê Sêrtî ve Nehcu'l-Enam Adli Eserî. Muş Alpaslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Muş.
- Gülltekin, Z. G. D. (2022). *Batman Halk Kültürü*. Batman: Batman Üniversitesi Yayınevi.
- Hayrat Vakfı İlmi Araştırma Heyeti. (2013). *Bedüzzaman Said Nursi ve Hayru'l - Halefî Hüsrev Altınbaşak İlk Defa Yayınlanan Orijinal Mektuplar Işığında*. İstanbul: Hayrat Neşriyat.
- Hîkmet, B. (2016). *Teorîyên Folklorê*. Diyarbakır: Lîs.
- Hîkmet, B. (2023). *Danberheva Memê Alan û Mem û Zînê Vekolîneke Folklorî*. Ankara: Lîs.
- İnce, Ö. (1993). *Yazınsal Söylem Üzerine*. İstanbul: Can Yayınları.
- Işık, A. (2013). *Üstad Bediüzzaman'ın Van Hayatı*. İstanbul: Şahdamar Yayınları.
- Kaplan, Y. (2015). Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn. Teza Lîsansa Bilind a Neçapkirî, Zanîngeha Yûzûncû Yilê, Van.
- Kızıllı, H. (2016). Destpêkek Bo Çanda Kurdan Di Kullîyata Rîsaleyên Nûr De. *KURDOLOJİ AKADEMİK ÇALIŞMALAR*, 2:319–24.
- Komisyon. (2004). *Risale-i Nur Müellifi Bediüzzaman Said Nursî Tarihçe-i Hayatı*. İstanbul: Zehra Yayıncılık.
- Kurdî, B. S. (1909). Volkan Gazetesi Tam ve Aynen Metin Neşri. *İz Yayıncılık*, February, 337–38.
- Malbat, E. (2014). *Bediüzzaman'ın Kürt Kimliği Üzerinde Yapılan Tahrifatlar*. in Uluslararası Bitlis Sempozyumu. Pp. 401–8. İstanbul: Bitlis Düşünce ve Akademik Çalışma Grubu.
- Malmîsanij. (1991). *Said-i Nursi ve Kürt Sorunu*. İstanbul: Doz Yayınları.

- Mardin, M. S. (2024). *Nur Talebeleri Tarafından Hazırlanan Tarihçe-i Hayat'ın Tarihçesi* Kaynak: Nur Talebeleri Tarafından Hazırlanan Tarihçe-i Hayat'ın Tarihçesi. <https://www.risalehaber.com/Mehmet-Selim-Mardin-Nur-Talebeleri-Tarafından-Hazırlanan-Tarihçe-i-Hayatin-Tarihçesi-26179yy.Htm>.
- Menek, A. (2013). Munazarat Sempozyumu-1. Pp. 505–28 in. Merak Yayınları.
- Meretowar, A. (2007). Wêjeya Kurdî û Medresyên Kurdistan. W, November, 29.
- Mutlu, İ. (1995). *Sorularla Bediüzzaman Said Nursi (1)*. İstanbul: Mutlu Yayınevi.
- Newayî, M. (2007). “Ji Hundir ve Zanîngehên Qedîm Medreseyên Kurdistanê.” W, November, 31–32.
- Norsî, B. S. (2009). *Ji Kulliyata Rîsaleyên Nûr Munazerat Wergêr: Ayhan Meretowar*. İstanbul: Zehra Yayıncılık.
- Nur, F. (2022). Feyz-i Nûr Risâle-i Nur'dan Tefeyyüzlerim. <https://www.feyzinur.com/Bediuzzamanin-Rumeli-Seyahati/>.
- Nursi, A. (1997a). *Bediüzzaman'ın Hayatı*. İstanbul : Nûbihar.
- Nursi, A. (1997b). *Bediüzzaman Said-i Nursî Tarihçe-i Hayatı*. İstanbul: Nûbihar Yayınları.
- Nursî, B. S. (2002). *Risale-i Nur Külliyyatından Barla Lâhikası*. İstanbul: Zehra Yayıncılık.
- Nursî, B. S. (2003a). *Risale-i Nur Külliyyatından Emirdağ Lâhikası*. İstanbul: Zehra Yayıncılık.
- Nursî, B. S. (2003b). *Risale-i Nur Külliyyatından Mesnevî- i Nuriye*. İstanbul: Zehra Yayıncılık.
- Nursî, B. S. (2003c). *Risale-i Nur Külliyyatından Sözler* . İstanbul: Zehra Yayıncılık.
- Nursî, B. S. (2004a). *Nurlar Silsilesinden İctimaî Dersler*. İstanbul: Zehra Yayıncılık.
- Nursî, B. S. (2004b). *Risale-i Nur Külliyyatından Asâ-Yı Musa*. İstanbul: Zehra Yayıncılık.
- Nursî, B. S. (2004c). *Risale-i Nur Külliyyatından Lem'alar*. İstanbul: Zehra Yayıncılık.
- Nursî, B. S. (2004d). *Risale-i Nur Külliyyatından Mektubat*. İstanbul: Zehra Yayıncılık.

- Nursî, B. S. (2004e). *Risale-i Nur Külliyyatından Muhakemat*. İstanbul: Zehra Yayıncılık.
- Nursî, B. S. (2005). *Risale-i Nur Külliyyatından Şualar*. İstanbul: Zehra Yayıncılık.
- Nursî, B. S. (2015). *İşaratü'l-İ'caz Fi Mezanni'l-İcaz*. Ankara: Diyanet İşleri Başkanlığı Yayınları.
- Nursî, B. S. (2023). *İşârât-Ül İ'caz Fî Mezann-Il Îcâz Mütercim: Abdülkadir Badıllı*. İstanbul: İttihad Yayınları.
- Nursî, B. S. (2004). *Risale-i Nur Mebde'lerinden Âsar-ı Bediyye*. İstanbul: Elmas Neşriyat.
- Nûrsî, B. S. (2012). *Ji Kullîyata Rîsaleyên Nûr*. İstanbul: Zehra Yayıncılık.
- Nûrsî, B. S. (2012). *Ji Kullîyata Rîsaleyên Nûr Dîwana Herba Urfî. Wer: Aydın Üneşi*. İstanbul: Hizmet Vakfı Yayınları.
- Nûrsî, B. S. (2014a). *Ji Kulliyata Rîsaleyên Nûr Leme'at Kulîlkên Dendikan. Werger: Aydın Üneşi & Ayhan Yıldız*. İstanbul: Hizmet Vakfı Yayınları.
- Nûrsî, B. S. (2014b). *Ji Kullîyata Rîsaleyên Nûr Wer: Aydın Üneşi, Ayhan Yıldız*. İstanbul: Hizmet Vakfı Yayınları.
- Nursî, B. S. (1998). *Mesnevi-i Nuriye Mütc: Abdulkadir Badıllı*. İstanbul: İttihad.
- Oner, N. (2016). *Mirza Mihemed*. İstanbul: Weşanên Avesta.
- Oner, N. (2019). *Ji Binbîra Kurdan Bawerîyên Gelêrî*. İstanbul: Wardoz.
- Özcan, Ö. (2011). *Risale-i Nur Hizmetkarları Ağabeyler Anlatıyor 1*. İstanbul: Nesil Yayın Grubu.
- Rohat. (1991). *Unutulmuşluğun Bir Öyküsü: Said-i Kurdi*. İstanbul: Fırat Yayınları.
- Şahiner, N. (2004). *Bilinmeyen Taraflarıyla Bediüzzaman Said Nursi*. İstanbul: Nesil Yayın Grubu.
- Salar, M. (2024). *Bediüzzaman Seidê Kurdî En-Nûrsî İddialar ve Cevaplar*. Wan: Ronya Yayınları.
- Seyari, A. (2019). *Vegêrana Welatperwerîyê û Fêhma Ziman Di Helbesta Şikoyê Hesên De. Kurdîname 61–69*.

- Seyari, A., & Aktaş, A. (2023). Pêşgira Dariştinê Ya ‘Ve-’ Yê û Fonksîyonên Wê Yên Morfosemantîk Di Berhemên Klasîk Ên Kurmancîya Jorîn Da. *Kurdiname* (9):36–50.
- Şîrazî, Ş. S. (1980). *Bostan Ne Gülistan Terc: Rîfat Bilge*. İstanbul: Meral Yayınevi.
- Şîrnexî, G. (2024). Kurtebêjîyek Ji Jiyan û Têkoşîna Seîdê Kurdî. *Nûbihar*, March, 79–83.
- Soleimani, K. (2018). *Îslam, Îslamîzm, Dewlet û Neteweperwerîya Kurdî*. Van: Peywend.
- Tan, S. (2011). *Rêzimana Kurmancî Çapa Berfirehkirî*. İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî .
- Tek, A. (2018). *Hâmîsîz Şâîr Babasîz Metin Mem û Zîn ve Osmanlica Çevirileri Üzerine Bir İnceleme*. İstanbul: Nûbihar.
- Tîgrîs, A. (2009). *Anadili Eğitimi ve Birden Fazla Resmi Dil*. Stokholm: Weşanên Apec.
- Turan, A. (2010). *Melayê Cizîrî Divanî ve Şerhi*. İstanbul: Nûbihar.
- Uyanık, B. A. (2017). *Nîfir û Dua*. İstanbul: Wardoz.
- Veroj, S. (2015). *Mehmed Mihîrî Hîlav û Kovara Kurdistan*. İstanbul: İbv.
- Xanî, E. (2013). *Şîroveya Mem û Zîna Ehmedê Xanî Şîrove: Perwîz Cîhanî*. İstanbul: Nûbihar.
- Xanî, E. (2014). *Dîwan. Ehmedê Xanî Külliyyatı:4 Analiz ve Çeviri: Kadri Yıldırım*. İstanbul: Avesta.
- Yalar, M. E. (2022). *Dîwana 'Îşqê*. İstanbul: Nûbihar Yayınları.
- Yıldırım, K. (2008). *'Eqîdeya Îmanê (İnanç Esasları): Ehmedê Xanî Külliyyatı II. (Analiz ve Şerh)*. İstanbul: Avesta.
- Yıldırım, K. (2010). *Mem û Zîn: Ehmedê Xanî. (Çeviri ve Kavramsal Tahlil)*. İstanbul: Avesta.
- Yıldırım, K., Pertev, R., & Aslan, M. (2013). *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*. İstanbul: Mardin Artuklu Üniversitesi.

Yıldız, A. (2024). Di Jiyan û Metnên Seîdê Berê de Balkêşana Bedîuzzeman Ya Çanda Kurdî. (Wergera Ji Tirkî: Gülcan Şirnexî). *Nûbihar*, April, 68–69.

Yılmaz, M. K. (2020). Abdülkadir Badıllı'nın Hayatı, İlmî Şahsiyeti ve Hadis Araştırmaları Musa Kâzım Yılmaz. *Katre Uluslararası İnsan Araştırmaları Dergisi* 9 (ISSN: 2146-8117 e-ISSN: 2148-6220):185–221.

Zınar, M. (2022). *Said Kürtlüğün Kayıp Risalesi*. İstanbul: Nûbihar.

Çavkanîyên Zindî

Ç1: Ahmed Erçin, 66 salî, gundê Cimzerqê ya Misirca Sêrtê, mamosteyê malnîşîn.

Ç2: Mele Burhan Tarînî, sala wiladetê 1976 e, li Dîyarbekirê rûdinê, îmam xetîbê mizgeftê ye.

Pêvek 1: Telgirafa Ahmed Husrev Altınbaşak

حضرت استاد وفاق بزی باب فضلہ تونہ ویدائند۔
 عزیز استادک بنوہ اثری ابد وفاق استارت دہ کیجیہ۔
 عزیز استادک قبر شریفی دہ استارت دہ اولاسی باب الزمہ۔
 مبارک استادک مبارک حیدرینی دہ اہر حالہ استارت یکتیہ۔
 حیدرزی تونہ باندہ تغزیہ۔ وادی عائد دہم
 الباقی ہوالہی
 حضرت

1148

Bediüzzaman Said Nursî ve Hayatı-Halefi Ahmedî Fikriye - İstanbul

Hazret-i Üstad'ın İsparta'da defnedilme arzusunun bu şekilde biliniyor olması sebebiyle, Urfâdaki beklenmedik vefatı, kendisini orada defnedip etmekle beraber talebeler arasında tereddütlere sebep oldu. Aynı günün sabahında, yarıncı bulunan talebeler, çektikleri telgraflarla Üstad'ın vefatını İsparta'ya haber verirken ne yapmaları lazım geldiğini sordular. Telgraftaki ifadeleri şöyledir:

(Gözetici: 22.3)

TELGRAF

Adres: Yıldırım Gökçe Nur Tinnarhanlı Gökçe

Telgraf No: 1480 / 11 / 23.3 / 1960

Konu: Üstad vefat etmiştir

VERİLDİĞİ YERİN ORTA MERKEZİ ALINDIĞI YERİN

Yıl: 1960 Ay: 3 Gün: 23 Saat: 10 Dakika: 10

Alındığı Yer: İstanbul

Yazan: Musa Lisne

DAVET NAKİL

Üstad'ın vefatını İsparta'ya haber veren birinci telgraf (23.03.1960)

(Gözetici: 22.3)

TELGRAF

Adres: Yıldırım Gökçe Nur Tinnarhanlı Gökçe

Telgraf No: 1503 / 19 / 23.3 / 1960

Konu: Üstadımız vefat etti. Acile geliniz ki zümre me yapacağız

VERİLDİĞİ YERİN ORTA MERKEZİ ALINDIĞI YERİN

Yıl: 1960 Ay: 3 Gün: 23 Saat: 11 Dakika: 10

Alındığı Yer: İstanbul


Yazan: Musa Lisne

DAVET NAKİL

Üstad'ın vefatını İsparta'ya haber veren ikinci telgraf (23.03.1960)

Pêvek 2: Gotara Bedîuzzeman Mela Seîdê Kurdî

Gotara Bedîuzzeman Mela Seîdê Kurdî ya di Rojnameya Kurd Teavun ve Teraqî 22yê Teşrînêsanî 1324ê, 11ê Zilqade 1326 ê [5ê Berfanbara 1908] hêjmar 1, rûpel 7em de hatiye weşandin.



Bediüzzaman Mola Seid-i Kürdî'nin Nesayihî²⁵

(Nesîhetên Bedîuzzeman Mela Seîdê Kurdî)

Ey gelî Kurdan! Îttifaqê de quwet, îttihadê de heyat, di biratîyê de se'adet, hukûmetê de selamet heye. Kapîka ittihadê û şîrîta muhebbetê qewî bigrin, da we jî belayê xelas ke. Qenc guhê xwe bidinê, ezê tiştekî jî we ra bibêjim: Hûn bizanin ku sê,

²⁵ <https://www.urfahabersitesi.com/haber/said-nursinin-kurtce-makalesi-37871>.

sê cewherê me hene, hifza xwe ji me dixwazin. Yek Îslamiyet, ku hezar hezar xûna şehîdane bihayê wê dane. Ê duduyan însaniyet, ku lazime em xwe nezera xelqê de bi xizmeta 'eqîl, ciwanmêranî û însaniyetiya xwe nişanî dunê bidin. Ê sisiyan milliyeta me ye, ku meziyetê da me. Ê berê ku bi qenciya xwe saxin; em bi karê xwe, bi hifza milliyeta xwe rûhê wan qebra wan de şad bikin. Piştî wê, sê dujminê me hene, me xerab dikan: Yek feqîrtî ye, çil hezar hemmalê Îstenbolê delîlê wê ye. Ê duduyan cehalet û bê xwendinî, ku hezar ji me da yek «qazete» nikarin bixûnin delîlê wê ye. Ê sisiyan dujminî û îxtilafe, ku ev 'edawet quweta me wunda dike, me jî musteheqî terbiyeyê dike û hukûmet jî, ji bêînsafîya xwe zulm li me dikan. Ku we ev seh kir bizanin çara me ev e: ku em sê şûrê elmas bi destê xwe bigrin; ta ku em hersê cewherê xwe ji destê xwe nekin, hersê dujminê xwe ser xwe rakin!. Ê şûrê ewil* me'arif û xwendine. Ê duduyan îttifaq û muhebbeta millî ye. Ê sisiyan însanê bi nefsa xwe şuxla xwe bike û mîna sêfîlan ji qudreta xelqê hêvî neke û piştî xwe nedetê. Wesiyeta paşî; xwendin, xwendin, xwendin û dest hev girtin, dest hev girtin, dest hev girtin.

Mela Seîd

Pêvek 3: Encamname

ENCAMNAME

Li vê derê çend gotinan ji zarokên gelê xwe re jî nebêjim, ez dibêjim qey dê mijar nîvco bimîne.

Gelî şêrekurdên di dema cîhangiriya Asûrî û Keyaniyan de pêşdarî û qehremaniya leşkerî dikirin!

Ev razana we ya pêncsed salî bes e. Êdî hişyar bibin, sibe ye... Nexwe wehşet û xeflet, di çola wehşetê de, dê we mihû bike.

Ya ku “*hikmeta Îlahî*” tê gotin; ew hikmeta Îlahî ku nîzama makîneya alemê ye û avakarê zagonên Îlahî yên nûranî yên ku mîna tîlên telgirafê gihîştine her beş û deverên alemê ye, ji asoya ezêlî tiliya qederê hildaye, li we ferman dike ku: Xîret û qeweta xwe ya ku bi bêitîfaqiyê weke avreşînê dilop dilop berze bûyî, bi fikra miliyetê bigihînin hev û bikin yek. Wek cazîbeya zerreyan a cuzî, bi pêkanîna cazîbeyeke neteweyî ya giştî; gireperçeya kurdîtiyê weke gokê li hev bizivîrînin, ji bo mîna sitêrkeke rewnak, bibin tabîê roja şewketa Îslamê û Osmaniye, da hûn mîzên û ahenga umûmî biparêzin.

Hem jî, ya ku “*hurriyet*” tê gotin; ew siltanê hurriyetan ê ku weke çiyayên Agirî û Siphane li serê çiyayê pêşerojê yê bilind rabûye piya û hêsiya bin emrê nefsê qedexe kiriye û destûr nade ku êrîşî mafên xelqê bê kirin ji ber vê pal daye şerîetê, bi dengê bilind li qewmekî wekî we xafil û ji hev bûyî yê ku di kurahiya kortikên paşerojê de ne, weha ferman dike: “Ji bo êrîşkirina ser cahilî û feqîriyê dest bavêjin fen, sin’et û sîlahê, bimeşin!”

Hem jî ya ku “*heqîqet*” tê gotin; ew qasidê heqîqet ku di bin tebeqeyan de veşarî û girtî maye û bi mihûbûn û jîholêrabûna tebeqeyên îstibdadê û bi sivikbûna tebeqeya nezanî û xefletê ya ku li ser mile wê, êdî tevdigere û teşebusa rabûna piyan kiriye; bi her awayî we pê dihesîne ku: Êdî dema bi ava heyatê ya perwerdehiyê avdana qabiliyetên we yên ku destê qederê di mahiyeta we de çandine û karakterên we yên ku potansiyela we derdixe holê û di mahiyeta qewmiyeta we de veşarî maye, hatiye. Nexwe dê hişk bibe, yan jî dê birize.

Hem jî ya ku “*ihtiyaç*” tê gotin; ew seydayê ihtiyacan ku bavê medeniyetê ye û avakerê pêşketinan e, sîleya xwe hildaye, li we hikim dike ku: Yan hûn ê heyat û hurriyeta xwe di vê çola xalî de bidin talankirin an jî hûn ê li meydana medeniyetê bi siwarbûna li trêna û balona fen û sin’etê, pêşerojê pêşwazî bikin û hal û hereketên ittîfaqkirî ji nû ve bi dest bixin û her wiha, ber bi ke’beya kemalatan ve bibezin.

Hem jî ya ku “*milliyet*” tê gotin; ji newalên paşerojê û sehayên îroj û çiyayên pêşerojê wekî malbateke ku li binê konekî rûniştîye digel lehengên zêdejiyê ên kurd ên mîna Ristemê Zal û Selehedînê Eyubî. Fikra we ya miliyetê ya ku her kesî bi şeref û heysiyeta kesên din şerefdar dike û nimûneya hissên payebilind e, bi emrê qetî ferman li we dike ku; da her yek ji we bibe awêneya jiyana tevekê miletê û muhafîzê seadetê û modeleke şênber a tevekê miletê. Ne wekî vêga bi qasî mirovekî, hûn ê bi qasî miletê mezin bibin. Lewre bi mezinbûna armancê re himmet jî mezin dibe. Û bi xeloyana xîreta millî re exlaq jî dikemile û bilind dibe.

Hem jî ya ku “*meşrûtiyet*” tê gotin; ew meşrûtiyeta meşrû’ ku sedema bextewariya qewman e û bi temînkirina hakimiyeta milî, cuzê îradeyê ya di hurriyetê ku keldûmana makîneya heyatê ye ji tefandina îstîbdatê û zordestî xelas dike û wê cuzê îradeyê bi havêna meşwereta şer’ê dide meyandin, we vedixwîne meclîsa îmtîhanê ku: Dixwaze bibîne ka hûn balix bûne û hê jî pediviya we bi hîmayeyê ma ye yan na. Ji imtihanê re amade bin. Hebûna xwe bi hevgirtinê nîşan bidin û digel hemiyeta millî, fikir û wijdana xwe ya şexsî, weke dil û eqlê hevbeş ê milet nîşan bidin. Heke na puwan nadin ji ber vê, şehadetnameya hurriyetê nadin destên we.

Belê, ev meyla her yek ji we ya axatiyê û fikra serbixwetiyê û enanîyeta ku bûye sedema keşmekêşîya we ya li sehayên paşerojê vêga jî di se’adet-serayên medeniyetê yên pêşerojê de, dê werbigere fikra îcadê, teşebûsa şexsî û fikra hurriyetê. Heta dikarim bibêjim ku: Li gorî medreseyên dîtiran ên bêdeng, medreseyên we yên bi heytehol meclîseke mebûsan a ilmê nîşan dide. Pistepistên we yên semawî û rûhanî yên bi xwendina fatîheyê ya li pey mele, îma û nîşaneyê qederê ye ku ji hêla mezheb, medrese û qewmîyetê ve di mahiyeta we de raza qabiliyeta meşrûtiyetê heye. Hem jî handayîn heye ji bo teşebûsa şexsî ku navlêkirineke din a

ye. ²⁶وَأَنْ لَّيْسَ لِلْإِنْسَانِ إِلَّا مَا سَعَى

Hem jî “*wêrekî û namûsa millî*” ya ku avaker û hamiyê her cûre fezîletê ye, ferman dike ku: Çawan ku heta vêga bi vekirina mecayekê ji mejî bal bi dil ve, we dil û qewetê gihîştandibû hev û her wiha hûn zanist û perwerdehiya xwe ji ser devê tûj ê şûr hîn dibûn lewma di wêrekiya maddî de bi pêş ketin. Vê carê, kêzênekê ji dil bal bi ramanê ve vekin, qewetê bi hewara aqil ve, hissan bi gaziya fikran ve bişeynin, da ku namûsa millî li meydana medeniyetê ya wêrekiya eqlî paymal nebe. Divê şûrê we ji cewherê fen û sin’etê were çêkirin.

Hem jî ya ku “*zimanê maderzayî*” tê gotin; ew zimanê we yê ku teyisîngeha tîrêjên hissên millî ye û dara berhemên edebî ye û cihokên ava jiyanê ya perwerdehiyê ye û pîvana edaletê ya qîmet û kamilbûyîna we ye û yê ku rasterast li pêş wijdana her kesî şibakeyekê vedike û weke tîrêjan, bandoran bi cih dike (lê ji ber îhmalkirina we gelek tevlihev bûye û hinek şaxên wê hatine tamandin) digel ku ev ziman ji ajdana dareke mîna dara tubayê re misaîd bû; wiha hişk bûye, perîşan maye û ji edebiyata ku zimanê medeniyetê ye bêpar maye. Ji ber van sedeman zimanê we, bi zimanekî heyf lê anîn ji welatparêziyê re giliya we dike.

Ziman mora qederê ye li mirovan. Heçî sûretê mirovahiyê ye, di reng û rûyê ziman de xweşikahiya xwe dide der. Ji ber ku zimanê maderzayî siruştî ye, bêtî ku lefz bîn vexwendin tîn bîra mirov. Ji ber ku danûsitandin tenê bi maneyê tê kirin, di nav duriyanê de heyirî namîne û agahiyên dikevin wî zimanî mîna “neqşê ale‘l-hacer”²⁷ mayende dimînin. Û her çi tiştên ku bi wî kirasê zimanê millî bixuyên henûn (dib)in. Va ye mîna keke welatparêziyê pêşkêşî we dikim ku; ew jî Mîrze Xelîl Xeyalîyê Motkiyî ye ku wekî di her beşê welatparêziyê de, di warê ziman de jî pêşekiyê bi dest xistiye. Û alfabe, serf û nehwa ku esasên zimanê me ne, anîye pê. Û heta ez dikarim bibêjim ku: Esra hemiyet, xîret, fedakarî û parastina zeîfan gihîştandiye hev û wucûda wî ya manewî çêkiriye. Heqîqeten ji ber ku em li cewherekî weha yê hemiyetê ku ji kana Kurdistanê ye, rast hatine hêvî heye ku dê gelek cewherên wekî wî pêşeroja me ronahî bikin.

²⁶ Ji bo însan ji bilî xebata wî tişteke din nîn e.

²⁷ Nexşên li ser kevîr

Va ye ev zat, nimuneyeke welatparêziyê ya ku hêjayî mirov bide dûv nîşan daye û ji bo zimanê me yê millî ku muhtacê kemilînê ye bingehek daniye. Ez ji mirovên xwedîxîret re tewsiye dikim ku li dûv rêça wî herin û li ser bingeha wî ava bikin.

Seîdê Kurdî

